

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Nihat KAVŞUT

EREBÊ ŞEMO'NUN ŞIVANÊ KURMANCA ROMANININ
TEKNİK VE TEMATİK İNCELEMESİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2017

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Nihat KAVŞUT

EREBÊ ŞEMO'NUN ŞIVANÊ KURMANCA ROMANININ
TEKNİK VE TEMATİK İNCELEMESİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ
Doç. Dr. Mehmet DİNÇOĞLU

MUŞ-2017

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Nihat KAVŞUT

JI HÊLA TEKNÎK Û MIJARÊ VA ANALÎZKIRINA
ROMANA ŞIVANÊ KURMANCA YA EREBÊ ŞEMO

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Doç. Dr. Mehmet DİNÇOĞLU

MÛŞ-2017

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Ji Hêla Teknîk û Mijarê Va Analîzkirina Romana Şivanê Kurmanca Ya Erebê Şemo” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin .3. yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

07/12/2017

Nihat KAVŞUT



TEZ KABUL TUTANAĐI
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜ'NE

Doç. Dr. Mehmet DİNÇOĐLU danışmanlığında Nihat KAVŞUT tarafından hazırlanan bu çalışma 07/12/2017 tarihinde aşığıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Doç. Dr. Seyit Battal UĐURLU

Jüri Üyesi : Doç. Dr. Mehmet DİNÇOĐLU

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK

İmza:

İmza:

İmza:

NAVEROK

NAVEROK	I
KURTE	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
PÊŞGOTIN.....	VI
KURTEBÊJE.....	VII
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

JIYAN, NÊRÎNA EDEBÎ Û BERHEMÊN EREBÊ ŞEMO

1.1. HEYAMA EREBÊ ŞEMO Û ÇANDA KURDÎ LI SOVYETA BERÊ	13
1.2. JIYANA EREBÊ ŞEMO	19
1.3. NÊRÎNA EDEBÎ YA EREBÊ ŞEMO	21
1.4. BERHEMÊN EREBÊ ŞEMO	25

BEŞA DUYEM

JI HÊLA TEKNÎK Û MIJARÊ VA ANALÎZKIRINA ŞIVANÊ KURMANCA

2.1. SERENCAMA ŞIVANÊ KURMANCA.....	31
2.2. KURTASIYA ŞIVANÊ KURMANCA.....	34
2.3. JI HÊLA TEKNÎKÊ VA ANALÎZEKE LI SER ŞIVANÊ KURMANCA.....	37
2.3.1. Vebêjer	40
2.3.2. Honandina Bûyerê (Rêzebûyer)	42
2.3.3. Leheng	49
2.3.4. Zeman.....	57
2.3.5. Mekan	62
2.3.6. Ziman û Şêwaz.....	64

2.3.7. Teknîka Vegotinê ya Di Şivanê Kurmanca Da.....	77
2.4. JI HÊLA MIJARÊ VA ANALÎZEKE LI SER ŞIVANÊ KURMANCA	81
2.4.1. Demên Zarokatiyê, Rewşa Malbatê û Kemilîna Ereb	82
2.4.2. Şoreşgerî û Xebatên Siyasî.....	85
2.4.3. Xizanî û Zilma Serdestan.....	87
2.4.4. Jiyana Kurmancan û Edetên Wan.....	90
2.4.5. Têkiliya Kurmancan û Neteweyên Din.....	94
ENCAM.....	97
ÇAVKANÎ.....	102
KURTEJİYAN.	107
ÖZGEÇMİŞ.....	108

KURTE
TEZA MASTIRÊ
JI HÊLA TEKNÎK Û MIJARÊ VA ANALÎZKIRINA ROMANA ŞIVANÊ
KURMANCA YA EREBÊ ŞEMO

KAVŞUT, Nihat

Şêwirmend: Doç. Dr. Mehmet DİNÇOĞLU

2017, 108 Rûpel

Erebê Şemo di edebiyata Kurdî da wek pêşengê romanê tê qebûlkirin û *Şivanê Kurmanca* ya di edebiyata Kurdî da wek romana ewil tê pênasekirin nivîsiye.

Armanca vê tezê ew e romana *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo ya di edebiyata Kurdî da wek romana ewil tê qebûlkirin li gor taybetiyên cureya romanê ji hêla teknîk û mijarê va analîz bike.

Tez ji xeynî destpêk û encamê ji du beşan pêk tê. Di destpêkê da wek cureyê edebiyatê qala derketin û pêşvaçûna romanê tê kirin û di edebiyata Kurdî da derketina romanê, taybetiyên wê yên bingehîn û sedemên vê rewşê bi awayekî giştî hatiye nirxandin.

Di beşa yekem da derheqê heyama Erebe Şemo û xebatên li Yekîtiya Sovyetan hatine kirin, jiyan, nêrîna edebî û berhemên Erebe Şemo da agahî hatine dayîn.

Beşa duyem ji hêla teknîk û mijarê va ji analîzkirina romana *Şivanê Kurmanca* pêk tê. Di vê beşê da *Şivanê Kurmanca* ji hêla vebêjer, honandina bûyerê, leheng, zeman, mekan û ziman û şêwazê va li gor taybetiyên teknîkî yên romanê hatiye analîzkirin û teknîka vegotinê ya di romanê da hatiye eşkerekirin. Di vê beşê da wek mayîn mijarên di *Şivanê Kurmanca* da derdikevin pêş bi mînakên di romanê da hatine şirovekirin.

Di encamê da piştî lêkolîn û analîzên li ser *Şivanê Kurmanca* tespîtên derketine holê hatine destnîşankirin.

Peyvên Sereke: *Şivanê Kurmanca*, Erebe Şemo, Roman, Romana Kurdî, Yekîtiya Sovyetan, Teknîk, Mijar.

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

EREBÊ ŞEMO'NUN ŞIVANÊ KURMANCA ROMANININ TEKNİK VE TEMATİK İNCELEMESİ

Nihat KAVŞUT

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Mehmet DİNÇOĞLU

2017, 108 sayfa

Erebê Şemo Kürt edebiyatında romanın öncüsü kabul edilmektedir ve Kürtçe edebiyatın ilk roman örneği olan *Şivanê Kurmaca* romanını yazmıştır.

Bu tez çalışması Kürt edebiyatında ilk roman örneği olarak kabul edilen Erebê Şemo'nun *Şivanê Kurmanca* adlı eserini roman türünün özellikleri açısından teknik ve tematik bir incelemesini amaçlamaktadır.

Tez çalışmamız giriş ve sonuç kısımları dışında iki bölümden oluşmaktadır. Giriş kısmında bir edebiyat türü olarak romanın doğuşu ve gelişiminden bahsedilmiş ve Kürt edebiyatında romanın ortaya çıkışı, temel karakteristiği ve bu karakteristiğin nedenleri ana hatlarıyla irdelenmiştir.

Birinci bölümde Erebê Şemo'nun yaşadığı dönem ve Sovyetler Birliği dönemindeki çalışmalar, hayatı, edebi kişiliği ve eserleri hakkında bilgi verilmiştir.

İkinci bölüm ise yazarın *Şivanê Kurmanca* romanının teknik ve tematik bakımdan incelemesini içerir. Bu bölümde *Şivanê Kurmanca* romanı anlatıcı, olay örgüsü, kişiler, zaman, mekan, dil ve üslup bakımından teknik öğeler çerçevesinde incelenmiş ve romanın anlatım tekniği belirlenmiştir. Bu bölümde ayrıca *Şivanê Kurmaca* romanından edindiğimiz temalar metinden örnek verilerek açıklanmıştır.

Sonuç kısmında da *Şivanê Kurmanca* romanı üzerine yaptığımız araştırma ve incelemelerden sonra elde edilen tespitler belirtilmiştir.

Anahtar Kelimeler: *Şivanê Kurmanca*, Erebê Şemo, Roman, Kürtçe Roman, Sovyetler Birliği, Teknik, Tema.

ABSTRACT
MASTER'S THESIS
TECHNICAL AND THEMATIC STUDY OF ŞIVANÊ KURMANCA NOVEL BY
EREBÊ ŞEMO

Nihat KAVŞUT

Advisor: Assoc. Prof. Mehmet DİNÇOĞLU

2017, Page: 108

Erebê Şemo is considered to be the pioneer of novel writing in Kurdish literature and has penned the novel *Şivanê Kurmanca*, the first novel of Kurdish literature.

The purpose of this research is to study technical and thematic aspects of the novel *Şivanê Kurmanca*.

Our thesis study consists of two parts apart from introduction and conclusion. The introduction mentions the birth and development of the novel. The emergence of novel in Kurdish literature, its main characteristics and the reasons for this characteristic are also studied.

The first part gives information about the period Erebe Şemo lived, his works, life, and literary personality during the Soviet Union.

The second part includes the technical and thematic study of the novel.

Technical details such as narration, plot, persons, time, space, language and style are studied and narrative technique of the novel is determined in this part.

In addition, themes we obtained from the novel are explained with examples from the text.

In the conclusion part, the findings obtained after researches and studies we have made on *Şivanê Kurmanca* are mentioned.

Key Words: *Şivanê Kurmanca*, Erebe Şemo, Novel, Kurdish Novel, Soviet Union, Technique, Theme.

PÊŞGOTIN

Berhemên edebî û hunerî di heman demê da belgeyên dîrokî ne û him ji bona heyama xwe û him jî ji bona heyamên pey xwe gelek girîng in. Di vê çarçoveyê da *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo jî berhemeke wisa ye. *Şivanê Kurmanca* him wek romana ewil ya bi Kurdî (Kurmancî) tê qebûlkirin û him jî şahidê dema xwe ye.

Di nav cureyên edebiyatê da herî zêde roman nêzikî dîrokê dibe. Erebe Şemo jî di *Şivanê Kurmanca* da ji ser jiyana xwe ra him me bi romana yekem dihesîne û him jî rewşa civakî û polîtîk ya heyama xwe nîşan dide. Bi saya *Şivanê Kurmanca* haya me ji rewşa Kurdên Sovyetê çêdibe û em pê dihesin di nav bêzarî û bêkesiyeke çawa da mane.

Erebê Şemo helbet wekî Remezan Alan jî dibêje him “bextewariyeke îdeolojîk” di xwe da dihewîne û him jî di heman demê da “mexdûrê serdemekê” ye.

Di vê tezê da min hewl da romana *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo ji hêla teknîk û mijarê va li gor taybetiyên cureya romanê analîz bikim. Di vê xebatê da *Şivanê Kurmanca* ji hêla taybetiyên romanê û teknîk û mijarê va hatiye nirxandin û analîzkirin û encamên derketin jî hatine eşkerekirin.

Ji bona alîkariya da min sipasiya şêwirmendê xwe Doç. Dr. Mehmet DİNÇOĞLU û nas û dostan dikim.

KURTEBÊJE

amd. : amadekar

bnr. : binihêrin

h.b. : heman berhem

h.g. : heman gotar

hwd. : her wekî din

j. : jimar

r. : rûpel

wer. : wergêr

DESTPÊK

Dabeşkirin û pênasikirina cureyên edebiyatê yê curbecur ji berê da tîn kirin. Platon di berhema xwe ya bi navê *Dewlet* da çavdêriyên xwe yê ji gotûbêja di navbera Sokrates û Adeimantus da neqil dike û Sokrates di vê gotûbêjê da qala komedî, tragedya, mîtolojî, helbest û terzên vegotinê yê curbecur dike. Aristoteles di berhema xwe ya bi navê *Poetika* da tragedya, komedî û formên curbecur yê helbestê û taybetiyên wan yê sereke dabeş dike û li gorî cudahî û nêzikahiya di navbera cureyên edebiyatê da taybetiyên wan yê sereke pênasê dike.¹ Di warê derketin, dabeşkirin û pênasikirina cureyên edebiyatê da herî zêde taybetiyên wekî şikil, naverok, şêwaz û çarçove derketine pêş. Ji berê da berhemên edebiyatê wek helbest û nesrê hatine nivîsandin. Ev herdu cure jî ji hêla şikil, naverok, şêwaz û çarçoveyê va di nav xwe da dabeş dibin. Wek mînak di bin sernavê helbestê da helbesta manzûm û mensûr û helbesta epîk, lîrik, dîdaktîk û pastoral heye; li gor terciha netewe û çandên curbecur jî bi taybetiyên xwe yê cihê mesnewî, sone, xezel, helbesta serbest û gelek cureyên helbestê hene. Di warê nesrê da jî şano (dram, komedî û trajedî), çîrok, çîrçîrok, fabl, roman, bîranîn, pexşan, gotar, name, rojnivîsk, biyografî, destan û seyehat hene. Bi demê ra cureyên edebiyatê diguherin, dikevin nav hev û heta her cure jî di nav xwe da dabeş dibin. Di nav cureyên edebiyatê da herî zêde roman cureyeke berfireh e û bi demê ra zehf guheriye.²

Wek cureyeke edebiyatê roman piştî helbest û şanoyê derketiye û bi demê ra jî kemiliye.³ Di çavkaniyên li ser romanê da derheqê derketin û terîfkirina romanê da şirove û fikrên curbecur hene. Loma jî him pênasikirin û him jî eşkerekirina destpêkirina romanê hêsan nîne. Helbet ji ber gelek taybetiyên romanê û sedeman rewş wiha ye. Lewra taybetiyeke sereke ya romanê ew e di derketin û pêşketina xwe da ji cureyên wek destan, romans,⁴ pîkaresk⁵, dîrok û jînenîgariyê yê beriya xwe îstifade

¹ Haşîm Ahmedzade, **Ulus ve Roman Fars ve Kürt Anlatsal Söylemi Üzerine Bir Çalışma**, Azad Zana Gündoğan (wer.), İstanbul: Pêri Yayınları, 2004, r. 43.

² Selçuk Çıkla, "Romanda Kurmaca ve Gerçeklik", **Hece**, j. 65-66-67, (2002), r. 126.

³ Ünal Aytür, "Çevirenin Önsözü", **Roman Sanatı**, İstanbul: Adam Yayıncılık, 1982, r. 9.

⁴ Romans di destpêkê da metnên manzûm yê gelêrî ne û di nav kelepore edebiyata devkî da tîn hesabandin. Bi demê ra metnên romansan yê mensûr yê nivîskarên wan eşkere ne tîn nivîsandin. Bi gelemperî mîtolojî, çîrçîrok, destan û çîrokên gel di nav edebiyata romansan da tîn qebûl kirin. Mînakên ewil yê romansan sedsala 2yan bi metnên di Yewnanan da tîn dîtin dest pê dike. Di Serdema Navîn da romansên manzûm û mensûr û di Ronesansê da jî çîrokên gerokan hene. Li Rojavayê romans ji sedsala 2yan heta sedsala 18an dewam dikin. Romans qala çîrokên şovalyeyan dikin û di nav derdorên aristokrat

kiriye û wekî van cureyên edebiyatê neketiye nav sînor û qaliban.⁶ Roman ji hêla form û teknîkê va cureyeke berfireh e û dikare gelek cureyên edebiyatê di nav xwe da bihewîne, loma jî bi vê taybetiya xwe roman cureyeke wisa ye tim pêş dikeve, xwe teze dike û li gor heyamê rengê xwe dibîne. Ji bona vê taybetiya romanê Bahtin wiha dibêje,

“Wek cureyekê li ber analîzkirina romanê hin zor û zehmetî hene. Ev jî rasterast ji ber naveroka bêhempa ya mijarê derdikeve holê. Roman pêşvaçûna xwe berdewam dike, yanê cureya tekane ye hê nehatiye temamkirin. Otorîteyên wek cureyekê romanê terîf dikin jî li ber çavên me li ser kar in. Wek cureyekê derketin û pêşvaçûna romanê di bin ronîya heyama dîrokî ya dewam dike da pêk tê. Wek cureyekê hê banê romanê şikil negirtiye û em hê jî nikarin sînorên romanê yên berfireh ji hev derxin.”⁷

Li gorî Lukacs jî roman berevajiyê cureyên din yên hebûna wan li ser çarçoveyên temambûyî ava dibe di nav pêvajoyekê da ye ji bona xwe temam bike.⁸

Bi gelemperî romanên pîkaresk yên di nav sedsala 16an da li Îspanyayê derketine û di demeke kurt da li Ewropayê belav bûne û romansên beriya romanên pîkaresk derketine û bi taybetî di sedsala 17an û sedsala 18an da zehf hatine xwendin bi taybetiyên xwe yên wê demê di bingeha derketin û pêşketina romanê da roleke gelek girîng girtine û romana îroyîn ji ber endîşeyên xwendevan û nivîskarên cidî li dijî romansan wek bertek derketiye. Daniel Defoe di pêşgotina romana xwe ya bi navê *Moll Flanders* da acizîya xwe ya ji bona eleqeya xwendevan nîşanî romansan didin eşkere dike û dibêje romana wî li ser çîroka jinekê ye û di rastiyê da jiyaye. Armanca Defoe ew e bi xwendevanan bide bawerkirin tiştên dinivîsîne rast in. Henry Fielding di pêşgotina romana xwe ya bi navê *Joseph Andrews* da dibêje cureyeke nû ya romanê afirandiyê û eşkere dike romana wî bi kîjan taybetiyên xwe ji romansan cuda dibe. Li gorî Fielding romans ji rastiyên jîyan û tebîetê dûr in.⁹ Di vê mijarê da Kettle dibêje, “Piraniya romanên girîng yên di sedsala 18an da li dijî romansan derketine. Roman li dijî romansên Serdema Navîn û neviyên wan yên di sedsalên 16 û 17an da di qesran da dijîn

da derketine. Di romansan da bûyerên ji aqilan der û dûr û kesên xwediyê taybetiyên mezin in hene. (Bnr. Nurullah Çetin, **Roman Çözümleme Yöntemi**, Ankara: Öncü Kitap Yayınları, 2007, r. 24-25)

⁵ Pîkaresk di nav sedsala 16an da li Îspanyayê derdikevin û di demeke kurt da li Ewropayê belav dibin. Navê romanên pîkaresk ji peyva “pîcaro” ya Îspanyolî tê. “Pîcaro” tê meneya kesê “serberedayî” û lehengê romanê terîf dike. Di metnên pîkaresk da bûyerên diqewimin bêyî di navbera wan da têkilî û pêwendî bê danîn li pey hev tîrêzîkin. Di metnên pîkaresk da armanc ew e kirêfî û xirabiyên di civakê da bîr eşkerekirin. (Bnr. Aytür, **h.b.**, r. 11-12)

⁶ Aytür, **h.b.**, r. 10.

⁷ Mihail Bahtin, **Karnavaldan Romana Edebiyat Teorisinden Dil Felsefesine Seçme Yazılar**, Cem Soydemir (wer.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2014, r. 155.

⁸ Georg Lukacs, **Roman Kuramı**, Cem Soydemir (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 2011, r. 79.

⁹ Aytür, **h.b.**, r. 11-12-13.

bertekeke rasteqîn e.”¹⁰ Lukacs jî dibêje, “*Don Quijote* wek parodiyeye romanên şovelyeyan hatiye honandin û helbet ev jî tişekî belasebeb nîne.”¹¹

Di warê cureya romanê da bi gelemperî *Don Quijote* ya Miguel de Cervantes ya di sedsala 17an da hatiye nivîsandin wek romana ewil ya serkeftî tê qebûlkin, lê di vî warî da fikrên curbecur hene. Li gorî Kundera roman bi berhemên François Rabelais yên bi navê *Gargantua û Pantagruel* yên destanên gel in û di nav Serdema Navîn da wek kitêb hatine çapkirin pêş ketiye.¹² Bahtin di vê mijarê da dibêje heger em bibêjin di destpêka sedsala 18an da roman bi *Robinson Crusoe* ya Defoe dest pê kiriye wê Cervantes, Rabelais, Geoffrey, Dante û Boccaccio bi me bikenin, lewra Bahtin hemû nesrên di Yewnana Antîk, Serdema Navîn û Ronesansê da beriya sedsala 18an hatine nivîsandin wek metnên honandî yên romanê qebûl dike.¹³ Di mijara derketin û pêşketina romanê da Booth dibêje tê gotin roman bi Cervantes, Defoe, Fielding, Samul Richardson û Jane Austen yan jî bi Homeros dest pê kiriye, lê wisa nîne, roman di berhemên filan nivîskar û bêvan nivîskarî da dijî.¹⁴ Wekî ji fikr û nêrînên curbecur jî tê fehmkirin roman xwe nû dike û li ser berhemên beriya xwe û yên piştî xwe dimeşe û geş dibe. Di vê mijarê da Parla dibêje, “Her çiqas *Don Quijote* wek roman neyê qebûlkin jî metneke wisa ye rê li ber romanê vekiriye û hemû ziman û vegotinan di xwe da dihewîne.”¹⁵

Piştî rêya Cervantes yan jî Rabelais û yên din vedikin di sedsala 18an da romannûsên wekî Defoe, Richardson û Fielding bi pirtûkên xwe pêşengiyê dikin ji bo roman pêş bikeve. Roman di demeke kurt da zehf pêş dikeve û digihîje taybetiyên xwe yên sereke.¹⁶ Wattê li ser derketina romanê xebitiye ji bo romanê dibêje cureyeye nû ye û Defoe, Richardson û Fielding di destpêka sedsala 18an da romanê dane destpêkirin û

¹⁰ Haşîm Ahmedzade, **h.b.**, r. 66. (Arnold Kettle, **An Introduction to the English Novel: Volume I**, George Eliot (wer.), London: Hutchinson, 1972, ji r. 28an hatiye neqilkin)

¹¹ Georg Lukacs, **h.b.**, r. 105.

¹² Milan Kundera, **Saptırılmış Vasiyetler**, Özdemir İnce (wer.), İstanbul: Can Yayınları, 1995, r. 9.

¹³ Zekiye Antakyalıoğlu, **Roman Kuramına Giriş**, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2013, r. 23. (Mikhail Bakhtin, **The Dialogic Imagination: Four Essays**, Michael Holquist-Caryl Emerson (wer.), DYA: University of Texas Press, 2006, ji r. 39an hatiye neqilkin)

¹⁴ Wayne C. Booth, **Kurmacanın Retoriği**, Bülent O. Doğan (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 2012, r. 46.

¹⁵ Jale Parla, **Don Kişot'tan Bugüne Roman**, İstanbul: İletişim Yayınları, 2013, r. 72.

¹⁶ Aytür, **h.b.**, r. 9.

ji hêla formê va jî ji metnên di Yewnana Antîk û Serdema Navîn yan jî di sedsala 17an da li Fransayê hatine nivîsandin cuda ye.¹⁷

Helbet gelek şirove û agahiyên derheqê romanê da ji bona derketina romanê dîrokeke rasterast nadin, lê roman wek berhema civaka bûrjûwaziyê derketiye holê û di sedsalên 17 û 18an da kemiliye û epîk, efsane, destan, çîrokên qehremaniyê, bîranîn, serborî û çîrokên gelêrî di derketin û pêşketina romanê da roleke mezin girtine. Li gor Kundera roman her çiqas bi zimanên curbecur derketibe û hatibe îcadkirin jî malê Ewropayê ye û seyyhatên berê jî romanên ewil yê Ewropayê ne.¹⁸ Wek cureyeke edebiyatê roman ji Ewropayê belavî dinyayê bûye û bi gelemperî di nav sedsala 17an û heyamên pey wê ra derketiye pêş. Ji bona pêşketina romanê sedsala 18an zehf girîng e, lewra herî zêde di sedsala 18an da bandor û çarçoveya romanê berfireh dibe û heyameke nû dest pê dike. Defoe û Richardson nivîskarên herî navdar yê sedsalê ne û herî zêde tî xwendin.¹⁹ Li gorî Watt girîngî û taybetiya Defoe û Richardson ew e cara ewil di nîşandana rastiyê da serkeftî ne.²⁰ Di vê sedsalê da di nav gelên Ewropayê da rêjeya kesên xwenda zêde dibe û wek encameke tebiî ya vê pêvajoyê jî di nav gel da xwendina pirtûkan zêde dibe. Lewra Watt jî dibêje, “Di sedsala 18an da gelek çavdêr tespît dikin di nav gel da eleqeya li ser xwendinê zêde bûye û di nav civakê da rêjeya xwendevanan jî zêde bûye.”²¹ Di vê heyamê da êdî civak digihure û teknoloji derdikeve pêş. Li welatên Ewropayê netewe li azadiya xwe digerin û helbet wateya romanê jî hinekî berfireh dibe. Di sedsala 18an da Şoreşa Fransayê çêdibe û şoreş bandorê li gelên cîhanê jî dike. Împeratoriye bi sedan salan belav dibin û netewe-dewlet tî avakirin. Netewe-dewlet bi pergalên xwe yê siyasî, aborî û perwerdehiyê civaka xwe “ava dikin”. Lewra ji bona avakirina neteweyekê tevî sînorên siyasî pêwistî bi edebiyateke neteweyî jî heye. Ji bo neteweyîbûnê wekî Jusdanis jî dibêje, “Ji bona neteweyek bibe netewe du tişt pêwist in: Firehkirina sînoran û çêkirina ziman û edebiyata xwe. Neteweyek ne tenê sînorên xwe yê fizikî divê sînorên hişmediya xwe jî fireh bike.”²² Di nav hemû cureyên edebiyatê da herî zêde roman xizmeta vê yekê dike. Lewra siyasî netewe ava

¹⁷ Ian Watt, **Romanın Yükselişi Defoe, Richardson ve Fielding Üzerine Denemeler**, Ferit Burak Aydar (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 2007, r. 9-10.

¹⁸ Milan Kundera, **Roman Sanatı**, İsmail Yerguz (wer.), İstanbul: Afa Yayınları, 1989, r. 13-14-15.

¹⁹ Parla, **h.b.**, r. 139.

²⁰ Watt, **h.b.**, r. 38.

²¹ Watt, **h.b.**, r. 39.

²² Gregory Jusdanis, **Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcat Edilişi**, Tuncay Birkan (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 1998, r. 76.

nekir, lê ziman û edebiyatê, wek cure jî romanê netewe ava kir. Şêweya teswîrê ya romanê rê li ber vekir meriv civakeke taybet, yanê neteweyekê texeyyul bike.²³ Digel pêşketina netewe û edebiyata neteweyan gelek girîng e di vê heyama teze da berhema Goethe ya bi navê *Faust* derdikeve û Moretti dibêje, “Goethe epîkeke modern nivîsiye.”²⁴

Gelek teorî û fikren derheqê romanê da li ser derketina romanê li hev nakin, lê tiştê li serê li hev dikin ew e roman di encama dîrok û çandê hevpar da kelepore hevbeş ya ceribandîna mirovahiyê ji me ra vedibêje û vê rolê pêk tîne. Ji ber vê jî dibe roman di demên cuda cuda da bi destê kesekî yan jî bi destê çand û keleporeke hevbeş derketibe, lê ya girîng ew e dema şert û mercê çêdibin roman jî derdikeve meydanê.²⁵ Helbet pêşvaçûna romanê bi xwe ra teorî û fikrên teze yê derbarê romanê da jî tîne. Di rastiyê da teorî û fikrên derheqê romanê da zêde bala xwe nadin ser derketina romanê, zêdetir bala xwe didin ser naverok û fonksiyona romanê. Roman çima derketiye, qala çî dike, çî di xwe da dihevine, taybetiyên wê çî ne û bi kêrî çî tê. Beriya her tiştî wek cureyeke edebiyatê roman bala xwe dide ser însanan û rewşa wan ya cihêreng. Ji ber vê jî Kundera dibêje di serdemên modern da felsefe û zanist însanan dide jibîrkirin û hunera romanê cardin însanan keşf dike. Loma jî Kundera di berdewamiyê da dibêje Descartes çiqas avakarê heyamên nûjen be, bi qasî wî Cervantes jî avakarê heyamên modern e.²⁶ Roman hebûnê li gor taybetî û şert û mercên xwe cardin keşf dike. Cervantes û hemdemên wî ji xwe pirs kirine macere çî ye û bi pey ketine. Samuel Richardson bala xwe daye ser tiştên di derûniyê da diqewimin û her tiştî raxistiye ber çavan. Balzac têkiliya insan û dîrokê keşf û eşkere kiriye. Flaubert di romanên xwe da ketiye pey keşfkirina ax û welatê wenda ya ji bo jiyana rojane meçhûl û razber e. Tolstoy bal kişandiye ser nakokiyên di navbera tevger û biryarên însanan da. Marcel Proust li ser mefhûm û têgeha “zeman” sekiniye û bi pey zemanê berê ketiye ya êdî nayê qefaltin. James Joyce daye pey zemanê niha yê bi dest nakeve û Thomas Mann balê kişandiye ser rol û tesîra mîtan yê bandor û tesîrê li ser însanan dikin.²⁷

²³ Ahmedzade, **h.b.**, r. 9-10.

²⁴ Franco Moretti, **Modern Epik Goethe'den Garcia Marquez'e Dünya Sistemi**, Nurçin İleri-Mehmet Murat Şahin (wer.), İstanbul: Agora Kitaplığı, 2005, r. 15.

²⁵ Azade Seyhan, **Dünya Edebiyatı Bağlamında Modern Türk Romanı Kesişen Yazgıların Hikâyesi**, Erkan Irmak (wer.), İstanbul: İletişim Yayınları, 2014, r. 28.

²⁶ Kundera, **h.b.**, r. 12.

²⁷ Kundera, **h.b.**, r. 13.

Heta niha gelek terîfên romanê hatine kirin, lê piraniya terîfan bi fikra wan kesan va sînorkirî mane. Wek mînak Henry Fielding sala 1742yan di pêşgotina *Joseph Andrews* da dibêje roman “helbesteke epîk û komîk ya di şiklê nesrê da ye”, li gorî Hegel roman “epîka bûrjûwaziyê ye”, li gorî Henry James roman “mala honandinê ye û bi milyonan şibake û pacyên wê hene”, li gorî Stendhal roman “eynîkek e û em bi rê da bi xwe ra digerin”, li gorî Zola “mezinahiya romanê ji hêza xeyalê wêdetir di nîşandan û teswîrkirina tebîetê da ye” û li gorî D.H. Lawrence roman “roniya heyatê ya bihêz e”.²⁸

Bi kurtasî roman li Rojavayê piştî destanên di nav edebiyata devkî da cî digirin bi demê ra diguherin roman jî di encama vê pêvajoyê da derdikeve meydana. Di bingeha derketin û pêşvaçûna romanê da destan, çîrçîrok, çîrokên gel û qehremaniyê roleke mezin girtine. Wek cureyeke edebiyatê roman bi çî awayî dibe bila bibe bi taybetî ji destpêka xwe ya ji sedsala 17an vir va guherînên mezin derbas kiriye. Roman piştî ji bin bandora destan, romans û pîkareskan derdikeve dikemile û wek cure û dinyayeke îcadkirî dibe vegotîneke taybet ya heyamên nûjen. Roman bi gelemperî di sedsalên 18 û 19an da taybetiyên xwe yên sereke digire. Di sedsala 18an da roman êdî pala xwe dide ser çîrokên bingehe û hestên xwe ji rastiye digirin. Helbet di vê sedsalê da bi pêşvaçûna teknolojiye ra derfet û teknîkên çapkirinê jî pêş dikevin. Ev geşedan dibe sedem nivîskar pirtûkên xwe çap bikin û jê pere qezenc bikin û bêtir binivîsin. Di sedsala 18an da Şoreşa Fransayê ji bona nivîskaran qadên nû vedike û ev jî bi kêrî nivîskaran tê û bi sedsala 19an ra nivîskar êdî profesyonel dibin û li ser romanê şirove û nirxandinên teorîk dikin. Romana îroyîn ya ji Ewropayê li dinyayê belav bûye di civakên curbecur û di zemanên curbecur da derketiye holê û rolên cuda cuda lîstîye.

Li Rojhilata Navîn dîroka romanê di dawiya sedsala 19an da dest pê dike. Di dîroka gelek zimanên rojhilatî da serdestiya helbestê ya li ser cureyên din yên edebiyatê her dem heye. Heta destpêka sedsala 20an tevî dîroka xwe ya li dora pêncsed salî edebiyata Kurdî bi helbestê tê temsîlkirin û heta dawiya sedsala 20an jî serdestiya helbestê ya li ser pexşannûsiya Kurdî dewam dike. Di xebatên li ser romana Kurdî da divê rewşa dabeşkirî ya Kurdan û helwestên cuda yên dewletên serdest yên li dijî

²⁸ Antakyalıoğlu, **h.b.**, r. 24-25.

Kurdan neyê piştguhkirin.²⁹ Lewra ji bona edebiyata Kurdî zor û zehmetiya herfî mezin taybetiya wê ya perçebûyî ye. Civaka Kurdan civakeke dabeşkirî ye û ji hêla hiqûqî û siyasî va ji “yekîtiya neteweyî” mehrûm maye. Ji ber astengiyên di warê siyasî û çandî da û paşdamayîna civaka Kurdan ji bo derketin û pêşvaçûna romana Kurdî şert û mercên hewce dikin derneketine meydanê.³⁰ Lê rewşa taybet ya li Yekîtiya Sovyetan rê li ber derketina romana Kurdî vedike. Di deh salên ewil yê piştî Şoreşa Cotmehê ya di sala 1917an da xebatên Kurdan bi destê dewletê tînan fînansekirin. *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo ya yekem romana Kurdî di sala 1935an da li Erîvanê ji ber van şert û mercan tê çapkirin.³¹ Helbet li ber romana Rojavayê ya dûr û dirêj romana Kurdî dereng dest pê kiriye. Romanên ewil yê bi Kurdî wek romanên “sosyalîst-realîst” tînan qebûl kirin. Sedema vê jî ji endîşeyên edebî wêdetir e. Bi gotineke din derketina romana Kurdî wek romana Rojavayê ji ber guherînên civakî û epîstemolojîk yê navxweyî çênebûye. Li Yekîtiya Sovyetan piştî Şoreşa Cotmehê Kurdên li wê derê dimînin dikarin ji hin mafên ziman û çandî îstifade bikin. Loma jî romanên Kurdî yê ewil ji hêla kesên endamên Partiya Komunîst ya Yekîtiya Sovyetan bûn hatine nivîsandin. Nivîskarên wê demê armanc dikirin bîr û baweriyên xwe derxin pêş. Di romanên wan da taybetiyên nimûneyên “realîzma sosyalîst” bi awayekî din “hizirkirina nivîskar” heye. Romanên “sosyalîst-realîst” “li pey çareseriyê pirsgirêkên ezêlî yê di realîteya civakî da, humanîzma aktîf û tevgerên civakî-siyasî yê pêşverû digerin.”³² Bi bayê wê heyamê ra romanên Erebe Şemo yê bi navê *Kurmançêd Elegezê* (1936), *Berbang* (1958), *Jiyana Bextewar* (1959), *Dimdim* (1966) û *Hopo* (1969) tînan weşandin. Yek ji nivîskarên wê heyamê Eliyê Evdilrehman e û di sala 1959an da romana wî ya ewil *Xatê Xanim* li Erîvanê tê çapkirin. Peyra romanên wî yê bi navê *Gundê Mêrxasa* (1968) û *Şer Çiya Da* (1989) tînan weşandin.³³ Wek mayîna romana *Hewarî* (1967) ya Heciyê Cindî, *Kurdê Rêwî* (1979) ya Şehîdê Îbo û *Dê û Dêmari* (1986) ya Egîdê Xudo³⁴ li Erîvanê hatine weşandin û ev hemû wek romanên ewil yê bi Kurdî tînan hesibandin û rê li ber geşbûna romana Kurdî vekirine. Di berhemên romannûsên wê heyamê da ji tecrubeya edebiyata

²⁹ Haşim Ahmedzade, **Romana Kurdî û Nasname**, Fahriye Adsay (wer.), Stenbol: Weşanên Avesta, 2011, r. 48.

³⁰ Ahmedzade, **Ulus ve Roman**, r. 213.

³¹ Ahmedzade, **Romana Kurdî û Nasname**, r. 48-49.

³² Ahmedzade, **h.b.**, r. 18.

³³ Ahmedzade, **h.b.**, r. 49.

³⁴ Helîm Yûsiv, **Romana Kurdî**, Amed: Weşanên Ronahî, 2011, r. 61.

Rûsî bêtir tecrubeya edebiyata piştî şoreşê heye.³⁵ Romanên ewil yên di vê heyamê da derketine bi niyetên îdeolojîk û bi bîr û baweriyên nivîskaran şikil girtine. Babetên sereke yên van romanên li ser evîn, kevneşopiyên Kurdan, axa û şêxên feodal yên xwedîhêz, tevgerên civakî yên dîrokî, kedxwariya gel, belavbûna fikrên sosyalîst û wekhevîya di nav Kurdan da ne. Di van romanên da bi danberheva şertên jiyânê yên berî û piştî damezirandina sosyalîzmê nivîskar dixwazin îspat bikin sosyalîzm ji kapîtalîzmê baştir e.³⁶

Şivanê Kurmanca wek romana ewil ya bi Kurdî tê qebûlkirin, lê dîsa jî tesbîtîkirina romana Kurdî bivênevê bi edebiyata hemû Kurdan û hemû zaravayên Kurdî ra eleqedar e. Ji ber du berhemên li Kurdistana Iraqê bi zaravayê Soranî hatine nivîsandin yekembûna romana Kurdî ya bi zaravayê Soranî bûye mijara nîqaşê. Ji van berheman yek *Meseley Wijdan* (Meseleya Wijdanê) û ya din jî *Nazdar ya Kiçî Kurd Le Ladê* (Nazdar yan Keçeke Kurd ya Li Gundekî) ye. *Meseley Wijdan* ya Ehmed Muxtar Caf e û di navbera salên 1927 û 1928an da hatiye nivîsandin. Ev berhem çîrokeke dirêj e û her çiqas berê hatibe nivîsandin jî di sala 1970an da li Bexdayê hatiye çapkirin. Ji ber dîroka weşandinê zehmet e meriv *Meseley Wijdanê* wek berhema ewil bihesibîne. Mînakî duyemîn jî *Nazdar ya Kiçî Kurd Le Ladê* ye. Ev berhem ya Mihemmed Elî Kurdî ye û nivîskar wê wek roman pênase dîke. Sê beşên vê berhemê heya sala 1936an di kovara bi navê “Rûnakî” da hatine weşandin. Piştî kovarê tê girtin beşên din nayên weşandin û wek roman jî nayê çapkirin.³⁷ Romana *Pêşmerge* ya Rehîmê Qazî³⁸ romana yekem e bi zaravayê Soranî hatiye weşandin. Roman cara yekem di sala 1960î da li Erîvanê hatiye çapkirin û romaneke sosyalîst-realîst e.³⁹ Romana *Janî Gel*⁴⁰ (Jana Gel) ya Îbrahîm Ehmed di sala 1956an da bi zaravayê Soranî tê nivîsandin, lê di sala

³⁵ Mûsa Ekîcî û Sara Anter, “Romana Kurdî ya Sovyetîk û Saqoyê Gogol”, *Wêje û Rexne*, j. 3, (2014), r. 314.

³⁶ Ahmedzade, *h.b.*, r. 20.

³⁷ Ahmedzade, *h.b.*, r. 51-52.

³⁸ Rehîmê Qazî di dema Komara Demokratîk ya Kurdistanê da ji Mehabadê derdikeve û diçe Yekîtiya Sovyetan û vê berhemê dinivîsîne. Piştî Komara Kurdistanê têk diçe li Yekîtiya Sovyetan dimîne. Roman cara ewil di sala 1960î da li Erîvanê tê weşandin. Di sala 1961an da jî li Bexdayê tê çapkirin. Di sala 1980an da roman li Îranê tê weşandin. Di sala 1997an da Ziya Avcî Kurmanciya wê amade dîke û li Stockholmê tê weşandin. Di sala 2000î da jî li Hewlêrê bi destê Weşanxaneyê Arasê va tê çapkirin. (Bnr. Ahmedzade, *h.b.*, r. 21)

³⁹ Ahmedzade, *h.b.*, r. 21.

⁴⁰ Ziya Avcî romana *Janî Gel* bi navê *Jana Gel* dîke Kurmancî. Hin beşên romanê di sala 1969an da di kovara Rizgarîyê da tên weşandin. (Bnr. Ahmedzade, *h.b.*, r. 53)

1972yan da çap dibe.⁴¹ Babeta sereke ya *Pêşmerge û Janî Gel* li ser azadiya neteweyî û bi zor û zehmet bidestxistina wê ye.⁴² Di zaravayê Zazakî da romana yekem li gor Kurmancî û Soranî dereng hatiye nivîsandin. Di zaravayê Zazakî da romana ewil *Kilama Pepûgî* (Kilama Pepûkê) ya Deniz Gündüz e û di sala 2000î da li Enqereyê hatiye weşandin.⁴³ Di romanê da qala bûyerên sala 1915an û kuştina Ermeniyan tê kirin.⁴⁴

Di romana Kurdî da ji destpêka xwe ya li Yekîtiya Sovyetan vir va him ji aliyê şêwazê û him jî ji aliyê mijarê va guherînên mezin çêdibin. Lê di destpêkê da ji ber astengiyên siyasî, ziman û çandî romanên li Yekîtiya Sovyetan tînin nivîsandin û çapkirin nakevin destê Kurdên li perçeyên din. Hin roman hê piştî salên 1970-1980an bi zaravayê Soranî tînin weşandin. Ji ber van sedeman di romana Kurdî da kevneşopiyê hevpar ava nabe. Heta salên 1980an piraniya romanên Kurdî li Yekîtiya Sovyetan tînin çapkirin.⁴⁵ Li Kurdistana Iraqê pirsgerêka weşandina bi Kurdî tesîrê li romana Kurdî jî dike. Wek mînak *Meseley Wijdanê* ya Ahmed Muxtar Caf di sala 1927-1928an da û *Janî Gel* ya Îbrahîm Ehmed di sala 1956an da hatiye nivîsandin, lê dereng tînin çapkirin.⁴⁶ Di sala 1970an da Kurdên li Kurdistana Iraqê otonomiyê siyasî bi dest dixin. Bi vê otonomiyê ra firsend ji nivîskar û ronakbîran ra çêdibe xebatên çandî û fikrî bikin.⁴⁷ Piştî salên 1980an ji bo pêşketina romana Kurdî li Kurdistana Iraqê demeke îzafî çêdibe. Di vê heyamê da li Iraqê Hisên Arif di sala 1986an da romana xwe ya yekem *Şar* (Bajar) diweşîne û di salên 1990 û 1999an da *Endêşey Mirovek* (Fikarên Zilamekî) û *Hêlane* (Hêlîn) û Mihemed Mukrî bi romanên xwe yê *Heres* (Têkçûn), *Segwer* (Ewtîn) *Tole* (Tol) û *Ejdîha* (Ejderha) li Kurdistana Iraqê di nav pêşengên romana Kurdî da ne.⁴⁸ Romana *Şar* ya Hisên Arif yek ji romanên sereke yê edebiyata Kurdî tê hesabandin. Roman teswîreke edebî, modern û epîk ya bajarê Silêmaniyê ye.⁴⁹ Ji Kurdên Sûriyeyê Bavê Nazê romana wî ya yekem *Çiyayên Bi Xwînê Avdayî* ewil bo Erebi û peyra ji bo

⁴¹ Ahmedzade, **h.b.**, r. 23.

⁴² Ahmedzade, **h.b.**, r. 137.

⁴³ Rojan Lezgîn, “Modern Kirmancca (Zazaca) Edebiyatı”, **Zazakî.Net**, 9ê Gulana 2011an, <http://www.zazaki.net/yazi/modern-kirmancca-edebiyati-168.htm>, (Dîroka Nihêrînê: 27ê Sibata 2017an).

⁴⁴ Yûsiv, **h.b.**, r. 70.

⁴⁵ Ahmedzade, **h.b.**, 53.

⁴⁶ Ahmedzade, **h.b.**, r. 22.

⁴⁷ Mehmed Uzun, **Destpêka Edebiyata Kurdî**, Îstanbul: İthaki Yayınları, 2011, r. 58.

⁴⁸ Ahmedzade, **h.b.**, r. 24.

⁴⁹ Uzun, **h.b.**, r. 59.

Rûsî tê wergerandin û di sala 1981an da li Moskovayê tê çapkirin.⁵⁰ Kurmanciya berhemê jî peyra di sala 1989an da li Stockholmê tê weşandin.⁵¹ Romana Bavê Nazê ya bi navê *Stokholmê Te Çi Dîtiye Bêje* di sala 1987an da çap dibe.⁵² Azad Bavê Şahîn romana xwe ya bi navê *Yên Perîşan* di sala 1991an da li Bêrûdê diweşîne. Xemgîn Temo romana xwe ya bi navê *Pala Bê Şop*⁵³ (1983) çap dibe û Helîm Yûsiv jî romana xwe ya ewil *Sobarto* di sala 1999an da li Tirkîyeyê çap dibe.⁵⁴ Di destpêkê da piraniya romannûsên Kurd yê ji Tirkîyeyê berhemên xwe li derveyê welêt dinivîsin û çap dikin. Romana Mehmed Uzun ya ewil *Tu* di sala 1985an da, *Mirina Kalekî Rind* di sala 1987an da, romana *Hêlîn* ya Mehmûd Baksî di sala 1984an da, *Gundikê Dono* di sala 1988an da û *Labîrenta Cinan* ya Hesenê Metê di sala 1994an da li Stockholmê têt çapkirin.⁵⁵ Romana yekem li Kurdistana Îranê çap dibe ji aliyê Fetah Emîrî va hatiye nivîsandin. Navê wê *Hawarebere* ye û di sala 1990î da çap dibe. Di vê heyamê da wek mayîn di sala 1993yan da *Mîrza* (Katib) ya Fetah Emîrî, di sala 1998an da *Gulî Şoran* (Gulîlka Şoran) ya Eta Nehayî û di sala 1999an da *Hezar Eşkewt* (Hezar Şikeft) ya Emer Mewlûdî, *Şarbeder* (Bajarbeder) ya Husên Şerbegî û *Blind û Newî* (Bilind û Nizim) ya Nesrîn Caferiyê çap dibin.⁵⁶

Di destpêkê da romana Kurdî beriya her tiştî ji nav siyasetê derdikeve. Di vir da jî tesîra Şoreşa Cotmehê ya di sala 1917an da, li Kurdistana Îranê di sala 1946an da damezirandina Komara Kurdistanê ya li Mehabadê û hilweşîna wê û li Kurdistana Iraqê tevgera di sala 1961 û 1975an da di serokatiya Mele Mistefa Barzanî da tê meşandin heye. *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo, *Pêşmerge* ya Rehîmê Qazî û *Janî Gel* ya Îbrahîm Ehmed him ji bona destpêkê û him jî di zaravayên Kurdî da romanên ewil in û divê di vê çarçoveyê da bêt nirxandin. Xalên hevbeş yê di navbera wan da ew e ji hêla naverokê va di bin tesîra siyasetê da ne û nivîskarên wan di ber karên xwe yê siyasî da dest avêtine nivîsandina romanê û bi awayekî rasterast bîr û baweriyên xwe li romanên xwe bar kirine. Lewra Erebe Şemo endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst ya Ermenistanê, Rehîmê Qazî endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat ya

⁵⁰ Naçî Kutlay, "Romana Kurdî", *Nûdem*, j. 18, (1996), r. 60.

⁵¹ Ahmedzade, *h.b.*, r. 55.

⁵² Yûsiv, *h.b.*, r. 15.

⁵³ Kutlay, *h.g.*, r. 61.

⁵⁴ Ahmedzade, *h.b.*, r. 56.

⁵⁵ Kutlay, *h.g.*, r. 62-63-64.

⁵⁶ Ahmedzade, *h.b.*, r. 118.

Kurdistan-Îranê û Îbrahîm Ehmed yek ji serokên Partiya Demokrat ya Kurdistan-Iraqê ye.⁵⁷

Di pêşketina çand û edebiyata Kurdan ya li Sovyetê da werger jî roleke mezin digire. Di qada wergerê da ji aliyê van nivîskar û helbestvanan va gelek berhem tên wergerandin. Di sala 1931an da Erebe Şemo ji nivîskarê Ermenî Aleksadr Araratyan *Koçekê Derewîn* wergerandiye Kurdî. Di navbera salên 1931 û 1937an da ji wêjeya Rûs û Ermanan 15 pirtûk tên wergerandin û ev werger bêtir ji aliyê Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Qaçaxê Mirad, Cerdoyê Gêncî, Ruben Drampyan û Erebe Şemo va tên kirin. Wek mînak Heciyê Cindiyê kedkarê edebiyata Kurdî di navbera salên 1931 û 1978an da ji cureyên curbecur 15 berhem wergerandine. Di sala 1931an da *Serhatiya Casimê Kurd* (1931) ya Lazo ji aliyê Heciyê Cindî û Emînê Evdal va hatiye wergerandin. Heciyê Cindî ji H. Salçiyân *Rêya Teze* (1934) şanoyeke 3 perde, *Ser Riya Dewlemendiyê* (1935) piyeseke, ji *Sîras Memê û Eysê* (1935) çîrokeke dirêj wergerandiye. Wekî din Heciyê Cindî ji A. Xazaryan *Girr* (1933); ji A. Navasardyan *Traxoma* (1933); ji P. Margaryan *Silametiya Jina* (1934) metnên Ermenîkî wergerandiye Kurdî. Lê di çavkaniyan da derbarê cureyê van berheman da agahî tunin. *Girr* ji gotarên pişîşkiyê pêk tê û wekî nexweşiyekê tê qisekirin. Îhtimalake mezin *Traxoma* û *Silametiya Jina* jî wisan in. Cerdoyê Gêncî ji Daniel Defoe *Robînson* (1936) wergerandiye. Qaçaxê Mirad ji L. Tolstoy *Dîlê Kavkasê* wergerandiye. Qaçaxê Mirad ji Puşkîn, Lermontov, Nekrasov, Gorkî, Mayakovskî jî werger kirine. Ligel van Heciyê Cindî di salên 1940î da ji bo Tiyatroya Kurdan ya gundê Elegezê ji zimanê Ermenîkî 15 piyesek wergerandiye Kurdî. Di salên 1960î da Emerîkê Serdar, Wezîrê Eşo, Egîtê Xudo, Fêrîkê Êsiv û hêj gelek nivîskarên nû ji bo Kurdî berhem wergerandine. Van nivîskarên nû bi wergerên xwe edebiyata Kurdî dewlementir kirine.⁵⁸

Ji bona pêşketina romana Kurdî qadeke din jî diyaspora ye. Nivîskarên Kurd yên li diyasporayê, bi taybetî li Swêdê, romanên li ser rewşa siyasî ya Kurdan ne dinivîsîn. Diyasporaya Kurdan bi taybetî Kurdên ji Tirkiyeyê di pêşketina romana Kurdî da roleke mezin girtine.⁵⁹ Di navbera salên 1980 û 1990î da li Swêdê 49 romanên bi zaravayê Kurmancî hatine weşandin. Ji van romanên 15 roman werger in, 8 roman ji elfabeyên

⁵⁷ Yûsiv, **h.b.**, r. 10-11.

⁵⁸ Ferhat Yılmaz, “*Berawirdkirinek Li Ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî*”, (Teza Mastirê ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê), 2015, r. 19.

⁵⁹ Ahmedzade, **h.b.**, r. 24.

din tîpguhêziya wan hatine kirin û 23 roman jî yên romannûsên Kurd in. Li diyasporayê pêşketina romana Kurdî tenê bi destê romannûsên ji Tirkîyeyê ne pêk nehatiye. Li Swêdê bi zaravayê Soranî 22 roman hatine çapkirin. Ji van romanên 17 roman yên romannûsên Kurdîstana Iraqê û 5 roman jî yên romannûsên Kurdîstana Îranê ne.⁶⁰

Romana Kurdî bêtir li gor guherînên civakî û siyasî yên navxweyî yên civaka Kurdan û li diyasporayê şikil girtiye. Romanên Kurdî yên ewil, bi taybetî romanên li Yekîtiya Sovyetan hatine çapkirin, li gor kevneşopiyên “sosyalîst-realîst” hatine nivîsandin. Derketina romana Kurdî ya li Yekîtiya Sovyetan digel tunebûna ceribandineke bi Kurdî nîşan dide ne ji ber sedemên ziman û wêjeyî, lê piştevaniyeke fermî dikare hevkarîya hilberandina berhemên edebî bike. Ji bilî romanên nivîskarên Sovyetê di romanên Kurdî da şêwe û rêgeza edebî heta salên 1990î “realîzm” e. Di van romanên da hewldanên eşkere hene bi zimanê gel diaxive binivîsîn. Ev jî taybetiyeke sereke ya şêweya “realîst” e. Şêweya “realîst” ji xemilandinên retorîk dûr disekine û zimanê edetî û standartên axaftina edetî bi kar tîne. Di romanên ewil yên Kurdî da dîtineke îlahî serdest e, lê di yên nû da mînakên serkeftî yên vebêjên pirdengî hene. Destpêka salên 1990î di romanên Kurdî da guherînên mezin çêdibin. Di romanên Kurdî da wek “realîzma efsûnî, metaroman, surrealîzm, pêlên hiş û romanên fantastîk” dikevin nav qada romannûsiya Kurdî⁶¹ û gelek berhemên nivîsandin û romannûsiya Kurdî geş dibe. Romana Kurdî ji qonaxa siyasî derbasî qada wêjeyî dibe. Bi her awayî ber bi xweseriyê va diçe. Ji nav lepên mijarên siyasî û jînenîgariya kesên dîrokî derdikeve û cî dide civak û derûniya Kurdan. Ji hêla teknîk û honandinê va ji teknîka romana nûjen ya zimanên cûrbecur sûd werdigre. Zimanê romana Kurdî ber bi resenî û asteke bilind va diçe û di warê ziman da jî zimanekî standart çêdibe. Romana Kurdî dibe rastîyeke edebiyata Kurdî û qada nixandî û rexneyên cûrbecur.⁶²

⁶⁰ Ji bona agahiyên berfireh û navê nivîskar û berhemên. (Bnr. Ahmedzade, **Ulus ve Roman**, r. 199-200-201)

⁶¹ Ahmedzade, **h.b.**, r. 38-39-40.

⁶² Yûsiv, **h.b.**, r. 38.

BEŞA YEKEM

JİYAN, NÊRÎNA EDEBÎ Û BERHEMÊN EREBÊ ŞEMO

1.1. HEYAMA EREBÊ ŞEMO Û ÇANDA KURDÎ LI SOVYETA BERÊ

Kurdên li komarên Sovyetê yên berê dimînin di demên cuda cuda û di navbera salan da ji ber gelek sedeman ax û welatê xwe hiştine, koçber bûne û hatine komarên Sovyetê. Piraniya Kurdan di dema şerê di navbera Rûs û Tirkan da ji sala 1918an vir va ber bi van welatan va reviyane yan jî her komek ji bo welatên curbecur hatine sirgûnkirin. Di wan deman da Kurd li çend komarên Yekîtiya Sovyetê hene: Li Ermenistan, Azerbaycan, Gurcistan û Tirkmenistanê. Wê demê Kurd bi hejmara xwe ya herî mezin li Azerbaycanê hene, lewra ew ji demên berê da li wir bûn. Dema pergala Sovyetê tê Azerbaycanê Kurdên li wir bi sedemên curbecur beriya pergala teze heliyane û asîmîle bûne. Tenê li çend navçeyên Azerbaycanê Kurd hene û ji wan jî di salên 1919-1920an da otonomiyeke çandî ya bi navê “Kurdistana Sor” hatiye avakirin. Ev otonomî di warê perwerde û zimanê Kurdî da xebatên baş dike, lê piştî ji ber siyaseta serokatiya Azerbaycanê ya asîmîlekirina Kurdan ev kar nameşin û otonomiya çandî ya Kurdan di destpêka salên 1930î da ji holê tê rakirin.⁶³ Bi jiholêrakirina “Kurdistana Sor” ya bi emrê Lenîn ava dibe û bi emrê Stalîn hildiweşe hemû mafên Kurdan yên neteweyî ji holê radibin.⁶⁴

Li Yekîtiya Sovyetan piştî Şoreşa Cotmehê ya di sala 1917an da Kurdên li wê derê dimînin dikarin ji hin mafên ziman û çandî îstifade bikin û li herêmên Kurd lê hene şert û mercên pêşvaçûna çand û edebiyata Kurdan çêdibe. Hikûmeta Sovyetê wek polîtîka dixwaze li welatê Sovyetê asta xwendin û nivîsandinê bilind bike. Loma jî di vî warî da hewl dide neteweyên din jî di warê xwendin û nivîsandinê da pêşva herin. Ji sala 1920an heta salên 1990î di warê çand û edebiyata Kurdan da kar û xebatên mezin tên kirin. Di vê demê da nivîskar û zanyarên mezin derdikevin û di warê edebiyat, zimanzanî, dîrok, perwerde û hwd. da dixebitin. Ev heyam ji bo çand û edebiyata Kurdan jî navendek çêdike. Lewra piştî welatê Sovyetê hildiweşe derbeyeke mezin li vê navendê dikeve û nivîskar û rewşenbîr ji hev belav dibin û êdî piştgiriya dewletê ji bo xebatên wiha namîne. Helbet ev îmkan û derfet ji bona propagandaya şoreşê tên dayîn û

⁶³ Têmûrê Xelîl, *Antologiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*, Îzmir: Weşanên Na, 2014, r. 15-16.

⁶⁴ Zeynelabidîn Zinar, “Kurdistana Sor”, *Nûbihar*, j. 126, (2014), r. 68-69.

Kurd jî ji vê îstifade dikin. Armanca nivîskar û zanyarên vê heyamê ew e li nirxên xwe yên neteweyî xwedî derkevin û nehêlin ziman, folklor û hemû nirxên wan yên neteweyî bên jibîrkirin. Bi taybetî di dema Sovyetê da Kurdên êzdî bêtir li ser netewe û nav û koka xwe dixebitin.⁶⁵

Hikûmeta Sovyetê di demeke kurt da di warê perwerdekirin û pêşxistina gel û neteweyên li vî welatî da karên mezin dike. Heta li gund û ciyên dûr û biçûk jî dibistan tên vekirin. Hikûmeta Bolşevîkan zehf girîngiyê dide xwendin, çand û pêşxistina gelên paşdamayî, lê kêmasiya kadroyan pirsgirêka sereke ye di vê heyamê da. Mamoste tên perwerdekirin û pirtûkên dersê tên hazirkirin. Li tevahiya welêt bi zimanê serdest û her neteweyî perwerde dest pê dike. Di dema Sovyetê da Kurd herî zêde li deverên wek Ermenistan, Gurcistan, Azerbaycan û her wisa jî li Asyaya Navîn û li Tirkmenistanê hene. Di dema desthilatdariya Sovyetê da ji bo hemû gelan hin heq û maf tên dayîn. Helbet desthilatdariya wê demê dixwest hemû dinya çav bide vê pergala nû û xwe bi sosyalîzmê va bigire. Bingeşa siyaseta dewletê helkirina pîrsa miletiyê bû û ev jî feydeyeke mezin da gelên wê demê. Xebatên desthilatdariya Sovyetê yên di vî warî da teqrîben di salên 1920î da dest pê dikin. Di warê çand û edebiyatê da karên herî girîng li Ermensitanê tên kirin û Ermenistan dibe navenda pêşvaçûna çand û edebiyata Kurdan. Di nav Komarên Sovyetê da tenê di nav Kurdên li Ermenistanê da siyaseta nû û meseleya miletiyê bi ser dikeve û ber û berhemên baş dide. Lewra piraniya Kurdên li Ermenistanê ji gund û navçeyên Kurdistana Tirkîyeyê hatibûn û bi Kurd û Kurdayetiyê ra eleqedar bûn. Loma jî li ber pêlên asîmîlasyonê li ber xwe didin. Wek mayîn li Ermenistanê gundên Kurdan zehf bûn û ev gund dibin bingeh û parastina ziman û çanda Kurdan.⁶⁶

Bi biryara Hikûmeta Ermenistanê di 23yê Adara 1921an da dibistana dereceya ewil û duduyan ya xwendin û nivîsandinê tê vekirin. Hikûmet dixwaze bi zimanê dayîkê perwerde were dayîn. Di dibistanên Kurdan da ji bo bi zimanê dayîkê ders were dayîn di sala 1921an meha cotmehê da kitêba dersê ya bi navê *Şems* bi Kurdî, lê bi herfên Ermenîkî tê hazirkirin û weşandin. Nivîskarê vê kitêbê Lazoyê (Hakob Xazaryan) Ermenî ye û Ahmedê Mirazî alîkariya wî dike. Bi vê kitêbê zarokên Kurd xwendin û

⁶⁵ Xelîl, **h.b.**, r. 16.

⁶⁶ Xelîl, **h.b.**, r. 17-18.

nivîsandinê fêr dibin. Heta sala 1929an him di dibistanên Kurdan da û him jî di nav Kurdên li Tîblîsê da zarokên Kurdan bi vê kitêbê fêrî xwendin û nivîsandinê dibin.⁶⁷

Di salên 1918 û 1920î da Kurd zirareke mezin dibînin û sêwîxaneyên Ermenistanê û kuçeyên Gurcistanê bi zarokên êzdiyan tije dibin. Di sala 1922yan da bi serkêşiya Ahmedê Mirazî, Lazo û hin kesên din ji bo zarokan li Tîblîsê dibistana zarokan tê vekirin. Di vê dibistanê da zarok him fêrî kar dibin û him jî xwendin û nivîsandinê fêr dibin. Xwendekarên vê dibistanê peyra dibin zanyarên Kurd yê bi nav û deng. Wek mînak Qanatê Kurdo, Çerkez Bakayêv, nivîskar û berpirsiyarê ewil yê rojnameya *Riya Teze* Cerdoyê Gêncî, Semend Siyabendov û gelekên din.⁶⁸

Di sala 1926an da ji kurteçîroka Lazo û bi lîstikvaniya kesên Ermenî filma ni navê *Zerê* ya li ser Kurdan tê kişandin. Di sala 1929an da Erebe Şemo û Îsahaq Marogulovê bi eslê xwe Aşûrî ye bi alîkariya Hikûmeta Ermenistanê elfabeya Kurdî ya ewil ya bi Latinî amade dikin. Di heman salê da kitêba Erebe Şemo û Îsahaq Marogulov bi navê *Xo Xo Hînbûna Xandina Nivîsara Kurmancî* çap dibe. Ev kitêba Kurdî ya pêşîn e bi tîpên Latinî çap dibe.⁶⁹ Peyra pirtûkên dersê, edebiyatê, werger û rojnameya *Riya Teze* derdikeve. Hejmara ewil ya rojnameya *Riya Teze* di 25ê Adara 1930yan da li Erîvanê bi elfabeya Latinî ya Îsahaq Marogulov û Erebe Şemo amade kirin tê weşandin.⁷⁰ Beşa nivîskarên Kurd li rex Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê vedibe. Di radyoya Erîvanê da weşana bi Kurdî dest pê dibe û weşana radyoyê ya ewil di sala 1924an da ye.⁷¹

Kadroyên ewil kesên sêwî ne yê dikevin ber bûyerên salên 1918 û 1920î. Piraniya wan zimanê dayîkê ji bîr dikin û bi Ermenîkî diaxivin. Zanyarê Kurd Heciyê Cindî bi bîr tîne tevî hogirê xwe Emînê Evdal piştî sêwîxaneyê diçin gundê Kurdan yê bi navê Qundesaz û Elegezê ji bona zimanê dayîkê fêr bibin.⁷² Di wan salan da komek xwendevanên Kurd dişînin Lenîngradê ji bo xwendina bilind. Di nav van kesan da Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Qanatê Kurdo, Cerdoyê Gêncî, Wezîrê Nadîrî, Casimê

⁶⁷ Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê*, İstanbul: Weşanên Deng, 2012, r. 12.

⁶⁸ Dr. Eskerê Boyîk, *Nûra Elegezê Çend dîdem ji edebyeta Kurdên Ermenistanê*, Oldenburg: Dengê Êzîdiyan, 2004, r. 11-12.

⁶⁹ Boyîk, *Çanda Kurdên Sovêtê*, r. 13.

⁷⁰ Eskerê Boyîk, "Rojnameya Riya Teze", *Nûbihar*, j. 126, (2014), r. 10.

⁷¹ Nîhat Gultekîn, "Qonaxa Rewşenbîriya Zimanê Kurdî: Radyoya Yêrîvanê", *Nûbihar*, j. 126, (2014), r. 27.

⁷² Goran Candan, "Heciyê Cindî: Jiyan û Kar", *Nûbihar*, j. 126, (2014), r. 59.

Celîl û Etarê Şero heye û ew jî xwe digihînin û didin kêleka Erebe Şemo û Ahmedê Mirazî.⁷³

Di vê heyamê da ji bona weşandina pirtûkên Kurdî di Weşanxaneyê Dewletê ya Ermenistanê da beşa Kurdî tê vekirin. Di sala 1932yan da berevoka afirandinên nivîskarên Kurd ya ewil bi navê *Efirandinên Ewil* bi amadekariya Emînê Evdal çap dibe. Di vê berevokê da bi helbest û kurteçîrokên xwe Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Etarê Şero û yê din cî digirin. Berevoka afirandinên nivîskarên Kurd ya duyem *Efirandinên Duda* jî di sala 1934an da bi amadekariya Heciyê Cindî neşir dibe û tê da berhemên Cerdoyê Gêncê, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî û Erebe Şero hene. Ya sêyem jî di sala 1935an da bi navê *Efirandina Sisiya* bi amadekariya Heciyê Cindî çap dibe û tê da berhemên Erebe Şero, Emînê Evdal, Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncê, Wezîre Nadirî, Etarê Şero, Casimê Celîl û Ahmedê Mirazî hene.⁷⁴ Di sala 1932yan da Heciyê Cindî şanoya xwe ya bi navê *Qutiya Dû Dermana* çap dike. Di sala 1935an da Ahmedê Mirazî şanoya bi navê *Zemanê Çûyî*, Wezîre Nadirî şanoya bi navê *Reva Jinê*, Erebe Şero romana *Şivanê Kurmanca*, Etarê Şero berevoka helbesta ya bi navê *Biriqandina Ewilîn*, Wezîre Nadirî berevoka helbesta ya bi navê *Nûbar* derdixe. Di sala 1936an da romana Erebe Şero *Kurmancêd Elegezê û Folklorê Kurmanca* ya Heciyê Cindî û Emînê Evdal çap dibe. Ji xeynî van *Xebernameya Ermenîkî û Kurmancî* bi amadekirina V. Pêtoyan, Emînê Evdal, Heciyê Cindî û Cerdoyê Gêncê derdikevin.⁷⁵

Di nav Kurdên Sovyetê da bi Emînê Evdal û Heciyê Cindî xebatên berhevkirina zargotina Kurdî dest pê kiriye û bi demerê ra jî bi Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Nûra Cewerî û Cemîla Celîlê berfireh bûye.⁷⁶ Di nav vê civaka Kurdan da Qanatê Kurdo yek ji wan kesan e di warê zimanzaniyê da derdikeve pêş. Prof. Dr. Qanadê Kurdo li ser zimanzanî û ferhengsaziyê gelek berhem amade kirine. Yekemîn pirtûka wî *Gramatîka Zimanê Kurdî ya Kurt* e di sala 1936an da hatiye weşandin. Peyra pirtûkên wî yê bi navê *Rêzimana Zimanê Kurdî* (1957), *Ferhenga Kurdî-Rûsî* (1960), *Rêzimana Zimanê Kurdî Ser Bingehên Zaravayên Kurmancî û Soranî* (1978), *Ferhenga Rûsî-Soranî* (1983) û *Tarîxa Edebiyata Kurdî* (1983) tîne weşandin.⁷⁷ Di vê heyamê da li ser

⁷³ Boyîk, *Nûra Elegezê*, r. 14.

⁷⁴ Xelîl, *h.b.*, r. 19.

⁷⁵ Boyîk, *Çanda Kurdên Sovyetê*, r. 14-15.

⁷⁶ Mehmet Gultekîn, "Kurdên Qafqasya Başûr -Dîrok û Zargotin", *Nûbihar*, j. 126, (2014), r. 26.

⁷⁷ Kawa Nemir, "Qanatê Kurdo: Yek Ji Baskên Çanda Me", *Nûbihar*, j. 126, (2014), r. 56.

pirsgirêkên ziman û edebiyata Kurdî konferans tên çêkirin. Konferansa Kurdzaniyê ya Temamiya Yekîtiya Sovyetê di sala 1934an da li Erîvanê tê kirin. Di vê konferansê da ji xeynî zimanzan û edebiyatnasên Kurd kesên biyanî jî cî digirin. Di konferansê da kesên wekî Heciyê Cindî, Erebe Şemo, Emînê Evdal û Qanatê Kurdo û ji biyaniyan jî G.Sêvak, A.Xaçatiriyar, Î.Sûkêrman û V.Pêtoyar cî digirin.⁷⁸

Di sala 1937an da li tevahiya Sovyetê heyama Stalîn dest pê dike. Di vê heyamê da kar û barên li ser Kurdan disekin. Gelek rewşenbîrên Kurd tên girtin û sirgûnkirin. Erebe Şemo jî sirgûnî Sibîryayê dikan. Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncî û Ahmedê Mirazî tên girtin û di mekteban da zimanê Kurdî tê rakirin. Elfabeya Latinî tê rakirin. Bi biryara Stalîn di ciyê elfabeya Latinî da elfabeya Kirîlî tê bicîkirin. Di sala 1941an da Hikûmeta Ermenistanê elfabeya Kurdî diguherîne ser Kirîlî û Heciyê Cindî vî karî dike. Bi Kirîlî ji bo dibistanên Kurdan kitêb amade dike û di sala 1946an da tê çapkirin û ev elfabe heta sala 1990î tê emilandin.⁷⁹

Di sala 1937an da li gundê Elegezê Tiyatroya Kurdan ya Dewletê tê vekirin. Kar û barên şanoyê dewlet finanse dike û cara ewil keç û xortên Kurd lîstikvaniyê dikan. Nivîskar û şanonivîsên Ermenî di wê heyamê da gelek şano li ser bingeha jiyana Kurdan dinivîsin. *Mem û Zîn* (S. Taronsî), *Ker û Kulik*, *Keça Mîrekê*, *Xecê û Siyabend*, *Gur Heso* (S. Gênosyan) û yê din. Lê di sala 1947an da tiyatro tê girtin. Di nav 10 salan da 30 şano tên lîstin û jê tenê 4 şano yê nivîskarên Kurd in. Ev jî *Lûr De Lûr* ya serokê tiyatroya ewil Celatê Koto, *Miraz* ya Heciyê Cindî û *Xuşka Doxdiryê û Bira* ya Cerdoyê Gêncî ne. Gelek lîstikvanên şanoyê peyra dikevin nav xebatên çandî û edebî. Lîstikvan Mîroyê Esed piştî karen siyasî demeke dirêj dibe berpirsiyarê rojnameya *Riya Teze*.⁸⁰

Piştî mirina Stalîn Kurdên Sovyetê dewa heqê xwe dikan. Di nivê sala 1950î da rojnameya *Riya Teze* cardin derdikeve û radyoya Erîvanê dest bi weşanê dike. Di beşa Akademiya Zanyariyê ya Ermenistanê û Enstîtuya Rojhilataniyê da beşa Kurdzaniyê vedibe. Piştî Erebe Şemo ji sirgûnê vedigere kar û barên çand û edebiyatê geş dibin. Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî û Casimê Celîl karên xwe didomînin û yê wekî Qaçaxê Mirad, Ûsivê Beko, Eliyê Evdilrehman, Mîroyê Esed, Nado Maxdûrov û

⁷⁸ Wezîrê Eşo, “Konferansa Kurdzaniyê ya Yekemîn Li Yêrîvanê”, *Nûbihar*, j. 126, (2014), r. 6-7.

⁷⁹ Boyîk, *Çanda Kurdên Sovyetê*, r. 14-15.

⁸⁰ Boyîk, *h.b.*, r. 16-17.

Xelîl Mûradov digihîjin wan û xebatên xwe dikin. Di sala 1958an da *Berbang*, di sala 1959an da *Jiyana Bextewar* û di sala 1965an da *Dimdim* ya Erebe Şemo li Erîvanê çap dibe. Di sala 1969an da romanên Erebe Şemo *Berbang*, *Jiyana Bextewar* û *Hopo* di beravokekê da tîn weşandin. Heciyê Cindî ji bilî xebatên zargotin, zimanzanî, helbest, çîrok û wergerê romaneke bi navê *Hewarî* (1967) dinivîsîne. Helbestvan Casimê Celîl xwediyê gelek beravokên helbestê û destanan e. Di salên cuda cuda da beravokên wî yên bi navê *Elegez* (1954), *Beyt-Serkatiyên Kurdan yên Evînî* (1955), *Kaniya Dê* (1957), *Ocaxa Min* (1966), *Kilamên Çiya* (1970), *Oda Kurdan* (1975) û *Kurdê Bengî* (1980) çap dibin. Destana Ahmed Mîrazî ya bi navê *Bîranîn* jî di vê heyamê da gelek girîng e.⁸¹

Di vê heyamê da Qaçaxê Mirad û Êsivê Beko bi berevokên xwe yên helbestê û Eliyê Evdilrehman, Nado Maxmûdov, Mîroyê Esed û Xelîl Muradov di warê nivîsa vekirî û romanê da derdikevin pêş. Di salên 1960î da di warê helbestê da pêşketinên mezin çêdibin û Şikoyê Hesen, Fêrikê Êsiv, Mîkayêlê Reşît, Sihîdê Îbo, Simoyê Şemo, Karlênê Çaçanî, Egîte Şemsî, Rizaliyê Reşît, Ordîxanê Celîl û Bariyê Bala hene. Di warê nivîsara vekirî da jî Wezîrê Eşo, Emerîkê Serdar, Egîte Xudo, Ahmedê Hepo, Sîma Semend û Ahmedê Gogê hene. Sala 1961an berevokên helbestan ya Şikoyê Hesen *Qalçîçek* û ya Fêrikê Êsiv *Çevkanî* neşir dibin. Wek mayîn kitêbên Şikoyê Hesen yên bi navê *Tembûra Kurda* (1965) û *Meremê Dilê Kurd* (1970) derdikevin. Fêrikê Êsiv mîrateke pir mezin û zengîn li pey xwe dihêle û ev berevokên wî yên helbestan hatine weşandin: *Gula Elegezê* (1954), *Lîrika* (1967), *Êsivê Nebya* (1973), *Narê* (1977), *Hisretdefter* (1984) û *Dinya Delal* (1987). Helbestvanên wek Simoyê Şemo, Sihîdê Îbo, Karlênê Çaçanî, Rizaliyê Reşît, Egîte Şemsî, Tosinê Reşît, Çerkezê Reş û Elîxanê Memê bi xwe ra ronahiyeke geş didin vê edebiyatê. Di warê nivîsara vekirî da karên mezin tîn kirin û Wezîrê Eşo, Emerîkê Serdar, Sîma Semend, Egîte Xudo, Babayê Keleş derdikevin pêş û bi Ahmedê Gogê, Temûrê Xelîl, Hesenê Qeşeng, Mirazê Evdo û Baryê Mehmûd rojnamegeriya Kurdan jî digihêje astekê. Li Sovyeta berê di nav kesên li ser Kurdan xebitîne yên bi eslê xwe Kurd nînin jî hene. Wek mînak Sêda (Margarîta), Rûdenko, Jêniya Vasîlyêva, Jaka Mûsayêliyan, Îshak Sikerman, Olêvîlcêvîskî, Xalfîn, Lazerûyev, Hasretiyân, Sakolov, G. Akopov, Al. Mêntêşaşvîlî, Yû. Avaliyânî, Îr. Smîrnova û yên din.⁸²

⁸¹ Boyîk, **h.b.**, r. 18-19.

⁸² Wezîrê Eşo, "Ronesansa Çanda Kurdî Li Sovyeta Berê", **Nûdem**, j. 32, (1999), r. 51.

Pêvajoya pêşdaçûyîna çand û edebiyata Kurdî ya li Ermenistanê heta salên 1990î berdewam dike. Bi hilweşîna pergala Sovyetê çand û edebiyata Kurdan ya li vir jî lawaz dibe. Edebiyata Kurdên Sovyetê bi cure, naverok û temamiya xwe edebiyateke taybet ya Kurdan e.⁸³ Helbet ev edebiyat wek edebiyateke taybet ya Kurdan li qadeke berê tu tiştek tune ye şîn dibe û xwerû û nû ye.⁸⁴

1.2. JIYANA EREBÊ ŞEMO

Erebê Şemo (Ereb Şamîlov) di sala 1897an da li gundê Sûsîzê ya li ser bajarê Qersê hatiye dinyayê.⁸⁵ Wê demê Qers di bin desthilatdariya Împeratoriya Rûsan da ye û li Sûsîzê Kurdên êzdî dijîn. Erebe Şemo di malbateke feqîr û xizan da çêdibe. Şemoyê bavê Erebe ji êla Hesenan e û rêberî, şivantî û gavaniyê dike. Erebe lawê sêyemîn ye Şemo ye. Erebe di zarokatiya xwe da zor û zehmetiyê dibîne û wekî bavê xwe dixebite, dibe berxvan û golikvan û dûajoyê bavê xwe.⁸⁶

Erebê Şemo gava hinekî mezin dibe di dibistaneke qezaya Qersê ya bi zimanê Rûsî da dest bi kar dike û wek dergevan dixebite. Mamosteya dibistanê zên û zîrekiya wî ferq dike û xwendin û nivîsandinê hînî Erebe dike. Erebe Şemo di Şerê Yekemîn ye Cîhanê da dibistana xwe tamam dike û li Qersê di alaya Qazaxan ya artêşa Rûsan da dibe tercumanê Rûsî û Tirkî.⁸⁷ Di salên 1914-1916an da di artêşa Rûsan da tercumaniyê dike, dixwîne, însanên nû nas dike û fikren teze fêr dibe. Di sala 1916an da Erebe Şemo diçe Sarîqamîşê û di çêkirina rêya hesin da wek pale dixebite û li wir Bolşevîkan nas dike û tevlî karên wan yê siyasî dibe. Ji ber xebatên siyasî demekê dikeve girtîgehê û zêde di girtîgehê da namîne, tê berdan. Piştî ji girtîgehê derdikeve diçe Sûsîzê û demeke kurt li wir dimîne. Peyra derbasî Rûsyayê dibe û diçe bajarê Stavropolê. Di wê heyamê da li Rûsyayê Şoreşa Cotmehê pêk tê û Partiya Komunîst desthilatdariyê dike destê xwe. Erebe Şemo jî dikeve nava artêşa Sovyetê ya nûavakirî ya jê ra dibêjin Artêşa Sor. Digel artêşê tevlî şerê di navbera Bolşevîkan û leşkerên Çar da derdikeve, dibe. Di vî şerî da du caran birîndar dibe û bi tîfoyê dikeve û li nexweşxaneyê tê dermankirin. Di sala 1918an da ew êdî endamekî Partiya Komunîst ya Rûsyayê ye. Şemo difikire bêyî

⁸³ Boyîk, **h.b.**, r. 19-20-21.

⁸⁴ Cihan Roj, "Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr", **W**, j. 15, (2007), r. 39.

⁸⁵ Rohat, "Hîmdarê Nivîsandina Romanên Kurdî Erebe Şamîlov", **Roja Nû**, j. 49, (1984), r. 16.

⁸⁶ Boyîk, **Nûra Elegezê**, r. 23.

⁸⁷ Xelîl, **h.b.**, r. 93.

xwendina bingehîn ew nikare bi kêrî gel û partiyê bê û bîr û baweriyên xwe bibe serî.⁸⁸ Bi vê armancê Erebe Şemo di sala 1920an da diçe Moskovayê û di Zanîngeha Lazaryan da çar salan dixwîne. Di sala 1924an da vedigere Ermenistanê. Li Ermenistanê jî desthilatdariya Sovyetê li ser kar e. Ew jî di Navenda Partiya Komunîst ya Ermenistanê da wezîfe werdigire.⁸⁹

Hikûmeta Ermenistanê ji bo pêşxistin û hînkirina zimanê Kurdî piştgiriyê dida. Hikûmetê dixwest Kurdan ji şûndemayîna aborî û çandî rizgar bike û ji her aliyan va alikariya wan bike. Di wê demê da piraniya Kurdên Ermenistanê di jiyana koçeriyê da bûn. Di nav wan da kesên xwenda pir kêr bûn. Çand û edetên kevin rê li ber pêşketinê digirtin. Di vî warî da Ermenan pir alikariya Kurdan dikirin. Ew mamosteyên Ermenyên piraniya wan Kurdî dizanîn diçûn gundên Kurdan û xwendin û nivîsandinê hîn wan dikirin. Ji bo pêşketina gel kadroyên xwenda perwerde dikirin.⁹⁰ Erebe Şemo jî dikeve nav vê xebata girîng. Di nav gelê xwe da karê perwerdeyê dike. Li gundan dibistan û pirtûkxaneyan dide avakirin. Pirsgirêkên wan digihîne hikûmetê. Li dijî edetên bêkêr û li peymayên hikûmdariya berê yê feodal têdikoşe. Derheqê jiyana Kurdan da di rojname û kovarên komarê da maqaleyan dinivîse. Erebe Şemo bi xêra xwendina bi Rûsî û têkiliyên xwe yê bi Partiya Komunîst ra hewl dide ciwanên Kurd li Rûsyayê perwerdeya bilind bibînin. Bi însiyatîfa wî di sala 1928an da komeke xortên Kurd ji Gurcistan û Ermenistanê dişînin Lenîngradê ji bona xwendinê. Şemo bi gelek rewşenbîr, siyasetmedar û nivîskarên hevçaxê xwe ra hevdîtin pêk tîne. Bo nimûne bi Lenîn ra hevdîtinek pêk tîne û li ser rewşa Kurdan bi wî ra dipeyive.⁹¹ Erebe Şemo bi Maksîm Gorkî ra jî dema Gorkî tê Ermenistanê hevdîtin pêk tîne û Gorkî di destê wî da destnivîsa romana *Şivanê Kurmarca* dibîne û lê dinêre. Dûvra jî wiha dibêje: “Gelê Kurd bi zimanê nivîskarê xwe, Erebe Şamîlov qise dike.”⁹²

Di sala 1937an da Yekîtiya Sovyetan dikeve bin rêveberiya Stalîn. Kurdên Sovyetê jî ji vê yekê zirareke mezin dibînin. Gelek rewşenbîrên Kurd sirgûnî Sibîryayê tên kirin. Yek ji van rewşenbîran Erebe Şemo ye. Ew di sala 1937an da bi emrê Stalîn

⁸⁸ Eskerê Boyîk, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî Yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, **W**, j. 15, (Tîrmeh-Gelawêj 2007), r. 19.

⁸⁹ Ebubekir Gören, “*Di Romanên Erebe Şemo De Folklorê Kurdî*”, (Teza Mastîrê ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê), 2013, r. 20.

⁹⁰ Boyîk, **h.g.**, r. 19.

⁹¹ Boyîk, **h.g.**, r. 34.

⁹² Boyîk, **h.g.**, r. 19.

sirgûnî Sibîryayê tê kirin. Bi vî awayî di jiyana wî da serdemeke nû ya pir dijwar dest pê dike. Lê Erebe Şemo xwedî serpêhatiyên zehmet bû. Wî li wir li ber xwe da û nemir. Ev serdem dişibiya demên zarokatî û ciwantiya wî. Ji aliyê din va Şemo bi tu awayî nedixwest zimanê xwe ji bîr bike. Bi vê armancê jî di hucreya xwe da ji bo xwe çîrokên Kurdî digotin.⁹³

Di sala 1956an de Stalîn dimire. Piştî nozdeh salên zindanî û sirgûniyê Şemo ji girtîgehê tê berdan. Erebe Şemo ji aliyê Rûsyayê va hêjayî xelatên “Alaya Sor” û “Dostiya Gelan” hatiye dîtin. Di Akademiya Kurdan ya Zanyarî ya Bexdayê da weke endam hatiye qebûl kirin.⁹⁴

Li gor agahiyan Erebe Şemo du caran dizewice. Jina wî ya ewil yeka Alman e û jê bi navê Meyanê⁹⁵ keçek heye. Erebe Şemo dema ji bona Sibîryayê tê sirgûn kirin li vir bi jina xwe ya duyem Mariya Vasîlevnaya Rûs ra dizewice û jê bi navê Asê û Zînê du keç hene.⁹⁶

Erebe Şemo di sala 1978an da di 81 saliya xwe da diçe ser dilovaniya xwe. Ew bi merasimeke mezin li Goristana Êrîvanê li cihê mirovên bi nav û deng yê komarê tîn vaşartin hatiye defînkirin. Li navenda Êrîvanê li ser dîwarê xaniyekê jî dinivîse Rewşenbîrê Kurd Erebe Şemo Şamîlov li vê malê ji sala 1963yan heya sala 1978an jiyaye.⁹⁷

1.3. NÊRÎNA EDEBÎ YA EREBÊ ŞEMO

Di dema jidayîkbûna Erebe Şemo da amadekarî û têkoşîna ji bona Şoreşa Cotmehê dewam dikirin. Civaka Rûs di nav gengeşiyê mezin da bû. Erebe Şemo di vê serdemê da mezin bûye. Civaka wî dîtiye, civaka ew di nav da mezin bûye jî civakeke wisa bû gel di bin zilm û zora beg, axa û şêxan da bû. Ji bo kesên xizan jiyan gelekî zehmet bû. Desthilatdaran bi rêyên cuda cuda keda wan dixwarin. Ew bi xwe di nav kêf û xweşiyê da dijiyan, lê kesên gundî û xizan di nav feqîrî, birçîtî û tazîtiyê da bûn. Şemo di nav civakeke wisa da mezin bû. Wî zehmetî û neheqiyên di nav civakê da

⁹³ Boyîk, **h.g.**, r. 20.

⁹⁴ Xelîlê Çaçan, “Miletêk Di Heyra Wî De Bû”, **W**, j. 15, (Tîrmeh-Gelawêj 2007), r. 27.

⁹⁵ Wezîrê Eşo, “Çend Rûpel Ji Jiyana Erebe Şamîlov”, **Çira**, j. 2, (1996), r. 21.

⁹⁶ Eşo, **h.g.**, r. 14.

⁹⁷ Enîse Şîrîn; Azad Zal, “Dosye: Erebe Şemo”, **W**, j. 15, (Tîrmeh-Gelawêj 2007), r. 16.

him dîtîn û him jî ev zehmetî û bêmafi li wî bi xwe jî hatin kirin. Di romanên wî da bandora van serpêhatîyan baş tê xuyakirin.⁹⁸

Erebê Şemo di nava derd û kulan da jiyaye. Ji ber hindê gelek rind gelş û sergêjîyên civata Kurd jî zanibûye. Wî hinek tiştên bi çavên xwe dîtine û bi guhên xwe bihîstine, daxistiye û kiriye malê dîrokê.⁹⁹ Şemo ji ber tercumaniya xwe, komunîstiya xwe û zindanbûna xwe welatên curbecur dîtine û di romanên xwe da cî daye wan welatan. Qada bûye mijara romanên Erebe Şemo bi giranî herêma Serhedê ye. Bûyer piranî li wê herêmê diqewimin. Paşê ev qad fireh dibe, digihîje heya Moskovayê, Ukrayna û Belarûsê. Mirov dikare bibêje ev qad ji Sîpanê Xelatê heya Sibîryayê ye. Piraniya Kurdên Kafkasyayê li Ermenistan û Gurcistanê nîştêcih in. Erebe Şemo jî bi piranî jiyana Kurdên li Ermenistanê dijîn ji xwe ra kiriye mijar.¹⁰⁰ Her çiqas di romanên wî da gelên din jî cî bigirin, lehengên sereke û piraniya lehengan Kurd in; her wiha mijarên romanên ji jiyana û dîroka Kurdan tîndar sitandin. Em di berhemên nivîskar da rastî berxwedana etnîkî tîndar, çanda neteweyî ya gelê Kurd, bi awayekî xurt mora xwe li zîhnîyeta berhemên wî daye.¹⁰¹

Şemo bi naveroka romanên xwe û bi Kurdî nivîsandina wan, romanên xwe kirine nîrxên neteweyî. Wexta mirov li romanên wî dinihêre, mirov vê taybetiyê bi awayekî eşkere dibîne. Erebe Şemo bi hûrgilî li ser jiyana civakî disekine. Ji rabûn û rûniştinê bigire heya şîn û şahîyan qala her tiştî kiriye. Roj û adetên girîng yek bi yek di berhemên xwe da tomar kirine. Mirov dibêje qey nexwestiye ev nîrxên bîrdar kirin.¹⁰²

Erebê Şemo di ciwaniya xwe da dema di çêkirina rêya hesinî ya Erziromê da dişixule, rastî kesên komunîst tîndar û fikrên wan yênd civakî û siyasî hîn dibe. Ev îdeolojî li Şemo baş tê û ew jî wan fikran qebûl dike. Şemo bi vî awayî dibe yek ji endamên Partiya Komunîst. Ev biryar li ser nivîskariya wî jî bandorên mezin dike. Şemo di berhemên xwe da rêyeke sosyalîst û realîst digire û vê yekê wiha vedibêje: “Rêbaza min ya edebî realîzma sosyalîst¹⁰³ e. Lê çima? Ji ber ez bi xwe riyalîst û sosyalîst im. Di

⁹⁸ Gören, **h.b.**, r. 23.

⁹⁹ Zeynel Abidin Zinar, “Nivîskarê Kurd, Kedkar û Sûxrewanê Wêjeya Kurdî Erebe Şemo”, **W**, j. 15, (Tîrmeh-Gelawêj 2007), r. 35.

¹⁰⁰ Serwer Denîz, “Her Ew Hesret û Ew Xwezî”, **W**, j. 15, (Tîrmeh-Gelawêj 2007), r. 45.

¹⁰¹ Ayhan Meretowar, “Kesayetiya Edebî ya Erebe Şemo”, **W**, j. 15, (Tîrmeh-Gelawêj 2007), r. 42.

¹⁰² Denîz, **h.g.**, r. 46.

¹⁰³ Li Yekîtiya Sovyetan piştî şoreşê Partiya Komunîst demekê di warê hunerê da fikrekê ferz nekiriye. Lê di heyama Stalin da Partiya Komunîst dixwaze nêrîne hunerî hilde bin destê xwe û bi serkêşîya Jdanovê

nêrîna min da ev rêbaz dikare hemû aliyên jiyanê ronî bike.”¹⁰⁴ Wekî tê zanîn di salên 1930yan da li Sovyetê realîzma sosyalîst wekî nêrîneke sereke di qada edebiyatê da derdikeve pêş. Li gorî realîzma sosyalîst huner nîşandan e, lê rastiya huner nîşan dide rastiya civakî ye. Lê ev rastî di nav pêşvaçûna şoreşgerî da tê dîtin. Tê da şênberiyêke dîrokî heye û divê perwerdeya çîna karkeran neyê piştguhkirin.¹⁰⁵ Dema meriv bala xwe dide naveroka berhemên û taybetiyên lehengên wî rêçikên realîzma sosyalîst dixuyên. Bi gotineke din berhemên wî nêzî vê nêrînê ne digotin divê edebiyat “hizirkirina nivîskar”, “partînost (rihê partiyê)”, “narodnost (nêzî gel) û “pêşvaçûna hunerî” derxe pêş.¹⁰⁶ Yanê romanên wî armanc dikin perwerdekirina civakê pêk bînin û propagandaya polîtîk û îdeolojîk ya sosyalîzmê bikin. Dema meriv bala xwe dide vebêjerên romanên wî meriv dibîne vebêjer wekî mamosteyan li hember xwendevanên xwe tev digerin.¹⁰⁷ Bandora vê rêbazê di hemû berhemên wî da xuya dibe. Şemo di hemû berhemên xwe da bi awayekî pesnê sosyalîzmê dide. Jixwe di wê serdemê da tenê berhemên pesnê sosyalîzmê didan dihatin çapkirin. Loma jî ev yek ji bo Şemo xaleke bivênevê bû. Lê Şemo ji dil ev yek kiriye; loma di gotina wî ya li jor da jî tê dîtin ew realîst û sosyalîst e. Şemo di qada jiyana siyasî de jî aktîvîstekî çalak e. Weke her nivîskarî Erebe Şemo jî şahidê dema xwe ye. Gava mirov berhemên wî dixwîne, mirov gelek bûyerên wê demê tê da dibîne. Ew ji gelek hêlan va li ser rewşa civakî ya wê demê sekiniye û rewşa serdemê ragihandiye xwendevanan. Tenê rewş tespît nekiriye, her wiha sedemên pirsgerêkan jî gotiye û riya çareseriyê jî nîşan daye. Em ji jiyana û berhemên wî dizanin ji bo çareserkirina pirsgerêkan xebitiye. Lê di hêlekê tenê da na di gelek hêlan da. Ji polîtîkayê bigire heya perwerdehiyê, ji weşangeriyê bigire heya nivîskariyê, her tim weke serkêşek xebitiye.¹⁰⁸ Şemo di vê pêvajoyê da ne bêalî ye û çepera wî ya siyasî

merivê Stalin realîzma sosyalîst derdikeve. Ev nêrîn di sala 1930yan da derdikeve û rêgezên wê yên sereke di Kongreya Yekemîn ya Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê da sala 1934an tîn eşkerekirin. Di kongreyê da Jdanov, M.Gorkî, N.I.Buharîn û Karl Radek serkêşiyê dikin û gelek zanyar û nivîskar cî digirin. (Bnr. Berna Moran, **Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi**, İstanbul: Cem Yayınevi, 1988, r. 45-46.)

¹⁰⁴ Bavê Nazê, “Hevpeyvîna Bi Erebe Şemo Re Ya Berî 25 Salan”, **W**, j. 15, (Tîrmeh-Gelawêj 2007), r. 32.

¹⁰⁵ Moran, **h.b.**, r. 46.

¹⁰⁶ Ahmedzade, **h.b.**, r. 18.

¹⁰⁷ Îbrahîm Seydo Aydoğan, **Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî**, Stenbol: Weşanên Rûpel, 2014, r. 111.

¹⁰⁸ Denîz, **h.g.**, r. 43.

gelek diyar e. Erebe Şemo Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst ya Ermenistanê ye û ji ber vê yekê jî berhemên wî di bin siya siyasetê da ne.¹⁰⁹

Erebê Şemo bi Kurdî, Ermenîkî, Tirkî, Rûsî, Gurcîkî, Almanî û Azerîkî dizane.¹¹⁰ Zanîna wî li ser edebiyata Rûsî û Ermenîkî baş bûye. Ew bi gelek rewşenbîr û nivîskarên mezin yê Sovyetê ra hevnas bûye. Bi taybetî bandora edebiyata Rûsî li ser wî pir e.¹¹¹ Ev bi me dide zanîn Erebe Şemo ji berhemên van kesan haydar e û wan dişopîne. Wekî mînak ji berhema Aleksandr Araratyan sûd werdigire û teqlîda wê wekî *Koçekê Derewîn* derdixe. Dîsan gava Maksîm Gorkî tê Erîvanê diçe serdana wî û berhema xwe pêşkêşî wî dike. Em ji vê têkiliyê dikarin bibêjin Erebe Şemo Maksîm Gorkî şopandiyê û xwe nêzî wî dîtîye. Di wan salan da li Sovyetê gelek ciwanên nû dest bi nivîsandinê kirine berhemên xwe nîşanî Gorkî dane ji bona Gorkî derheqê berhemên wan da nirxandinan bike. Van ciwanan dane ser rêya edebî ya Maksîm Gorkî. Yek ji van jî Erebe Şemo ye. Yek nîşaneyêke vê rewşê jî ew e Erebe Şemo yekem berhema xwe ya edebî *Şivanê Kurmanca* di şêweyê *Zaroktiya Min* da nivîsandiyê. Ligel van di romana *Jiyana Bextewar* da em dibînin Şehîd lehengekî vê romanê ye, behsa Maksîm Gorkî dike û dibêje min romana wî ya *Ana (Dê) û çîrokên wî* xwendine. Dîsa di romana *Hopo* da dema Hesên dikeve odeya Zînê di pirtûkxaneyê wê da berhemên Hovhannês Tûmanyân, Êgîşê Çarêns, Pûşkîn, Tolstoy û Tûrgeniyev dibîne. Ev yek jî gumanek dide me Erebe Şemo berhemên nivîskarên navên wan li jorê borîn xwendine. Ligel van Erebe Şemo pak ji çîrok û destanên Kurdî haydar bûye. Di heman romana navborî da qala çîrokên *Mem û Zînê û Kerr û Kulik* tê kirin. Di afirandinên wî da bi taybetî li ser zimanê afirandinên wî bandora van berhemên gelêrî heye. Ligel van wisa xuyaye Erebe Şemo ji berhemên Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî jî haydar bûye. Lewra di romana xwe ya *Dimdim* da navê van kesan bi kar tîne û behsa beytên wan dike.¹¹²

Erebê Şemo bi pênûs û tevgera xwe pêşengek bû. Wekî gelek pêşengan rê vedike. Loma jî îro di vê mijarê da pênaseya “bavê romana Kurdî” para wî ye. Şemo her dem ji bo edebiyata Kurdî figureke sereke ye. Berhemên wî ji derveyî endîşeyên edebî ne û di nivîskariya wî da “erk” û “hewce” zêdetir e. Lewma bi çavê projeyêke çandî li romanê

¹⁰⁹ Helîm Yûsiv, **h.b.**, r. 11.

¹¹⁰ Têmûrê Xelîl, “Erebê Şemo Rûspîtiya Gelê Kurd”, **W**, j. 15, (2007), r. 29.

¹¹¹ Boyîk, **h.b.**, r. 112-113.

¹¹² Yılmaz, **h.b.**, r. 31.

dinihêre.¹¹³ Erebe Şemoyê bi xulamî û şivantiyê derketiye li ser dikê, bi wê nemaye, ew şert û mercên di heyama wî da ji bo gelekên bûye sedema bêhêvîti û sistiyê, seba wî bûye derfeta hînbûnê. Di hemû quncik û keysên jiyana xwe da xwe fêr dike û di pêşerojê da bi gelê xwe ra parve dike.¹¹⁴ Erebe Şemo bandoreke mezin li civaka xwe kiriye. Bi saya wî gelek kes li ser Kurdî dixebitin.¹¹⁵

Erebe Şemo di berhemên xwe da zimanekî gelek xwerû bi kar tîne. Di xwendinên baldar da tê dîtin gelek peyvên niha nayên bikaranîn cî digirin. Bikaranîna ziman ya bi vî awayî romanên wî ji bo ferhengçêker, zimannas û lêkolîneran dibe çavkaniyeke girîng.¹¹⁶

1.4. BERHEMÊN EREBÊ ŞEMO

Şivanê Kurmanca yekemîn romana Kurdî ye û di sala 1935an da li Erîvanê hatiye weşandin. *Şivanê Kurmanca* qala jiyana Kurmancan ya di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an da dike. Ev berhem romaneke otobiyografîk e û ji serborî û bîranînan pêk tê. Nivîskar di *Şivanê Kurmanca* da zarokatiya xwe, rewşa malbata xwe û rewşa êl û eşîrên Kurmancan û damezirandina pergala Sovyetê û encamên wê yên di nav Kurmancan da ji nêz va terîf dike. Di romanê da bi hûrgilî behsa tevlîbûna nivîskar ya Şerê Cîhanê yê Yekemîn, wek wergêrekî xebatên wî yên di artêşa Rûsan da û xebatên wî yên di nav Bolşevîkan û di nav êl û eşîrên Kurmancan da tê kirin.¹¹⁷ Erebe Şemo di sala 1958an da romana xwe ya *Şivanê Kurmanca* li ber çavan derbas dike. Hinek beşan lê zêde dike û wê bi navê *Berbang* diweşîne.¹¹⁸

Jiyana Bextewar romana Erebe Şemo ya duyemîn e û di sala 1959an da li Erîvanê hatiye weşandin.¹¹⁹ Ev berhem jî weke *Şivanê Kurmanca* ji bûyerên rast hatiye honandin. Bûyerên di romanê da hatine dayîn, ji aliyê nivîskar va çêkirî, yanê berhemên fikrandina wî nînin. Ew tev ji jiyana Kurdên Sovyetê hatine hildan. *Şivanê Kurmanca* otobiyografiya nivîskar e, lê *Jiyana Bextewar* dîrokçeya eşîreke Kurdan e ku koç kirine û çûne Rûsyayê. Roman weke dîrokçeya Eşîra Sîpkan e. Nivîskar naveroka romanê ji

¹¹³ Remezan Alan, **Bendname**, İstanbul: Weşanên Peywend, 2013, r. 188.

¹¹⁴ Murad Celalî, "Di Romanên Erebe Şemo Jiyana Bextewar û Hopo de: Tîpên Şoreşger ên Romantîk", **Nûbihar**, j. 126, (2014), r. 73.

¹¹⁵ Abdurrahman Baqîr, "Ji Şivantiyê Ber Bi Zanyariyê Ve", **W**, j. 15, (2007), r. 48.

¹¹⁶ Abidin Pariltî û Özlem Galip, **Kürt Romanı Okuma Kılavuzu**, İstanbul: Sel Yayınları, 2010, r. 30.

¹¹⁷ Ahmedzade, **h.b.**, r. 19.

¹¹⁸ Gören, **h.b.**, r. 31-32.

¹¹⁹ Şîrîn û Zal, **h.g.**, r. 16.

jiyana êleke Kurdan ya Sîpka girtiye. Bûyerên dîrokî yên derdora sed salan ji xwe ra kiriye hîm û li ser wê hîmê guhestinên bingehîn nîşan dide yên di jiyana Kurdên wê herêmê da qewimî ne. Qehremanê romanê yê sereke Emerîk e û bûyerên sereke li dora qedera malbata wî û Kurdên wê herêmê pêk tên, bi taybetî jî êla Sîpkan. Nîvê sedsala nozdehan, nakokiyên olî û civakî dikevin navbera evdên wê êlê. Malbata Emerîk û Sîpkîyên êzdî tev ji mecbûrî cî û warên kal û bavên xwe, milk û malên xwe dihêlin, direvin qezaya Qersê wê demê di bin bandora dewleta Rûs da ye. Koçberiya ber bi warekî nû va bi xwe ra dijberiyên nû tîne. Li cem wan hinek qewl û qanûnên civakî hene evdên sade jî ji zilma neheqan xweyî bikin. Lê li wir jî evdên kesîb, belengaz, xebatkar tên pelçiqandin. Li wir jî hukumdarî li aliyê axa, beg û zengînan e. Li wir jî nakokiyên di nav civakê da li dijî feqîr û xebatkaran tên bikaranîn.¹²⁰ Di romanê da zordestî-serbestî, neheqî-wekhevî, belengazî-dilşadî û bi kurtî hemû rengên jiyane yên baş û kirêt li pey hev hatine rêzkirin.¹²¹ Erebe Şemo romana xwe ya bi navê *Jiyana Bextewar* jî weke romana xwe ya bi navê *Şivanê Kurmanca* bi devoka Serhedê nivîsiye. Roman bi Kurdiyeke xwerû hatiye nivîsandin. Nivîskar hewl nade zimanê xwe zehmet bike, berevajiyê vê dixwaze hêsan bike her kes jê fêhm bike. Zimanê romanê paqij e, zelal û dewlemend e. Şêweya vegotina wî weke ya çîrokbêjan e.¹²²

Dimdim romana Erebe Şemo ya sêyemîn e û di sala 1966an da li Erîvanê hatiye weşandin.¹²³ Erebe Şemo di romanên xwe yên berê da cî dide bûyerên bi xwe dîtiye yan jî nifşa pêşiya wî dîtiye. Lê *Dimdim* mijara xwe ji bûyereke dîrokî digire. Şemo bi vê romanê cara yekemîn bûyereke dîrokî kiriye mijara romana xwe. Ev bûyer di sedsala 17an da li Çiyayê Dimdimê û derdora wê pêk hatiye.¹²⁴ Di çîroka di sedsala 17an da derbas dibe Kurd li Keleha Dimdimê di nav aramiyê da dijîn. Lê dema Şah Abbasê şahê Îranê artêşa xwe dişîne ser wan her tişt diguhere. Kurd di serkêşiya Xanoyê Çengzêrîn da dikevin şer. Piştî berxwedaneke mezin Kurd têk diçin. Keleha Dimdimê kaviil û wêran dibe. Jin, mêr, zarok û kal û pîr tên qetilkirin. *Dimdim* her çiqas wekî çîroka şer xuya bike jî balê dikşîne ser lehengan û qelsî û kêmasiyên wan tên eşkerekirin û bi vê taybetiya xwe girîng e. Di romanê da wek civak û şexs li ser derûniya Kurdan hûr dibe

¹²⁰ Boyîk, **W**, r. 23.

¹²¹ Rohat, **h.g.**, r. 18.

¹²² Gören, **h.b.**, r. 36.

¹²³ Şîrîn û Zal, **h.g.**, r. 16.

¹²⁴ Gören, **h.b.**, r. 40.

û romana herî serkeftî ya Erebe Şemo ye.¹²⁵ Ev romana mêrxasiyê, berxwedan û azadiyê di edebiyata Kurdî da li dereke girîng e. Di romanê da hevgirêdana bûyeran, hilibjartina mêrxasan, teswîrên xurt, bi taybetî teswîrkirina Keleha Dimdimê, dem û dezgehên wê û jiyana nav kelehê bi hostefî hatiye honandin. Erebe Şemo bi nivîsandina vê berhemê gihîştîye ast û serfiraziyeke mezin.¹²⁶ Zimanê berhemê zimanekî herikbar e û bûyer bi hev ra xweş hatine honandin. Erebe Şemo di romanê da gelek kilam û helbest bi kar aniye û li tevna romanê tîn.¹²⁷

Hopo romana Erebe Şemo ya dawîn e û di sala 1969an da li Erîvanê hatiye weşandin.¹²⁸ Romana *Hopo* berdewama *Jiyana Bextewar* e.¹²⁹ Di romana *Hopo* da Erebe Şemo jiyana gundekî Kurdan ya di dema sosyalîzmê da vedibêje. Li gund, sîstema kolxozvaniyê hatiye avakirin û gundî bi awayekî serfiraz û ji dil di karên gund da dişixulin. Zilma beg, axa û şexan ji holê rabûye. Jixwe serdema desthilatdariya wan qediyaye. Şerên mezin jî yên mîna şerên yekemîn û duyemîn yên cîhanê di paş da mane. Civak di nav aramî û serfiraziyê da ye. Ligel jiholêrabûna desthiladariya axa û began û hatina sîstema sosyalîzmê, di nav civakê da xwendin belav bûye. Ciwanên gundên Kurdan diçin bajarên weke Erîvanê, Moskovayê û Tiflîsê û xwendina bilind diqedînin. Dibin endezyarê çandiniyê û hwd. û vedigerin gundê xwe. Li gundê xwe di xebata kolxozê da dibin rêvebir. Erebe Şemo di romana *Hopo* da cî daye gelek edetên Kurdan. Xwestiyê jiyana wan ya civakî bide naskirin. Wî di vê romanê da jiyana civakî bi kitekit girtiye dest. Ji rabûn û rûniştinê bigire heta şîn û şahiyên qala her tiştî kiriye. Şemo bi vê romana *Hopo* wêneyekî jiyana gundên Kurdan yên li dora Çiyayê Elegezê wergirtiye. Guherîn û pêşketina di civakê da pêkhatî vegotiye.¹³⁰

Kurmancêd Elegezê çîrokeke dirêj ya Erebe Şemo ye. Ev çîroka dirêj di sala 1936an da hatiye weşandin. *Kurmancêd Elegezê* behsa jiyana Kurdên li derdora Çiyayê Elegezê dijîn dike. Ev berhem peyhatiya romana *Şivanê Kurmanca* ye. Şemo di vê berhemê da jiyana xwe ya di pey damezirandina sîstema Sovyetê ra vedibêje. Qehremanê çîrokê Erebe Şemo bi xwe ye. Li vir bi navê Misto derdikeve ber xwendevanan. Li vê derê êdî Misto xebata perwerdeyî, kulturî û çandî di nav gundiyan

¹²⁵ Pariltî û Galip, **h.b.**, r. 32-33-34.

¹²⁶ Rohat, **h.g.**, r. 18.

¹²⁷ Edîp Polat, "Ji Hêla Teknîka Romanê Ve 'Dimdim' û Erebe Şemo", **W**, Hejmar: 15, (2007), r. 38.

¹²⁸ Şîrîn û Zal, **h.g.**, r. 16.

¹²⁹ Boyîk, **h.g.**, r. 25.

¹³⁰ Gören, **h.b.**, r. 43-44.

feqîr û belengaz da dike, li dijî wan kesan derdikeve yên weke dijminê çîna proleterayê tîn zanîn: Kurdên zengîn, kûlak, axa, beg û desthilatdarên berê. Her wiha li dijî edetên kevin yên ziyandar jî derdikeve. Ji bo pêşketina civakê xebata perwerdeyî, çandî û civakî dike.¹³¹

Erebê Şemo ji xeynî roman û çîrok di warê senaryoyê da jî xwedî berhem e. Erebe Şemo bi navê *Kurdên Ermenistanê* (1959) senaryoyek nivîsandiye. Bi senaryoya wî belgefilm hatiye kişandin. Fîlm her çiqas pesin û propagandaya jiyana Sovyetê bide jî gelek rewşenbîrên Kurd dikarin wê demê bi zindî bibînin.¹³²

Yek ji berhemên nivîskarê piralî Erebe Şemo jî wergera piyeseke ye. Şemo ev piyesa bi navê *Koçekê Derewîn* ya ji aliyê nivîskarê şanoyê yê Ermenî Aleksander Araratyan va hatiye nivîsandin di sala 1930yan da wergerandiye Kurdî.¹³³

Erebê Şemo di warê rêzimanê da pirtûkek nivîsandiye û navê pirtûkê *Xo Xo Hînbûna Xandîna Nivîsara Kurmancî* ye. Ev pirtûka elfabeyê di sala 1929an da hatiye weşandin. Piştî biryara Hikûmeta Ermenistanê ya ji bona perwerdeya bi Kurdî Erebe Şemo û Îsahaq Marogulovê bi eslê xwe Aşûrî ye ev elfabe amade kirine. Ev berhem li Ermenistanê ji bo perwerdeya Kurdî bûye materyaleke bingehîn.¹³⁴ Erebe Şemo bi navê *Hikayetên Gelê Kurd* (1967) û *Dewrêşên Kurda* (1930) jî pirtûk amade kirine.¹³⁵

Erebê Şemo endamekî komîteya navendî ya Partiya Komunîst ya Ermenîstanê bû. Erebe Şemo hin nivîs û gotar di warê komunîzmê da nivîsîne. Gotarên wî yên bi navê “*Emrê Lenîn*”, “*Riya Şoreşa Oktobirê*” û “*Kolxoz û Karê Wê Yê Ji Gundîya Ra*” di sala 1930yan da hatine weşandin. Gotara wî ya bi navê “*Li Ser Peywendiyên Feodalî Di Nav Kurdan Da*” di sala 1936an da hatiye weşandin. Xebata wî ya bi navê “*Çirûskên Şoreşa Oktobirê*” di sala 1972yan da hatiye weşandin. Ji nivîsandina wan mebest pesindayîna sîstema komunîst û serokê wê Lenîn e. Ev berhem di rojnameya *Riya Teze* da bi Kurdî, Rûsî û Ermenîkî hatine weşandin. Dezgehên çapemaniyê yên wê demê di bin kontrola rejimê da bûn û pêwîst bû di weşanan da pesnê rejimê bê dayîn. Jixwe Şemo bi xwe endamekî Partiya Komunîst bû û di hemû berhemên xwe da kêman jî zêde pesnê rejimê û rêberên wê daye. Şemo di van nivîsaran da hewl dide gelê

¹³¹ Boyîk, **h.g.**, r. 21.

¹³² Boyîk, **h.g.**, r. 26.

¹³³ Şîrîn û Zal, **h.g.**, r. 16.

¹³⁴ Boyîk, **h.g.**, r. 19.

¹³⁵ Şîrîn û Zal, **h.g.**, r. 16.

paşdemayî şiyar bike û derfetên rejimê bi wan bide nasîn. Her wiha merivan derbarê dijminên wan yên feodal û kevneperest da agahdar bike û riyên tekoşînê nîşanî wan bide.¹³⁶

Erebê Şemo di hevpeyvîna Bavê Nazê ya di sala 1972an da pê ra tê kirin li ser pirsra, “Niha çi planê we û nivîsandinê heye?” dibêje, “Îsal min *Çirûskên Şoreşa Oktobirê* xelas kir û nêzîk wê bê weşandin. Ê niha jî min dest bi romana *Şerê Tarîlka* kiriye. Ev roman dîrokî ye, bûyerên wê li Kurdistana Tirkîyeyê diqewimin.”¹³⁷ Erebe Şemo di sala 1978an dimire û agahiyên me derbarê vê berhemê da tunene. Wek mayîn Şemo li ser pirsra, “Gelo, hûn helbestan dinivîsînin?” bersiv dide û wiha dibêje: “Erê, lê ji bo xwe.”¹³⁸ Di çavkaniyan da jî xeynî helbestekê tu helbestên Erebe Şemo cî nagirin. Her wiha li ser helbestkariya wî jî tu agahî nayên dayîn. Tenê Feqî Huseyîn Sagniç di pirtûka xwe ya bi navê *Dîroka Wêjeya Kurdî* da cî dide helbesteke Erebe Şemo û ew helbest jî ev e:

“Çiya har in
Bi neyar in
Bê xedar in
Bê mecal in
Ji bo te birîndar in
Bi hawêr in
Sedem te ye em dinalin.

Tên û diçin zivistan
Ba û bexoz
Berf û baran
Bi hesreta dilan
Dîtina çevan
Çev digêrînim li hawîrdoran
Te nabînim serê çiya û şaxan.

Tên û diçin bihar
Li welatê bindestan

¹³⁶ Boyîk, **h.g.**, r. 20.

¹³⁷ Nazê, **h.g.**, r. 32.

¹³⁸ Nazê, **h.g.**, r. 32.

Ax diwelide
Çem dişuxin
Erd û ezman dikişin
Li xewa giran
Dixemilin banî kulîlkên
Kurdistan...

Dest pê dike govend û dîlan
Çev digerînim li nav milan
Te nabînim li nav civînan?

Tên û diçin havîn,
Hêvî û heyîna
Belengazan
Dikalîn mêrg û deşt
Dipijîqe xêr û bereket
Ji nav eniya kedkaran
Çev digerînim li nav xebatkaran
Li zevî û newalan
Te nabînim nav hevalan
Tên û diçin payîz.

Bi zarîn û axîn
Stûxwehr in dar û ber
Hizniye welat bi seranser
Dibêjin va ye dîsa hat
Zivistana har û xedar
Dicivin tev hêvîdar
Te nabînim li nav kar.^{»139}

¹³⁹ Feqî Huseyn Sagniç, **Dîroka Wêjeya Kurdî**, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r. 525-526.

BEŞA DUYEM

JI HÊLA TEKNÎK Û MIJARÊ VA ANALÎZKIRINA ŞIVANÊ KURMANCA

2.1. SERENCAMA ŞIVANÊ KURMANCA

Şivanê Kurmanca wek romana ewil ya bi Kurdî tê qebûlkirin. Derheqê zimanê orîjînal û cara ewil weşandina *Şivanê Kurmanca* da agahiyên berfireh kêr in. Li gorî Mustafa Aydoğan neqil dike hin kes -ev kes nayên eşkerekirin- dibêjin Erebe Şemo *Şivanê Kurmanca* di sala 1930yê da tamam dike, loma jî divê destpêka romana Kurdî sala 1930yê be.¹⁴⁰ Di sala 1930yê da pirtûkeke Erebe Şemo tê weşandin, lê ev *Şivanê Kurmanca* nîne. Lewra di sala 1972yan da Bavê Nazê bi Erebe Şemo ra hevpeyvîn¹⁴¹ dike û li ser pirsê, “Gelo, ji berhemên we yê edebî kîjan ya pêşîn bû?” Erebe Şemo wiha dibêje, “*Riya Şoreşa Oktoberê* ya pêşîn bû, min ew di sala 1930yê da nivîsî bû.”¹⁴²

Li gor agahiyên di destê me da hene *Şivanê Kurmanca* beriya bi Kurmancî bê weşandin bi Ermenîkî û Rûsî hatiye weşandin. Hin beşên *Şivanê Kurmanca* bi Ermenîkî di sala 1930yê da bi navê “Şivan” di kovara “Grakan Dîrkêrûm” (Di Tabyayên Edebiyatê Da) hejmarê 7an û di nav rûpelên 27-34an da tên weşandin. *Şivanê Kurmanca* di sala 1931an da wekî weşaneke serbixwe bi navê *Kûrdskîy Pastûx* (Şivanê Kurd) bi Rûsî tê weşandin. Di vê çapê da tenê beşên ewil hene û ev çap 64 rûpel e. Di sala 1933yan da Chr. Oelbergî ji wergera Rûsî ya di sala 1931an da *Şivanê Kurmanca* bi navê *Der Kurdische Hirt* werdigerîne Almanî. *Şivanê Kurmanca* ya bi Kurmancî jî bi tamamî di sala 1935an da bi destê Neşra Hikûmeta Ermenistanê li Erîvanê tê weşandin û tevî navnîşê 155 rûpel e. Di sala 1935an da *Şivanê Kurmanca* îcar bi Rûsî dîsa bi navê *Kûrdskîy Pastûx* tê çapkirin û li serê tê nivîsandin ji Kurdî hatiye wergerandin.¹⁴³ Li gorî Mustafa Aydoğan neqil dike di pêşgotina wergera Rûsî ya di sala 1935an da wiha tê gotin û agahiyên li jorê tên piştrastkirin:

“Bi zimanê Rûsî ji berhemên E. Şamîlovî ev berhem hatine weşandin: Kurdên Pişkafkasyayê -ev sala 1930yê di kovara 'Rêvolusîya î Kûltûra'yê de di

¹⁴⁰ Mustafa Aydoğan, “Destpêka Romana Kurdî Şivanê Kurmanca”, *Şivanê Kurmanca*, Diyarbakır: Weşanên Lîs, 2009, r. 8-9.

¹⁴¹ Hevpeyvîna Bavê Nazê berê bi Erebe di kovara “Rêber” da tê weşandin, lê di sala 1997an da bi minasebeta sedsaliya bûyîna Erebe Şemo bi Kurmancî cara ewil di “Axîna Welat” da (Hejmar: 53, Sal: 1997-Moskova) tê weşandin. Navê pirtûkê yê orîjînal *Tarîqa Înglaba Oktyabrê* ye. Li ser berga wê 1930 û di rûpelên hundir da jî 1931 heye. Navê Erebe Şemo wek “tertîbkar” derbas dibe. Ev wek berhemeke edebî nayê qebûlkirin. (Bnr. Aydoğan, **h.b.**, r. 9)

¹⁴² Nazê, **h.g.**, r. 32.

¹⁴³ Aydoğan, **h.b.**, r. 9-10.

hejmara 15-16an de hatiye weşandin-, Şivanê Kurmanca (beşên pêşîn) wek weşaneke cuda (Weşanxaneya Molodaya Gvardîya di sala 1931an de) û Dewrêşên Kurda di sala 1930yî de di hejmara kovara 'Ateîst' ya 59an de hatiye weşandin.”¹⁴⁴

Şivanê Kurmanca beriya di sala 1935an da bi Kurmancî bê weşandin bi kîjan zimanî hatiye nivîsandin eşkere nîne, lê tenê ev agahî heye *Şivanê Kurmanca* bi temamî bi Ermenîkî û Rûsî beriya Kurmancî nehatiye weşandin û derbarê zimanê nivîsandina xwe da Erebe Şemo di hevpeyvîna Bavê Nazê da li ser pîrsa “Hûn bi kîjan zimanî dinivîsîn?” wiha dibêje, “Bi zimanê Kurdî û ez bixwe jî werdigerînim ji zimanê Rûsî. Carna jî ez ji tercimanan ra dibim alîkar.”¹⁴⁵

Di çarçoveya agahiyên navborî da meriv dikare wergerên *Şivanê Kurmanca* yên ji bo Rûsî hatine kirin wiha rêz bike: Çapa yekem di sala 1931an da bi destê Weşanxaneya Molodaya Gvardîya li Lenîngradê tê weşandin. Di vê çapê da tenê beşên ewil hene. Çapa duyemîn di sala 1935an da bi destê Weşanxaneya Dewletê ya Pişkafkasyayê li Tiflîsê tê weşandin. Di vê çapê da tê gotin ev berhem ji Kurdî hatiye wergerandin, lê navê wergêr li serê tune. Çapa sêyemîn di sala 1960î da bi destê Weşanxaneya Dêfîzdatê tê kirin û wek wergêr navê Erebe Şemo û Î. Ostrogorskaya derbas dibe. Çapa çaremîn di sala 1964an da bi destê Weşanxaneya Dêstkaya Lîtêratûra li Moskovayê tê çapkirin û wek wergêr jî navê Î. V. Ostrogorskaya derbas dibe. Di çapên sala 1972 û 1978an da jî wek wergêr navê Erebe Şemo û Î. Ostrogorskaya derbas dibe.¹⁴⁶

Pirî caran *Şivanê Kurmanca* û *Kurmancêd Elegezê* tînen tevlihevkin û wekî berdewam û perçeyên hev tînen qebûlkin. *Kurmancêd Elegezê* romaneke Erebe Şemo ye û di sala 1936an da bi destê Neşra Hikûmeta Ermenistanê li Erîvanê bi Kurmancî hatiye çapkirin. Di sala 1935an da di wergera Rûsî ya bi navê *Kûrdsîy Pastûx* da herdu berhemên Erebe Şemo *Şivanê Kurmanca* û *Kurmancêd Elegezê* bi navê xwe yê Rûsî *Kûrdî Alagyaza* bi hev ra tînen çapkirin. Li ser bergê *Kûrdsîy Pastûx* heye, lê di rûpelên hundir da tê gotin ev herdu berhemên Erebe Şemo ne. Ji ber wergera Fransî ya di sala 1946an da ji *Kûrdsîy Pastûx* tê kirin bi navê “Kurdên Alagozê” wekî berdewama *Şivanê Kurmanca* tê dîtin. Di çapên Kurdî yê din da jî ev xeletî dewam dike. *Kurmancêd Elegezê* pêşiyê di sala 1932yan da bi destê S. Koçeryanî li Ermenîkî tê

¹⁴⁴ Aydogan, **h.b.**, r. 9.

¹⁴⁵ Nazê, **h.g.**, r. 31.

¹⁴⁶ Aydogan, **h.b.**, r. 16.

wergerandin û weşanxaneyê Pêthratê (Weşanxaneyê Dewletê) bi navê *Alagyazî Krdêrî* wek pirtûkeke cuda çap dike.¹⁴⁷

Mijareke din jî li ser *Şivanê Kurmanca* û *Berbangê* ye. Di sala 1958an da romana Erebe Şemo ya bi navê *Berbang* li Erîvanê çap dibe.¹⁴⁸ Wekî ji naveroka *Berbangê* jî diyar e ev roman romaneke serbixwe nîne. Romana *Berbangê* jî nû va nivîsandina *Şivanê Kurmanca* ye. Dema Erebe Şemo romana xwe ji nû va nivîsandiye di romanê da hin cudahî kirine. Di *Berbangê* da navê piraniya beşan hatine guhertin. Wek mînak di *Şivanê Kurmanca* da navê beşa duyem “Merkeba me. Rêncberîya nava melegana” ye. Navê vê beşê di *Berbangê* da bûye “Merkeva me, rêncbertiya nava ûrisa”. Dîsa di *Berbangê* da bêje jî hatine guhertin. Di *Şivanê Kurmanca* da peyva “Kurmanc” heye, lê di *Berbangê* da ev peyv bûye “Kurd”. Di *Berbangê* da li hin beşan îlave hatine kirin. Di binbeşa “Mijûliyêd me” da sitran lê hatiye zêdekirin. Ev sitran di *Şivanê Kurmanca* da tune. Di *Berbangê* da di beşa “Hicûma gura” da Erebe Şemo hêkan didize û dîke bin kumê xwe, lê ji aliyê xwediyê xanî va tê girtin. Gava dixwaze hêkan ji bin kumê xwe derxe hêk di serê wî da dişikên. Ev bûyer di *Şivanê Kurmanca* da cih nagire. Dîsa di *Berbangê* da hin beş hene û di *Şivanê Kurmanca* da cî nagirin. Wek mînak beşa “Nama ji Amerîkayê” ya ji rûpela 35an heta 45an cî digire di *Şivanê Kurmanca* da tune, lê dîsa jî di naveroka vê beşê da bûyerên di *Şivanê Kurmanca* da cî girtine hene. Hin beşên di *Şivanê Kurmanca* da cî girtine di *Berbangê* da tune. Wek mînak beşên “Hazirkirina hasil”, “Li ûrisê” û “Înglaba Oktyabrê” di *Berbangê* da cî negirtine. Meriv dikare bibêje her çiqas di naveroka *Berbangê* da hin cihêbûn hebin jî ev roman wekî romaneke serbixwe divê neyê qebûl kirin. Divê ev roman wekî jî nû va nivîsandina *Şivanê Kurmanca* bê qebûl kirin.¹⁴⁹

Di sala 1946an da Bazîl Nikitîn li Parîsê ji wergera Rûsî *Şivanê Kurmanca* werdigerîne Fransî¹⁵⁰ û di sala 1947an da Nûredîn Zaza ji Fransî werdigerîne Kurmancî û bi navê *Şivanê Kurd*¹⁵¹ li Bêrûdê tê çapkirin.¹⁵² *Şivanê Kurmanca* cara ewil di sala

¹⁴⁷ Aydoğan, **h.b.**, r. 34-35-36.

¹⁴⁸ Ji bo agahiyên berfireh. (Bnr. Aydoğan, **h.b.**, r. 27-28-29-30).

¹⁴⁹ Ferhat Yılmaz, **h.b.**, r. 27-28.

¹⁵⁰ Bazîl Nikitîn ji wergera Rûsî ya di sala 1935an da li Tiflîsê tê weşandin *Şivanê Kurmanca* werdigerîne Fransî. (Bnr. Erebe Şemo, **Şivanê Kurd/Le Berger Kurde**, Parîs: Institut Kurde de Paris, 1989, r. 6)

¹⁵¹ Di dawiya vê çapê da bi navê “Kurdên Alagoz”ê û “Çend Şîrên Kurdî yê Şewristanê” du beşên cuda cî digirin û wêne hatine xêzkirin. Di pêşgotinê da tê gotin ev kitêb li Parîsê ji aliye Bazîl Nikitîn va hatiye wergerandin ji bo Fransî û jê dîsa bûye Kurdî. (Bnr. Erebe Şemo, **Şivanê Kurd**, Bêrûd: Çapxane Nassar, 1947, r. 6)

1977an da ji bo Tirkî tê wergerandin û bi navê *Kürt Çoban/Şivanê Kurd*¹⁵³ bi destê Weşanên Özgürlük Yoluyê va li Stenbolê bi Tirkî û Kurdî tê çapkirin. Ev di heman demê da yekem çapa wê ya li Tirkîyeyê ye û yekem romana Kurdî ye li Tirkîyeyê tê çapkirin. Di sala 1986an da Weşanên Komkarê *Şivanê Kurmanca* bi navê *Der Kurdische Hirt* (Şivanê Kud) li Kolnê bi Almanî çap dike. Di sala 1989an da Enstîtuya Kurdî ya Parîsê *Şivanê Kurmanca* bi Fransî tevî Kurmanciya wê bi navê *Şivanê Kurd/Le Berger Kurde*¹⁵⁴ diweşîne. Di sala 1993yan da *Şivanê Kurmanca* cara duyemîn ji bo zimanê Tirkî tê wergerandin û bi destê Weşanên Kaynakê va li Stenbolê bi navê *Kürt Çoban*¹⁵⁵ tê çapkirin. Di sala 1994an da Weşanên Dengê *Şivanê Kurmanca* li Tirkîyeyê cara ewil tenê bi Kurmancî diweşîne. Roman bi navê *Şivanê Kurd* li Stenbolê tê çapkirin. Di sala 2005an da roman cara duyemîn li Tirkîyeyê bi Kurmancî bi destê Weşanên Aramê va li Stenbolê tê weşandin.¹⁵⁶ Di sala 2006an da roman li Hewlêrê ji aliyê Weşanên Arasê va bi herfên Erebî tê weşandin. Dr. Muhsîn Ehmed Emer ji bo vê çapê destpêk û ferhengokek amade dike û tîpguhêziya wê dike. Tîpguhêziya berhemê li ser çapa *Şivanê Kurd* ya di sala 1989an da hatiye kirin, lewra tê da beşa “Kurdên Alagoz”ê jî heye. Pêşgotina romanê bi Soranî, lê berhem bi Kurmancî ye.¹⁵⁷ Di sala 2009an da *Şivanê Kurmanca*¹⁵⁸ cara sêyemîn li Tirkîyeyê bi zimanê wê yê orîjînal, lê îcar bi destê Weşanên Lîsê va tê çapkirin. Weşanxaneyê di vê çapê da cî daye orîjînala romanê ya bi herfên Kirîlî ya di sala 1935an da li Erîvanê *Şivanê Kurmanca* pê hatiye çapkirin.

2.2. KURTASIYA ŞIVANÊ KURMANCA

Şemo (Şemoyê Adî) Kurmancekî kesîb û xizan e. Şemo ji êla Hesena ye û li qezaya Surmeliyê -berê ew tev welatê Rewanê bû- diçe ber dewarên xelkê. Dema jina wî ya ewil dimire, Şemo herdu kurên xwe Biro û Dewrêş hildide û ji Surmeliyê koç dike. Şemo zilamekî wisa xizan û feqîr e ji xeynî lihêfeke kevin tu tişteki wî tune.

¹⁵² Aydoğan, **h.b.**, r. 30-31.

¹⁵³ Di vê çapa Tirkî da wek wergêr navê Kemal Burkay derbas dibe. (Bnr. Aydoğan, **h.b.**, r. 34)

¹⁵⁴ Di vê çapê da metna Kurdî ji ya Nûredîn Zaza û metna Fransî ji ya Bazil Nikitîn hatiye hildan. Di pêşgotinê da tê gotin tenê hin kêmasiyên metna Nûredîn Zaza hatine temamkirin û ji ber eslê wê hin guherîn hatine kirin. (Bnr. Şemo, **h.b.**, r. 6)

¹⁵⁵ Di vê çapa Tirkî da wek wergêr navê Gani Bozarşlan derbas dibe.

¹⁵⁶ Gören, **h.b.**, r. 32-33.

¹⁵⁷ Aydoğan, **h.b.**, r. 38.

¹⁵⁸ Erebê Şemo, **Şivanê Kurmanca**, Mustafa Aydoğan (amd.), Diyarbakır: Weşanên Lîs, 2009.

Wexta Şemo ji Surmeliyê koç dike Biro sê salî ye û Dewrêş jî hê du salî ye. Şemo koç dike û tê Qersê û li gundê Huruman (Yewnanan) yê bi navê Azat dimîne.

Şemo li gundê Azatê, li mala Hurumê navê wî Todor e dibe rênçber. Şemo li gund bi jineke Kurmanc ra dizewice. Şemo xulamtiya Todor dike û jina wî jî diçe di malan da dixebite û karên curbecur dike. Ji vê jinê sê zarok çêdibin: Çîçek, Gogê û Ereb. Şemo havînan diçe ber dewaran û zivistanan jî rênçberî û xulamtiyê dike. Ereb êdî mezin dibe û dixwaze li cem bavê xwe bibe dûajo. Bi îzna bavê xwe bi hatina biharê ra li bal bavê xwe dibe dûajo.

Zarokatiya Ereb û ya malbata wî di nav xizaniyê da derbas dibe. Zarokên malê ji çolê sergîn û pincaran berhev dikin û tînin malê. Bi vî awayî jî ji malbata xwe ra dibin alîkar. Piştî şivantiya havînê Şemo pere berhev dike û ji xwe ra barbirek (ker-merkeb) dikire. Ji bona genim û cehê xwe bibe aş û sitûyê xwe li ber xelkê xwar neke. Kirîna barbirê karê malbatê hêsan dike. Zarok bi kerê ji çolê ji xwe ra sergîn û giya tînin û gelek karê xwe pê dikin. Şemo wê zivistanê di maleke din da dibe xulam yê navê wî Pablê Trîandafilov e.

Şemo û malbata xwe piştî gundê Azatê diçin gundê Alêksandrovskê (Komesorê) ya Meleganan û li wir dibin şivan û gavan. Ereb li Komesorê diçe ber pezê Sîlvyorst, piştî gur nav pêz dikeve, Sîlvyorst heqê Ereb nade û wî ji ber pezê xwe derdixe. Ereb diçe li dewarên Îvan dinihêre. Ereb heta biharê li dewarên Îvan dinihêre û biharê dibe golikvanê gund. Mamosteya gund Ereb wek dergevanê dibistanê digire û Ereb li berê jî dest bi xwendinê dike û bi alîkariya Marûsiya keça mamosteya gund xwendin û nivîsandinê fêr dibe. Ereb êdî di tûrikê şivaniyê da pirtûkan jî digerîne.

Mîrze kurê Temoyê Kepo dewarên Meleganan didize û dibe li Îdirê difiroşe. Melegan bavê Ereb sûcdar dikin û ji vir diçin gundê Vladîqers û di mala Eslên da dimînin. Salek li vî gundî dimînin û diçin Novo-Mîxaylovka gundê Meleganan. Di mala Siloyê Horê da dimînin. Peyra diçin nava Kurmancan û li nava Kurmancan dibin rênçberê Kolik. Peyra malbat tê Qereqela Baro û dikevin mereka Tecoyê Berîn û dibin golikvanê gund. Ûsib Begê Hesên Axa reîsê êla Hesenan e û li Sînekê dimîne. Bacê kom dike û destûr di destê wî da ye. Bavê Ereb diçe cem wî ji bo pasaporta xwe teze bike. Feqîrî û xizanî malbatê belawela dike. Birayê wî yê mezin Biro diçe Emençaîrê di

mala Mistê Mîrze da dibe rênber, Şemo li pey diçe jî venegare. Birayê din Dewrêş di nav pencên nexweşînekê da dihele û dimire.

Ereb ji bo xebatê diçe Qersê û peyra li Alêksandrovskê di fabrîqeya kevir da dixebite û Çîçek û Gogê tîne cem xwe. Gava Şerê Yekemîn yê Cîhanê dest pê dike, alayeke Qazaxan di payîza 1914an da li cem ciyê karî wî datînin. Erebb rojên din diçe û ji wan ra dixebite. Wexta pê dihesin Erebb bi zimanê Tirkî, Ermenîkî, Kurmancî, Yewnanî û Rûsî dizane di artêşê da dibe tercuman. Dema rêya Erebb bi gundê Qizneferê dikeve diçe mala mêrê meta xwe. Li wir dilê wî dikeve Karêya keça meta wî. Sefoyê bavê keçikê bi 150 manat -banqinot-, hesp û tivingekê keça xwe dide Erebb. Erebb di artêşê da tercumanîyê dike û qelenê Karê dide, lê peyra Sefo poşman dibe. Erebb û Sefo li ser meseleya qelen û Karê şer dikin, lewra Sefo qelen înkâr dike û Karê nade Erebb. Di xirecira di navbera Erebb û Sefo da tivinga Erebb diteqe û Sefo dimire. Leşker Erebb digirin û dibin, li ser îfadeya gundiyan serbest tê berdân û diçe ser karê xwe û di artêşê da tercumanîyê dike. Bi artêşe ra heta çiyayê Sîpanê Xelatê diçe.

Erebb piştî demekê dixwaze ji artêşa Rûsan derkeve û li ser destûra fermandarê xwe diçe Sînekê mala apên xwe Mîsto û Kalo. Demek li vir dimîne û diçe mala xwe ya li Sûsiza Qersê. Rewşa malbatê dîsa xirab dibe û Erebb diçe Sarîqamîşê di rêya hesin a Erziromê da dixebite. Li vir rastî Bolşevîkan tê û bi saya pirtûkan fikrên wan nas dike. Erebb di nav rêxistina Bolşevîkan da cî digire ya jê re dibêjin R.S.D.R.P. Erebb êdî wekî pêşengekî di nav karker û gundiyan da dixebite. Li Sarîqamîşê di mitînga dijî Çar da tê girtin. Demekê di girtîgehê da dimîne û ji bo xwe nede dest xwe li nezaniyê datîne. Piştî êşkenceyê serbest tê berdân û li ser pêşniyara hevalên xwe vedigere gundê xwe. Li vir jî dest bi propagandayê dike û tê binçavkirin. Xîzm û nas dikevin navberê, serbest tê berdân, vedigere cem malbata xwe û li wir jî jê ra rihetî namîne, diçe Tiflîsê.

Di vê navberê da li Ermenistanê Daşnak û li Gurcistanê Menşevîk bi alîkariya kesên dewlemend, leşker, burokrasî û axayan ji bo bibin desthilatdar hewl didin. Erebb ji Tiflîsê derbasî Stavropolê dibe û li wir li Bolşevîkan digere, bi wan ra dikeve têkliyê û peyra tevî “Artêşa Sor” dibe. Erebb li eniyê şer dike û di şerê bi Qazaxan ra sê caran birîndar dibe. Li nexweşxaneyê tê dermankirin û li wir tê girtin, rastî êşkenceyê tê. Erebb di sala 1918an da êdî endamê Partiya Komunîst e û dema li nexweşxaneyê tê dermankirin mizgînî jê ra diçe. Erebb piştî ji nexweşxaneyê derdikeve destûr hildide û

diçe serdana malbata xwe. Erebb dixwaze malbata xwe bibe Rûsyayê, lê bavê xwe qane nake. Erebb cardin vedigere eniya şer û di şerê li eniyên Kafkasyayê da cardin birîndar dibe. Li her derê tevlihevî heye û li herêmen Kurdan jî heman rewş dewam dike. Axa û begên heta do bi zîlamên Çar ra tevdigeriyan bi Daşnak û Menşevîkan ra hereket dikin û pergala berê diparêzin.

Di vê navberê da Şemoyê bavê wî bi destê leşkerên Osmanî bi lêdanê tê kuştin û diya wî direve Elegezê cem xwîşka xwe û li wir ji ber xelayê dimire.

Partiya Komunîst dest pê dike û di nav xelkê da fikra xwe belav dike. Partî di bihara 1924an da Erebb li Ermenistanê wezîfedar dike di nav Kurdan da bixebite. Erebb hewl dide Kurdan li dora Partiya Komunîst kom bike. Bi sazkirina pergala teze gundî û kesên feqîr û xizan şiyar dibin û li dijî axa û began derdikevin.

2.3. JI HÊLA TEKNÎKÊ VA ANALÎZEKE LI SER ŞIVANÊ KURMANCA

Wek cureyeke edebiyatê roman li ser “qalkirinê” ava dibe. Roman vegotîneke (vegêran)¹⁵⁹ honandî, yanê vegotîneke çêkirî ye. Eco derbarê “vegotîna tebiî” û “vegotîna çêkirî” da dibêje di vegotîna tebiî da bûyerên rast hene yan jî vebêjer bixwe bawer dike û dixwaze -bi rêya derewan- bi me jî bide bawerkirin tiştên qal dike qewimîne. Dema meriv tiştên do hatibin serê meriv vebêje ev dibe vegotîna tebiî. Di vegotîna çêkirî da jî honandin heye, yanê heqîqet bi rêya vegotîna û honandinê cardin tê afirandin.¹⁶⁰

Roman bi taybetiya xwe ya sereke ya li ser “honandin”ê ye tiştên ji heyatê digire li gor mantiqa xwe cardin ava dike.¹⁶¹ Metneke edebî ye xwe di qalibê çîrokekê da saz dike.¹⁶² Wek vegotîneke honandî û çêkirî roman li ser çi tê avakirin û çi di xwe da dihevine? Di vê mijarê da Nabokov wiha dibêje:

“Dema em behsa şiklê çîrokekê dikin qest û mebesta me çi ye? Yek ji qest û mebesta me teknîk e, yanê çîrokek çawa diqewime û çima filan û bêvan rêbaz hatiye tercîhkirin. Hilbijartina lehengan, nivîskar lehengan çawa emilandiye. Pêwendiya lehengan û mijarên wan yê cûrbecûr, rêbaz û têkiliya mijaran û

¹⁵⁹ Vegêran (narrative) ji helbestê cihêtir qala “çîrokekê” dike. Çîrokeke tê da leheng hene, li wan tiştê diqewime, ev rûdan di nav dem (zeman) û cîyekî (mekan) da pêk tê û ev hemû bi rêya vegêrekî (vebêjer) tên qalkirin. (Bnr. Remezan Alan, **Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern**, Stenbol: Weşanên Peywend, 2015, r. 115)

¹⁶⁰ Umberto Eco, **Anlatı Ormanlarında Altı Gezinti**, Kemal Atakay (wer.), İstanbul: Can Yayınları, 2012, r. 154-155.

¹⁶¹ Mehmet Tekin, **Roman Sanatı 1 Romanın Unsurları**, İstanbul: Ötüken Yayınları, 2016, r. 11.

¹⁶² Alan, **h.b.**, r. 116.

lihevhatina wan. Tevgerên curbecur yê çîrokê yê nivîskar dixwaze bandoreke rasterast yan jî nerasterast çêke û pêşkêş dike. Amadekirina bandor û çavdêriyan. Bi kurtasî em behsa berhemêke hunerî ya hatiye avakirin û honandin dikin. Ev teknîk e.

Dirûvekî din yê şîkil jî şêwe ye, yanê teknîk çawa dişixule. Şêwe terza nivîskar e, terzên curbecur û hîleyên wî yê taybet in. Heger şêweya nivîskar zindî be hêma û teswîrên çawa emilandiye û çawa diherike. Heger qiyasan dike şibandin û metaforên hacetên retorîkê ne û perçeyên wan çawa emilandiye û cihêreng û curbecur kiriye. Bandora şêweyê mifteya edebiyatê ye, mifteya efsûnî ya diçe Dickens, Gogol, Flaubert, Tolstoy û hemû hosteyên mezin û qerase.”¹⁶³

Beriya her tiştî roman li ser bingeha vegotinê li gor “leheng-zeman-mekan-bûyer”ê dikemile û bi şêwaza çîrokê qîmeteke estetîk digire. Meseleya vegotinê bi pêşkêşkirin yan jî neqilkirinê pêk tê û “vebêjer” çîrokê neqlî xwendevanan dike. Di romanekê da em pêşiyê dengê vebêjer dibihîzin.¹⁶⁴ Vebêjer hacetek e û ji bona qala çîrokekê bike heye.¹⁶⁵ Rêzkirina bûyerên di çîroka romanê da jî honandina bûyerê (rêzebûyer) nîşan dide.¹⁶⁶

Bi kurtasî her roman ji hêla teknîkê va ji hin taybetî û perçeyên li hev dikin pêk tê. Di romanekê da emilandina taybetî û perçeyan organîzasyon û teknîka romanê eşkere dikin. Helbet ev taybetî û perçe li gor naverok û terza her romanekê diguherin. Di romanekê da bi gelemperî vebêjer, honandina bûyerê (rêzebûyer), leheng, zeman û mekan hene. Dema ev hemû yan jî hin ji wan tîcîm hev û li gor naverok û terza berhemekê tîcîm sazîkirin zîman û şêwaza berhemê derdikeve meydanê. Mijara berhemekê tekûz û lihevhatî nebe jî tiştî di romanê da tê qalkirin ji hêla hunerî va tê guherandin. Şêwaz û huner di vir da ye û ji bo edebiyatê ya girîng jî ev e. Lê dîsa jî wekî Booth dibêje vegêran (vegotin) zanist nîne huner e, lê ev rewş nayê wê meneyê dema em rêgezên vegêranê formule bikin em ê bi ser nekevin. Di her hunerê da hêmanên sistematîk hene. Loma jî şîrove û rexneyên di vî warî da nikarin xwe ji li gor rêgezên sereke destnîşankirin û eşkerîna serkeftî û qelsîyan bidin alî. Lê divê em tim lêkolîn bikin û bipirsînin gelo rêgezên sereke di çî da ne.¹⁶⁷

Roman wek vegotineke nivîskî û çapkirî rewşa însanan û têkoşîna wan ya li hemberî jîyanê teswîr dike û helbet ev honandî û temsîlî ye. Roman dema rewşa însanan

¹⁶³ Vladimir Nabokov, **Edebiyat Dersleri**, Ayşe Lucie Batur-Fatih Özgüven (wer.), İstanbul: İletişim Yayınları, 2014, r. 176.

¹⁶⁴ Tekin, **h.b.**, r. 30-31.

¹⁶⁵ Tekin, **h.b.**, r. 69.

¹⁶⁶ Çetin, **h.b.**, r. 189.

¹⁶⁷ Booth, **h.b.**, r. 176.

û têkoşîna wan ya li hemberî jiyânê vedibêje dikare vê rasterast yan jî nerasterast bike. Dikare vê bi zimanê nesrê, helbestê yan jî dramayê bike. Dikare bi temamî li ser rastiye yan jî bi temamî li ser honakê bê avakirin. Dikare hay ji honaka xwe ya naverokî hebe jî û tunebe jî. Dikare li ser honandîna bûyereke (rêzebûyer) bimeşe jî û nemeşe jî. Dikare bi temamî li ser dinyayeke rasteqîn yan jî bi temamî li ser dinyayeke fantastîk û xeyalî û li ser dinyaya romanê bê avakirin. Dikare rastiya xwe li ser rastiyeke derûnî, razber û psîkolojîk jî ava bike. Dikare qala çîrokekê bike jî û neke jî. Dikare komîk, trajîk, satîrîk, lîrîk, epîk, parodîk û trajîkomîk be. Dikare vegotîneke exlaqî, polîtîk û îdeolojîk temsîl bike jî û neke jî. Di eynika dide ber rewşa însanan û têkoşîna wan ya li hemberî jiyânê da dikare cî bide teswîrên berfireh jî û nede jî.¹⁶⁸ Di vê mijarê da Alan wiha dibêje:

“Roman, vegotîna serboriya şexsan e û di vê pêvajoyê de destnîşankirina guherînên wan e. Du tiştên wê bivênevê ne: Bilêvkirina dinyaya derûnî û derveyî ya şexsan û merhale merhale çavdêrîkirina tekamûl an têkçûyîna wan! Ger qedera şexsî parçeyekî qedera giştî be, wê demê roman, warê ezmûneke yekpare (total) ye. Ew, daxwazek e ku xwezaya dinyaya biçûk (mîkrokozmos), di nav tevahiya dinyayeke mezin de (makrokozmos) qiset bike. Ahenga naverokî û rûxsariya romanê, li ser vê binyadê ye.”¹⁶⁹

Di heman mijarê da Watt jî dibêje, “Roman tenê qala tiştên li gor perspektîfeke edebî ne nakin, roman hemû cihêrengiyên di jiyana însanan da teswîr dikin û nîşan didin. Rastiya romanê di terza jiyânê ya nîşan dide da nîne, di terza nîşandana wê heyatê da ye.”¹⁷⁰

Bi gelemperî du taybetiyên sereke yên romannûsan hene: Romannûs tişt û bûyerên qewimîne ji xwe ra dikin mînak û li gor wan terzekê diemilînin. Wek mayîn di dinyayeke xeyalî da ya bi destê xwe çêdikin, bûyer û kesan diafirînin û li gor terz û kêfa xwe dihonin. Ji ber vê jî meriv dikare bibêje roman di navbera rastî û xeyalan da ye û cureyeyeke edebiyatê ye bingeha xwe ji rastî û xeyalan distîne. Bi gotîneke din heyat tevlihev e, hev nagire, nakokî û hûrgiliyan di xwe da dihewîne û pêvajoyeke bê ser û bê ber e. Loma jî romannûs tiştên ji heyatê digire bi rêbaza hilbijartin, tekûzkirin û honandinê dike form û terzekê û meneyekê lê bar dike.¹⁷¹

¹⁶⁸ Antakyalıoğlu, **h.b.**, r. 25-26.

¹⁶⁹ Remezan Alan, **Folklor û Roman Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn**, Stenbol: Weşanên Peywend, 2013, r. 87-88.

¹⁷⁰ Watt, **h.b.**, r. 11.

¹⁷¹ Aytür, **h.b.**, r. 18.

Di çarçoveya agahiyên navborî da romana *Şivanê Kurmanca* ya Erebê Şemo ji hêla vebêjer, honandina bûyerê, leheng, zeman, mekan û ziman û şewazê va hatiye analîzkirin û teknîka vegotinê ya di berhemê da hatiye eşkerekirin.

2.3.1. Vebêjer

Roman li ser “çîrok” û “vebêjer”ê çîrokê neqil dike ava dibe.¹⁷² Loma jî vebêjer perçeyekî romanê ye û vegotina romanê eşkere dike. Vebêjer ew kes e di navbera nivîskar û xwendevan da dibe “navbeynkar” û tîkiliyekê datîne. Yanê hêmaneke roman yan jî çîrokê ye bûyer, diyarde yan jî rewşekê neqlî xwendevan dike.¹⁷³ Di berhemên edebî yên li ser vegotinê tî avakirin da gelek girîng e çîrok ji devê kê tê qalkirin û bi kîjan armancê tê gotin. Vebêjer bersiva pirsên rêzebûyer û perçeyên wê yên zeman, mekan û leheng ji çavên kê tî dîtin û bi devê kê û ji kê ra tî qalkirin dide. Di romanên da vebêjer bi gelek awayan derdikevin pêşberî xwendevan. Di vê mijarê da James Wood wiha dibêje, “Gelek şibakeyên mala çîroksaziyê hebin jî tenê du yan jî te negot sê deriyên wê hene: Meriv dikare çîrokekê bi şexsê sêyem, bi şexsê yekem û heta mînakên wê yên serkeftî kê bin jî bi şexsê duyem yan jî bi şexsê yekem yê pirane neqil bike û hemû mesele ev e.”¹⁷⁴

Di behsa vebêjer da mijareke din jî “rewşa vebêjer” e. Lewra rewşa vebêjer di heman demê da bi “rewşa vegotinê” ra tîkildar e. Wek mînak rewşa vegotina îlahî, rewşa vegotina şexsê yekem û rewşa vegotina figûral. Rewşa vegotina îlahî ew vegotin e vebêjerê wê şirove û midaxeleyan dike, agahiyên berfireh dide. Xwediyê otorîteyê berfireh e û dinyaya vegotinê û lehengan baş dizane. Di vê vegotinê da xalên nîşandanê hebin jî beş bi giranî tî qalkirin. Di rewşa vegotina şexsê yekem da vebêjer di heman demê da lehengekî çîrokê ye. Bûyeran tecrûbe dike yan jî dibe şahidê wan. Di vê vegotinê da qalkirin hebe jî bêtir nîşandan heye. Rewşa vegotina figûral di navbera herdu rewşên navborî da sentezek e. Wekî vegotina îlahî bi devê şexsê sêyem qal dike, lê wek vegotina şexsê yekem bi çavê lehengekî bûyeran li ber çavên me datîne. Vebêjer dev ji midaxele û otorîteya berfireh berdide û hebûna xwe vedişêre.¹⁷⁵

¹⁷² Tekin, **h.b.**, r. 21.

¹⁷³ Alan, **Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern**, r. 117.

¹⁷⁴ James Wood, **Kurmaca Nasî İşler?**, Ekin Bodur (wer.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2010, r. 17.

¹⁷⁵ Alan, **h.b.**, r. 122.

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da cî daye vebêjerê şexsê yekem û şexsê sêyem. Lê di piraniya romanê da şexsê yekem hatiye bikaranîn. Di destpêka *Şivanê Kurmanca* da vebêjer şexsê sêyem e, lê piştî qala Şemo û zarokên wî tê kirin vebêjer diguhere. *Şivanê Kurmanca* bi devê şexsê sêyem wiha dest pê dike û qala Şemo, rêwîti û derketina wî ya ji Surmeliyê tê kirin:

“Şemo kurmancekî kesîb bû, ji êla Hesena (Hesiniya) bû. Diçû ber dewarê xelqê, li qeza Surmeliyê berê ew qeza tev welatê Rewanê bû. Wextê jina wî pêşîn mir, ewî herdu kurê xwe Biro û Dewrêş hildan û ji qeza Surmeliyê derket, lêda çû. Şemo rêda gelle çetinî dîtin, çimku barbirê wî tunne bû, -ewî herdu kurê xwe hildigirtin, yek dida piştê xwe, yê dinê jî dida ber dilê xwe -Biro wî çaxî sê salî bû, lê Dewrêşî du salî bû. Qet tiştêkî wî idî tunne bû, xên ji lihefeke kevin.

Rêda, gava tarî diketê erdê, xwe didane ber dîwara û qefê zinara. Alîkî lihefê bin zar ra dikir, aliyê dinê jî davîte ser wan, wekî zar serma nekin. Xwe jî bi kincê xweva radiza. Rojêd hewa sar bûya Şemo sibê-şebêqê radibû, sergîn top dikir, kurma êgir lê dikir. Zarê wî xwe ber êgir germ dikir. Paşê dîsa rê diket diçû. Rêda, nava gunda, xwera nan berev dikir; ussa îdarê xwe û zarê xwe dikir, hetta hat, derketê welatê Qersê, gundê huruma, Azatê.”¹⁷⁶

Ji vir bi şun da vebêjerê romanê diguhere. Êdî yê vedibêje û qal dike Erebbixwe ye, yanê şexsê yekem e. Erebbixwe qala bîranîneke xwe dike û wiha dibêje, “Carekê, êvareke zivistanê, em tev dora tendûrê rûniştibûn. Pak tê bîra min, -bavê min me ra gilî dikir û wa digot: - Êvar bû. Baraneke hûr dibarî. Bakî sar jî pêra dihat. Ez zarava, em şil bibûn û serma dikir: Em hatne kêleka gundekî. Ew gund Azat bû...”¹⁷⁷ Di berdewamiyê da em çîroka hatina Şemo ya li gundê Azatê ji devê şexsê yekem (Ereb) cardin hîn dibin û qal dike bi rê da çî hatiye serê Şemoyê bavê wî.

Di *Şivanê Kurmanca* da rewşa vegotina şexsê yekem serdest e. Lewra di *Şivanê Kurmanca* da vebêjer di heman demê da wek leheng hatiye pêşkêşkirin. Di romanên bîngeha xwe ji otobiyoğrafîyê distînin da vebêjer û kesê behsa wî tê kirin heman kes in.¹⁷⁸

“Roja ewline ez ku hatme dersxanê, ez ecêbmay mam -wan sifetêd dîwarada dardakirî. Çi li wan sifetada hebû tunne bû! Teyr-tu, dabe, gur, mêşmor, kartêd geografîyê, yê kum in qe tiştê wan kartada fam nedikir, lê dîsa min hiz ji wan kaxeza jî dikir.

Lê gerekê ez bêjim, -rex wan sifetêd rind, sifetekî way nerind darda kiribûn. Ew sifet gava ku min didît, ez ditirsîyam. Sifet xwe-xwe mîna şiklê merîya bû: çavne mezine kûr, pozî kort, qafê wî rût, movikê hestûyê canê wî yeko-yeko duxanê bûn, tilîyê lingê wî yan tilîyê destê wî ussa dirêj bûn, -meriv tirê- tilîyê

¹⁷⁶ Şemo, **h.b.**, r. 53.

¹⁷⁷ Şemo, **h.b.**, r. 54.

¹⁷⁸ Tekin, **h.b.**, r. 60.

şahba, çewa mera çîrokada, kala digot. Canê wî sifetê dardakirî, qe goşt lê tunne bû. Xwelese, gava ku meriv didît ziravqetîyay dibû. Rastî, min tirê-ew sifetê cinane yan ye “şahba” ne, çimku cara kala wextê zivistanê mera gelle çîrok digotin û wan çîrokada gilîyêd ussa tirs hebûn. Gava ku ez dihatim rex wî sifetî, sawê canê min digirt, ez direvîyam, dûr-diketim. Lê wextê min tenê otax paqij dikir, ricafê canê min digirt, ez bera zû derbaz dibûm. Ez gellekî jê ditirsîyam. Min cara dikir, ku pirs bikim-ev çî tevaye, lê min şerm dikir, nedipirsî. Wexta ders kutta dibûn, hine zar dersxanêda diman; min dîda xwe dizîkava dida wan zara, min, didît, -ewana qe jî wî sifetî natirsin, bera derbaz dibûn, qe xema wan nîne.”¹⁷⁹

Wekî di jêgirtina li jorê da jî tê dîtin vebêjer di heman demê da leheng e. Xwendevan her tiştî li gor vebêjer-leheng dibînin. Serlehengê romanê nivîskar bi xwe ye û bi rewşa vebêjer-leheng serboriyeke xwe vedibêje. Ji bona bûyer hatiye serê nivîskar tecrubeya xwe bi zelalî jî xwendevanan ra dibêje. Çi dibîne, çî hîs dike û çî difikire û heta nirxandin û şiroveyan jî bixwe dike.

Di *Şivanê Kurmanca* da hin caran vegotina şexsê sêyem bê leheng hatiye bikaranîn. Lê ew deng jî dengê nivîskar bi xwe ye. Wek mînak, “Rastî, bega, şêxa, daşnaka û mella halê kurmancê kesîb zaf pejmûrde kiribûn. Malê wan zorê jê distand. Wekî yek nexweş diket, Cangîr-axa yan Egît-begê diçû, malê wan talan dikir, danî.”¹⁸⁰ Di dereke din da ev rewş wiha derdikeve pêşberî me, “Rastî, her înglaba Oktyabrê û dîwana şêwrê zulma patşê Nîkaleyî xûnxur, zulma bega, şêxa, axalera û mella, zulma daşnaka ser gundîyêd xebatçî dane hildanê. Gundîyê xebatçî, kesîb û batrak idî zanin-şêx, melle, beg û axaler dijminê wanin. Wekî roja bê lazim be, ewê hazir ber dîwana şêwrêda xûna xwe birêjin.”¹⁸¹

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* de wekî serleheng cî digire û wek vebêjer jî hakimî bûyerên di romanê da ye. Loma jî di *Şivanê Kurmanca* da rewşa vegotinê piralî nîne. Her çiqas di beşa dawîn ya romanê da dora xeberdanê bide hin kesên din jî di tevahiya romanê da ev yek nehatiye ceribandî û rewşa vegotinê yekalî ye. Lê dîsa jî ji bona *Şivanê Kurmanca* ya piştî xwe dide otobiyografiya nivîskar rewşa vebêjerê şexsê yekem di cî da ye û li metnê tê.

2.3.2. Honandina Bûyerê (Rêzebûyer)

Cureyên wekî roman û çîrokê bêtir ji hêla xwe ya çîrokbêjiyê va di hişê meriv da dimînin. Roman li gor naveroka xwe qala çîrokekê yan jî gelek çîrokan dikin. Li gorî

¹⁷⁹ Şemo, **h.b.**, r. 86-87.

¹⁸⁰ Şemo, **h.b.**, r. 191.

¹⁸¹ Şemo, **h.b.**, r. 198.

Forster “çîrok” bingeha romanê ye. Li gorî wî heger di romanê da çîrok tunebe roman jî tune ye û ev jî taybetiyeke hevbeş ya romanan e.¹⁸² Çîrok bi pênaseyeke sade li gor demê rêzkirina bûyeran û qalkirina wan e. Rêzebûyer jî ew şema ye di encama rêzkirina bûyeran da derdikeve meydanê.¹⁸³ Di naverok û navenda hemû roman û çîrokan da çîrokeke ji rêzebûyeran pêk tê di digire. Di vê behsê da tespîteke navdar ya Forster heye. Dema meriv bibêje “Qral mir û dûra jî qralîçe mir” ev dibe çîrok, lê dema meriv bibêje “Qral mir û ji kerba wî qralîçe jî mir” ev dibe rêzebûyer.¹⁸⁴ Ferq û têkiliya van herdu têgehên li ser vê bingehê ye. Çîrok rêzkirina kronolojîk ya bûyeran e. Dikare li ser xeteke rast jî bimeşe, dikare xwe biavêje demên berê yan jî yê dahatûyê. Yanê dikare hûr hûr jî behs bike, dikare bi kurte û sinopsîsan jî. Lê rêzebûyer binyada sebebî ya çîrokê ye. Çîrok li çîrokên din diqelibe û wekî gilokeke berfê mezin dibe.¹⁸⁵

Wekî berê jî hat gotin her roman behsa tiştêkê dikin, yanê roman li ser kesê dibêje û li ser tiştê tê gotin ava dibe. Vebêjer amûrek e û ji bona qala mijarekê yan jî çîrokekê bike, heye. Bûyer bi meneya xwe ya ferhengî ew tişt e diqewime. Romannûs jî romana xwe li ser tiştên diqewimin û tiştên dibe biqewimin ava dike û dihone. Bûyer perçeyekî ji jiyanê ye em dijîn, rast lê tîn û ihtimal heye em bijîn.¹⁸⁶ Loma jî romannûs bi saya ziman li gor armanca xwe bûyerê yan jî çîrokê cardin ava dike û dirûvekê dide wê. Forster derbarê honandina bûyerê da dibêje bûyer li gor têkiliya di navbera sedem û encamê da tîn vegotin.¹⁸⁷ Forster di berdewamiyê da derbarê taybetiyên honandina bûyerê da dibêje divê honandina bûyerê sade û resen be, wexta tevlihev û di nav hev da be jî divê hemû perçe bi hev ra têkildar bin û li hev bikin.¹⁸⁸ Lewra qewimîna çîrokekê naveroka honandina metneke hunerî eşkere dike.¹⁸⁹ Helbet di vir da armanc ew nîne qala hemû bûyeran bê kirin, armanc ew e li gor naverokê bûyer bîna rêzkirin û di nav disiplînekê da li hev bikin û ji hev nebin. Bi kurtasî divê bûyer li gor armancekê bîna rêzkirin û helbet bi rewşa lehengan û atmosfera romanê ra li hev bikin.

Erebê Şemo romana xwe ya *Şivanê Kurmanca* ji 21 beşan pêk aniye û ji her beşê ra jî navek daniye. Ev nav dibe naverok û navenda vê beşê û bala xwendevanan ji

¹⁸² E.M. Forster, **Roman Sanatı**, Ünal Aytür (wer.), İstanbul: Adam Yayınları, 1982, r. 64.

¹⁸³ Tekin, **h.b.**, r. 76.

¹⁸⁴ Forster, **h.b.**, r. 128-129.

¹⁸⁵ Alan, **h.b.**, r. 124.

¹⁸⁶ Tekin, **h.b.**, r. 69.

¹⁸⁷ Forster, **h.b.**, r. 128.

¹⁸⁸ Forster, **h.b.**, r. 130-131.

¹⁸⁹ Nabokov, **h.b.**, r. 176.

bûyera giştî ya di romanê da dikşîne ser bûyera di nav beşê da. Her beş di nav xwe da blokeke demê ye. *Şivanê Kurmanca* him bi zimanê xwe û him jî bi şêwaza rêzebûyerê rengê bîrnameyekê dide.¹⁹⁰ Di *Şivanê Kurmanca* da otobiyografi, dîroka malbatê û vegotina romankî di nav hev da ne.¹⁹¹ Bîranînên nivîskar beşên sereke yê romanê pêk tînin.¹⁹² Rewşa malbatê, salên zarokatiyê, şivanî, xortanî, şer, tevgerên siyasî û xwenasîna di *Şivanê Kurmanca* da şopa *bildungsromanê*¹⁹³ nîşan dide.¹⁹⁴

Di *Şivanê Kurmanca* da bûyer bi gelemperî bi awayekî kronolojîk diqewimin. Roman bi derketine Şemo ya ji qezaya Surmeliyê destpê dike û peyra ji devê Erebe kurê Şemo bûyer tînin gotin, lê di tevn û honandina metnê da hin derz û qelş çêdibin. Mînaka herî berbiçav di beşa “Merkeba me. Rêncberîya nava melegana” da derbas dibe. Ber bi dawiya vê beşê va Erebe qala Cewoyê Pîr-Kal dike:

“Yek ji wan gavana, pak tê bîra min, -Cewoyê pîr-Kalê jêra digotin, hineka jî digot Pîr-Cewo. Her ji gavantîyê, xwe-xwe dixebitî belengazî didît, serê xwe xwey dikir. Ew jî, notla bavê min, dibû nedibû, derê xelqêda û rêncberîyê serê xwe xwey dikir.

Hevalê bavê min bû: orta wî û bavê min zaf xweş bûn. Şevêd zivistanê dirêj dihate mala me, ber tendûrê rûdinişt, ji emrê xwe, dîtina xwe mera gilî dikir. Carna jî mera çîrok digotin. Me teva jê hiz dikir. Merîkî rastgo, dilsax û hurmet. Em qe jê nedixeydîn., wekî cara guhê me, zara digirt, dikişand, wekî em, zar hevekî ker bin, bihêlin mezin dengê hev bibhên. Ew xwe hê saxe li gundê Camûşvana mezindane nehîya Axbaranêdane. Wextê ez dîtîm, ecêmayî ma û biken kire bîra min, got:

-Tê bîra te, çewa li çolê ber dêwêr û malda min guhê te dikişand, tu hîni merîfetê dikirî.

Ji we şunda çend glîyê din jî serda zêde kir, got:

-Gelle emekê min li te heye, hûne zar bûn, pênc-şêş heb bûn, stûyê bavê xwe dabûn, heqê bavê we jî tîra xwarîna we nedikir, min na danî çolê, dida te, wekî tu birçî nemînî...lê niha tu mezin bûy, bûyî mezinê me, kurmanca. Ez zaf şame, wekî me gavana jî merî der dikevin...

Min jê pirsî, -qe halê wî çîye, çewa derbaz dike. Caba min da, got: Erebe, wextêke zaf rind hatîye dunîyayê. Eva wexta eynî wexta me kesîbane., wexta gavanane, lê tale bextra, ez idî kalim, tu xebat min nabe. Xelq xêra dê bavê xwe parî nan dide min. Ez îdarê xwe pê dikim.

¹⁹⁰ Yılmaz, **h.b.**, r. 101.

¹⁹¹ Christin Allison, “Otobiyografi, Serborî û Romana Kurdî: Erebe Şemo û Peyrewên Wî”, **Wêje û Rexne**, j. 2, (2014), r. 139.

¹⁹² Ahmedzade, **h.b.**, r. 20.

¹⁹³ *Bildungsroman* herî zêde di sedsala 19an da hatine nivîsandin. Di nav cureyên romanê da herî zêde ev cure vegotina kronolojîk di xwe da dihevine. Ji zarokatiyê -bi gelemperî kesên sêwî- heta kamîlbûnê qala pêvajoya pêşketina ferdan dike. Di vê pêvajoyê da lehengê romanê bi çî ra rû bi rû dimîne, çî tê serî û çî tercîh dike wekî çîrokeke îbretê tê qalkirin. Mînaka wê ya ewil *Wilhelm Meisters Lehrjahre* ya Goethe tê qebûlkirin. (Bnr. Parla, **h.b.**, r. 105-259-260.)

¹⁹⁴ Remezan Alan, “Bextewariya Îdeolojîk”, **Pelîn**, j. 2, (1999), r. 112.

Hevekî ker bû wa, duşurmuş bû, benzê wî wa xirab bû, hêsir ji çava hatin, grîya. Ez ber dilada hatim, min nehişt bigrî. Lê dîsa şa bû, got:

-Xwezla ewa dîwana wexta eme kesîbbûnêda bû û çetînyêda bûn, wî çaxî bihata, minê çîqa kûlak hebûna bi destê xwe qir bikirana.”¹⁹⁵

Ereb dema qala rênçber û gavanên Meleganan dike hê di vegotina dewra zarokatiya xwe da behsa Pîr Cewoyê hevalê bavê wî ye dike. Cewo êdî kal bûye û li gundê Camûşvana Axbaranê dimîne. Cewo û Erebbê qala rojên berê dikin û Cewo serfiraz dibe ji nav Kurmancan kesekî wekî Erebbê derketiye û dibêje êdî her tişt baştir e li gor berê. Heta vê derê rêzebûyer li pey hev diherike. Lê Şemo ji zarokatiya xwe gav diavêje ciwaniya xwe. Di vê rewşê da rêzebûyer xera dibe.

Di *Şivanê Kurmanca* da di navbera beşên “Kulfetê me. Zarotîya min”, “Merkeba me. Rênçberîya nava melegana”, “Gur nav pêz ket. Hicûma gura”, “Çî terane vîlke”, “Xwendina ewlin. Mêtrîka min”, “Hukum”, “Nava kurmancada. Biharê li dolgê”, “Li zozana”, “Mijûlîya me”, “Hazirkirina hasil”, “Li dagerê. Rojêd ezîze paîzê-beranberdan” û “Pezê undabûy. Mirina birê min” da hevgerêdaneke xurt tune ye û pîrî caran lezûbezek heye. Lazimî û nelazimiya bûyer û bîranînan ji hev nayên cihêkirin. Hin bûyer bi kurtasî tîr derbaskirin û hin bûyer jî bêyî li tevn û honandina metnê bîr bi berfirehî tîr qalkirin. Wek mînak di beşa “Kulfetê me. Zarotîya min” da qala hatine Şemo ya ji qezaya Surmeliyê, şivantî û gavantiya malbatê tîr kirin, lê zawaca wî bi kurtasî tîr derbaskirin:

“Bavê min eynî wî gundê hurumayî Azatêda, xût mala wî hurumîda, bû rênçber. Navê wî Todor bû. Li wî gundîda yeke kurmanc hebû. Bavê min zewicî, ewa kurmanc sitand.

Dîya min diçû, mala da dixebitî; hirî dişûşt, şe fikir, dirist, tevn çê fikir û şixulne mayîn dikin. Çend zar ketne destê dîya min. Xûşkê min Çîçek, Gogê û ez, Erebbê.”¹⁹⁶

Di hin beşan da derbarê gundê lê dimînin yan jî teze diçin da agahiyên berfireh tîr dayîn. Beşa “Merkeba me. Rênçberîya nava melegana” yek ji wan beşan e. Erebbê Şemo li vir bi berfirehî qala gundê Komesorê dike. Kê ava kiriye, lê çî tîr çandin û baweriya wan çî ye:

“Ew gundê ku em çûnê, navê wî gundî hê berê, wexta Romêda, jêra digotin Komesor, lê teze hatîyêd ûrisa, melegana navê wî gundî danîbûne Alêksandrovsk, bi navê bavê padşê hatîbû avakirinê ew gundê teze. Ew gund ji şêherê Qersê hevt kîlometra dûr bû. Lê çî cîkî zaf kaw hatîbû avakirinê, ser çemê Qerseçayê, wî

¹⁹⁵ Şemo, **h.b.**, r. 65-66.

¹⁹⁶ Şemo, **h.b.**, r. 55-56.

welatîda idî çem ji wî çemî mezintir tunne bûn. Dora çem, hetta çav-çava dibirî, mêrg-çîmanê wan bûn, notla xalîçeke xemilandî, qîz xwera bixemilînîn-ussa tev tijî kulîlk dibûn; ji mêrga wêdatir zevî bûn, çargoşe, notla kvadrata şîn dikirin; cîna jî cewêd avê, nav sînorê wanra derbaz dibû. Rojêd havîna, wextê tavê dida wan cewa, şînayî û ava, cewa tev dibiriqîn, te tirê- zozanêd Eledaxêne xemilîne (...)

Melegana pak derbaz dikir. Erdê wanî pirî rind bû. Çiqas gundê melegana li welatê Qersêda hebûn, teve li erdê rind hatibûn avakirinê û serê nefera wan diket ji 5-hetta 8-dêsêd erd. Alîyê kûltûrayêda Alêksandrovsk ji gundê êrmenîya, tirka û huruma gellekî ferqîtir bû. Melegan ekincîne pire rind bûn (...)

Gundîyê Alêksandrovskê pare vedibûn ser du qebîla yan du taîfa: nîvî meleganê “postayanî” bûn, nîvî jî meleganê “prigûn” bûn. Eva her qebîleke wan ji hev dihatne kivşê her alîyê dînva; dêra wan û keşîşê wan ji hev başqe bûn.”¹⁹⁷

Di *Şivanê Kurmanca* da di beşên “Gur nav pêz ket. Hicûma gura”, “Çî terane vîlke”, “Xwendina ewlin. Mêtrîka min”, “Hukum” û “Nava kurmancada. Biharê li dolgê” da bîranîn, serborî û vegotina romankî di nav hev da ne, lê di beşên “Li zozana”, “Mijûlîya me”, “Hazirkirina hasil” û “Li dagerê. Rojêd ezîze paîzê-beranberdan”ê da vegotin û şewaz vediguhere teswîr û agahiyên bihûrgilî yên derbarê karê şivan û gavanan, jiyana li koçeriyê, derketin û vegera ji zozanan, edetên Kurmancan û beranberdanê. Di van beşan da nivîskar bi zimanekî sade qal dike, heta ji hêla emilandina ziman va beşên herî serkeftî yên metnê ne, lê ji bo lazimî û nelazimî ji hev nayên cudakirin honandina metnê çênabe. *Şivanê Kurmanca* ya ji bûyerên li pey hev rêzkerî pêk tê di van beşan da dev ji vê berdide. Wekî hat gotin mijarên hewce nakin dikevin navberê. Heger ev beş bîr derxistin wê berhem zîyanê nebîne.

“Em, dûajoyê şivana, şivanêd cahilê çolê gelle cara xwera dilîst. Me pezê xwe nêzîkî hev dikir û dilîst. Lîstka me govend bûn, kilam bûn û qeydê şivana bû. Lê wexta zêzê dilîst, kesek mira nedigihîşt –min ji teva dibir. Cara jî her yekî me danî beran berî hev didan; beranê kê zor didayê, ewî oyîn dibir. Ji lîstka tevî bîna me bi bilûrê derdiket, mer dor bi dor qeydê rind bilûrê dixist û bîna me pê derdiket, me rojbihêfîya xwe pê dikir. Ew lîstik me dizîkava dikir, wekî, xweyê pêz pê bihessîya, em dikutan, nedihîşt, wekî pez komî ser hev be, digotin pez wî çaxî xirab diçêre. Nava pêzda destekê me hebûn. Me ji wan destekê xwe hiz dikir.”¹⁹⁸

“Em diçûne çolê ber pêz, belengazî, birçîbûn didît, dewletîya ji xwera kêf dikirin, hasil digirtin.

Wexta pezê zayî dihate ber derê konê wan, çend jin û mêra pez didot, zara jî pez dida bêrîyê. Pez ku didotin, kuuta dikirin, berx berî mîya didan; pey wê yekêra berx kîs dikirin, ji mîya dûr dixistin. Şivan nanê xwe dixwar, diçû digihîşte pêz. Jina jî kûrmê êgir lê dikirin, şîr dikelandin penêr davîtne, qatix dimeyandin, lorik çê dikirin. Xebateke zaf bû û giran bû, ew xebat tev jinêd kesîba, gavana, şivana dikir, lê xanimê wan xwera sersarkî dikir, diçûn-dihatîn, dîna xwe didanê, miqat dibûn.

¹⁹⁷ Şemo, **h.b.**, r. 62-63.

¹⁹⁸ Şemo, **h.b.**, r. 105.

Nava kurmancada zaf guneye, wekî rûyê şîr bigrin, loma jî penêrê wan çê dikir, penêrekî zafî rind bû, bi rûn bû.”¹⁹⁹

Wekî beşên bi navê “Mijûlîya me” û “Hazirkirina hasil” yên li jorê hatine dayîn, ev beş di nav berhemê da beloq mane û dema bên derxistin jî ji bona berhemê kêmasî çênabe.

Di *Şivanê Kurmanca* da di nav beşên “Li şherda. Şerê Împêrîalîsta”, “Dilketin û destnîgarî”, “Li welatê Romêda. Kilama Sîyabendê Silêvîn û Xedcê”, “Xaîş dikim. Xwe nekine kifara gulla min. Vegerandina min li mal”, “Li firqêda”, “Li Ūrisêtê”, “Înglaba Oktyabrê”, “Şerê grajdanîyê” û “Dîsa nava kurmanca” da tevî hin derz û xisarên ji ber vebêjer û honandinê zêdetir li gor beşên berê têkiliyeke baş heye û li hev dikin. Helbet di navbera van beşan da têkiliya sedem-encamê baş çênebûye. Lê meriv dikare bibêje *Şivanê Kurmanca* di pêvajoya nivîsandina xwe da dikemile.

Wekî li jorê jî hat gotin *Şivanê Kurmanca* ji rêzebûyera yekzincîrî pêk tê. Di navenda hemû bûyeran da Erebe Şemo cî digire. Bûyer û leheng hemû li derdora wî diçin û tîn. Lê her çiqas romana *Şivanê Kurmanca* ji serî heta dawiyê ji serboriyên Erebe Şemo hatibin avakirin jî rêzebûyereke xurt di romanê da tune. Di *Şivanê Kurmanca* ya di bin beşan da hatiye sazkirin tiştên di beşa berê da hatibin gotin li paş dimînin. Têkilî û hevgerêdana wan domdarî nîne û bandora wan ya li ser beşa pêşiya xwe çênabe. Wek mînak dawiya beşa “Li şherda. Şerê Împêrîalîsta” wiha ye:

“Rêda kete bîra min wekî li Sarî-Bilaxê (Tendûrekê) gundê Qizneferê mêrê meta mine. Helal dimîne. Ez şa bûm, min lingê xwe sivik avêtin, wekî zû bêm, derkevme Tendûrekê. Berêda ez hînî çolê bibûm. Rojê qe xema min nînbû, her şevê tîrsa min ji daba bû.”²⁰⁰

Piştî beşa “Li şherda. Şerê Împêrîalîsta” diqede beşa “Dilketin û destnîgarî” wiha dest pê dike:

“Ez çend rojada silametî hatim, derketme Sarî-Bilaxê. Rojê ez rê dihatim, şevê jî min xwe dida birekêd zinara bilind, pelêd kevira tijî dora xwe dikirin, wekî dabe li min derkevin, ez dabara bi wan kovirava tîm şer. Ji Sarî-Bilaxê jî derbazbûm, çûme Qizneferê, mala Sefo. Mêrê meta min qet ez nedîtibûm. Her gava û rênçberê mayîn dihatin, salixa min jêra didan, wekî ez dixûnim û xortekî serwaxt ji min dertê. Mêrê meta min ez birme hundurê malê, bi eşq bi dil hate rûyê min, pîrsa mala me tevî kir, min yeko-yeko jêra got. Ewî ji min pîrsî derheqa xwendina min, min jêra gilî kir, çawa xwend, çawa ser zavoda pênzê dixebitîm.”²⁰¹

¹⁹⁹ Şemo, **h.b.**, r. 106.

²⁰⁰ Şemo, **h.b.**, r. 124.

²⁰¹ Şemo, **h.b.**, r. 125.

Her çiqas destpêka beşan bi dawiya beşa beriya xwe va hatibe girêdan jî ji aliyê bûyerê va hevgerêdaneke wan ya sedem-encamê nakeve ber çavan. Ereba di rê da neçar dimîne û ji nişkê va gundê meta wî tê bîra wî. Şa dibe û gavên xwe dilezîne. Bi şev ji êrîşa heywanan ditirse. Dema dest bi beşa nû dike gav diavêje ser xwendekariya xwe û hal û rewşa malbata xwe. Êdî qala zor û zehmetiyên rêwitiya xwe nake. Di rêwitiyê da bi şev ji ber tirsê ranezaye. Şeva digihîje mala meta xwe dema radize gelo çî hîs dike qet nabêje. Heger qal bikira me yê bigota li mala meta xwe xeweke xweş kiriye û wê di navbera beşan da peywendiyê xurt çêbûya.²⁰²

Di *Şivanê Kurmanca* da bi gelemperî hebûna beşan û destpêk û dawîn bi zanebûnek nehatine danîn û belawela ne. Jixwe di çisekirina serpêhatiyan da jî lezûbezê heye. Ev jî du xisaran dide vegotinê: Ji ber lezûbezê lehengên romanê bi awayekî kûr nayên danasîn û lazimî û nelazimî ji hev nayên veqetandin. Wek mînak di beşa “Li welatê Romêda. Kilama Sîyabendê Silêvîn û Xedcê” da bêyî li naveroka beşê were Erebe Şemo cî dide çîrok û kilama Sîyabend û Xecê. Wekî hat gotin ji ber lezûbezê lehengên romanê bi awayekî kûr nayên danasîn. Di *Şivanê Kurmanca* da tehlîlên psîkolojîk tunene û heta ya Ereba bixwe jî tune. Lewra dema qala mirina Derwêşê tê kirin û yan jî mirina dê û bavê xwe dibihîze tu bertek nîşan nade. Hestên wî tunene û tenê bi kurtasî tê behskirin:

“Dewrêşê birê min her-ro digot:

-Ez nexwaşim, sere min dêşe, dilê min jî dewerime.

Ro bi ro Dewrêşê paşda diçû, nikaribû pey dêwêrê saskar bibe. Belengazî himangî dêwêrê kaş dibû. Axrîyêda kete nav cîya. Bavê min gelle du-dermana gerîya, nebû tiştekî. Rojekê bavê min çû, gazî hekîmekî kir, anî. Ewî pezek da kirîne, şerjêkir, Dewrêşê avîte postê peze. Dewrêşê dîsa silamet nebû.

Wextê heqê kutta bû, me golik û qorê wan nava gund belakir, heqê xwe ji nava gund top kir, stand. Wê paîzê em ji mereka Teco der ketin, hatne, ketne koxê Şûme-Korê. Zivistanê şewata me kêmbû, Dewrêşê ji sermê mal teyax nedida, diçû, dikete tewla Mîrzê Xudoyê Berîn, xwe germ dikir. Cara ez jî pêra diçûm. Min Dewrêşê zaf hizdikir.

Kete zivistanê. Dewrêşê mir. Bavê min û dîya min gelle şîn û girî kirin, lê tu feyda nekir.

Dewrêşê birin, heq kirin, xêra wî dan.”²⁰³

²⁰² Yılmaz, **h.b.**, r. 100-101.

²⁰³ Şemo, **h.b.**, r. 117.

Wexta di sala 1924an da Ereb tê Rewanê ji bona li ser daxwaza partiya xwe di nav Kurmancan da bixebite wiha qala mirina dê û bavê xwe dike û tu hestên wî di vir da jî tune: “Ez çûm. Min xûşka xwe Gogê li wêderê dît. Goga xûşka min, ji mira gilî kir, wekî bavê min kuştin, diya min jî xelayêda ji birçiyana mir. Em gellekî ser hevda girîyan, lê bê feyda bû...”²⁰⁴

2.3.3. Leheng

Lehengên -ha însan ha eşya- di romanekê da yek ji perçeyên sereke yên alema romanê ya honandî ye.²⁰⁵ Loma jî roman li gor kes (însan) û tiştên nasnameya kesan hildigirin ser xwe şikil digire²⁰⁶ û lehengên di romanekê da tînan karakterîzekirin.²⁰⁷ Li gorî Remezan Alan peyva li vê kategoriyê tînan “avakirin”, “çêkirin” yan jî “wergirtin” nîne, “afirandin” e. Lewra xwediyê kaînatê Xwedê be, yê karakterên çîrokê jî nivîskar e. Ew malê nivîskar in û efendiyê wan ew e.²⁰⁸ James Wood derbarê karakter da dibêje di eslê xwe da bi navê “karakterê romanê” tiştêk tune, bi hezaran însanên cuda hene: Hinek tevlihev, hinek dûz, hinek kûr, hinek karîkatur, hinek bi awayekî realîst hatine resimkirin, hinek bi temasên mînor hatine afirandin.²⁰⁹ Forster lehengên romanê wek kesên “dûz” û kesên “gilover” dabeş dike. Ji kesên dûz ra di heman demê da “tîp” û “karîkatur” jî tînan gotin. Li gorî Forster tenê wesf û fikreke kesên dûz heye. Dema ji yekê zêdetir wesf li wan bar bibe dibin kesên gilover. Meriv zû wan nas dike, di bin kontrola nivîskar da ne. Komîk in, lê balkêş nînin û meriv ji wan naheyire. Lê yê gilover zû bi zû nakevin bin kontrolê, tevlihev in û dema derdikevin meydana meriv ji wan diheyire.²¹⁰ Wood jî di şûna kesên dûz û gilover da du tînan nînin pêşniyaz dike: Kesên “şefaf” û kesên “mat”. Kesên şefaf nispî basît in û yê mat jî nispî ecêb û balkêş in.²¹¹ Lê bi gelemperî lehengên di romanekê da wek serleheng, karakter, fîguran û tîp ji jiyane derbasî romanê dibin.²¹²

²⁰⁴ Şemo, **h.b.**, r. 188.

²⁰⁵ Doç. Dr. Hüseyin Gümüş, **Roman Dünyası ve İncelemesi**, Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları, 1989, r. 141.

²⁰⁶ Tekin, **h.b.**, r. 81.

²⁰⁷ Tekin, **h.b.**, r. 88.

²⁰⁸ Alan, **Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern**, r. 133.

²⁰⁹ Wood, **h.b.**, r. 75.

²¹⁰ Forster, **h.b.**, r. 108-109-113-114.

²¹¹ Wood, r. 87.

²¹² Tekin, **h.b.**, r. 110.

Şivanê Kurmanca romaneke otobiyografîk e û serlehengê romanê Erebe Şemo, yanê nivîskar bi xwe ye. Jixwe di destpê da û di hin beşên din yê romanê da navê xwe bilêv dike: “Dîya min diçû, mala da dixebitî; hirî dişûşt, şe dikir, dirist, tevn çê dikir û şixulne mayîn dikin. Çend zar ketne destê dîya min. Xûşkê min Çîçek, Gogê û ez, Erebe.”²¹³

Di *Şivanê Kurmanca* da hejmara kesan zehf e, lê di metnê da bi hûrgilî nayên nasandin û dernakevin pêş. Tehlîlên psîkolojîk yê kesan jî di berhemê da tune, heta ya Erebe bi xwe jî tune. Meriv derbarê avakirina lehengan ya di *Şivanê Kurmanca* da dikare bibêje ji legengan bêtir kesên dekoratîf hene û hin ji wan wek figur û “tîp” derdikevin pêşberî me. Kesên di romanê da bi nav û nasnavên xwe yan jî bi karê xwe tên zanîn û bi kurtasî tên derbaskirin. Tenê bi agahiyên kî ne û çî dikin tên nasandin. Wek mayîn di nav çîrokê da cî nagirin û bi hûrgilî nayên honandin. Wek mînak hin kesên di romanê da bi gelemperî bi van taybetiyên xwe hene: Todor di romanê da xwediyê merekê ye, Şemo xulamî û rênçberiya wî dike û Hurum e. Pablê Trîandafilov aşekî wî heye û gelek dewarên wî hene, kurekî wî “afitsêr” e, yanê zabitê eskeran e. Cewoyê Pîr hevalê bavê Erebe e, li nav Meleganan rênçberiyê dike, jê ra Kalê yan jî Pîr-Cewo dibêjin. Paraşa jineke Meleganan e, wekî jinên din yê Meleganan nîne, ji Erebe zehf hez dike û dilrehm e. Sîlvoyorst keşeyê herî mezin yê Meleganan e, Erebe şivantiya wî dike û kesekî neyînî ye. Îvan gundî jê ra dibêjin Darço, Erebe li dewarên wî dinihêre. Gogê û Çîçek xwîşkên Erebe in. Marûsîya keça mamosteya gund e, yeka dilovan e û di xwendinê da alîkariya Erebe dike. Şemoyê Adî bavê Erebe e û şivan û gavantiyê dike. Eslên merivekî pak e. Kelhan obebaşî ye. Êsîb Begê Hesên Axa reîsê êla Hesênan e, li Sînekê dimîne, bacê kom dike û destûr di destê wî da ye. Derwêş û Biro birayên Erebe in. Karê hezkirîya Erebe e. Sefo bavê Karê ye. Cimşût apê Karê ye. Klîmov, Mîxaîlov û Popov paleyên bolşevîk in. Earîf kurê Qelender e. Kornîlov serbaz e. Topûnov katibê firqa bolşevîkan e. Dewrêşê kurê Êboyê Rizgê, Mirazê kurê Feqîr Namoyê, Şekir û Ordî ciwanên Kurmanc in û Erebe wan tevî artêşa sor dike. Cindiyê Êso û Morovê Emo di xebatên nav Kurmancan da alîkariya Erebe dikin. Serbaz Markov, Kolêdîn, Serbaz Şkûro û Alêksêv dijşoreşger in. Bûdyoniy Qazax e û bolşevîk e. Şpak di artêşa sor da wezîfedar e. Êsîb Beg, Cangîr Axa, Egîr Beg, Mecîr Beg, Elîxan Beg û hwd. di romanê kesên dewlemend in û bi awayekî neyînî tên qalkirin.

²¹³ Şemo, **h.b.**, r. 55-56.

Ereb Şemo ji zarokatiyê heta ciwaniya xwe kesên wî ew nas kirine û dîtine di *Şivanê Kurmanca* da cî daye wan û wek şexs behs kiriye. Erebe Şemo di malbateke feqîr da mezin bûye û malbata wî li gundan maye. Loma jî piraniya kesên di romanê da kesên gundî yan jî ferdên eşîrê ne. Di nav wan da pale, cotkar, şivan, golikvan, serokeşîr hwd. hene. Dema Şerê Cîhanê da gelek kesên li bajêr dimînin nas dike û di nav wan da xebatkar, leşker û kesên siyasî hene. Erebe Şemo tenê xwestiye kesên wî ew nas kirine navên wan bide. Dema navê wan dide heger ev kes gundî bin navê gund û malbata wan dibêje. Lehengên bi vî awayî wek lehengên dekoratîf yan jî figuran cî digirin. Wekî mînak:

“Em paîzê çûne gundekî dinê. Wî gundîra digotin Vladîqers.

Li wî gundîda dima mala Eslên. Eslan xwe merîkî zafî pak bû. Hebûn sê kurê wî: Emo, Elî û Kekan.

Mala wan niha li gundê eşîra-badedane, nehîya Heystterekê, li Êrmenîstanê. Li wî gundîda em man salekê. Saltira dinê em derbaz bûn çûne gundê melegana Novo-Mîxaylovskê. Li vî gundîda diman gelle gavan, çimku gundekî zaf mezin bû. Li wêderê dima mala Siloyê Horê. Du jinê Siloyê Horê hebûn. Bêzê û Werdek. Ji Bêzê hebû kurek û qîzzek, lê ji Werdekê hebûn kurek û sê qîz. Herdu kurê Silo bûne hevalê min. Me pak hevra derbaz dikir. Navê yekî Hossê bû, navê yê dinê Ahmed bû. Ez û Hossê emirda angorî hev bûn, Ahmedî ji me biçûktir bû. Mala Siloyê Horê maleke rind bû, halê wan xweş bû.

Qîzeke Silo -navê wê Xezal bû, malda dabûne piznamekî xwe, navê wî Huso bû.

Min, Hossê û Ahmed hevaltî da hevdu, ez gelle cara mala wanda radizam, qe nedîçûme mala xwe. Bavê min û Silê Horê bûne dest-birakê hevdu, gellekî ji hev hiz dikirin. Dîya min û herdu jinê Siloyê Horê bûne xûşkê hevdu. Gava ku ez dihatme mala wan, -wana zaf ji min hiz dikir, min gelle nanê destê Werdekê û Bêzê xwarîye.”²¹⁴

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da zehf cî daye kesên dekoratîf. Piştî navê kesan dibêje derbarê wan da tenê dibêje ev malbat niha li filan derê ye. Mînakeke din jî wiha ye, “Wexta em teze hatne Sûsîz, mala me kete koxê Ûsê Têco. Merîkî zafî rind û milahîm bû. Niha du kurê wî henei herdu jî zilamne zafe rindin û camêrin. Meriv heyran, hijmekare, wan xorta binêre. Yek Teyoye, yê dinê Miraze: şîrnaya dîya wî jêra digot Mazo. Mala wan li Tilbîsêye.”²¹⁵

²¹⁴ Şemo, **h.b.**, r. 94-95.

²¹⁵ Şemo, **h.b.**, r. 142.

Wekî li jorê jî hat gotin Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* da li ser kesayetiya fizîkî û derûnî ya lehengan zêde nasekine. Lê carna di romanê da di dewsa taybetiyên fizîkî yên lehengan bide nasîn da rewşa cil û bergên wan radixîne ber çavan:

“Ji nava wê komê yekî-kincne peritî lê, kosolekî rindî girêdayî, cotê çarixê peritî lingada bûn, arxalixê wî peritîbû, cûre-cûre pine lê xistîbûn, sere pîna gîhandibûne hevdu, meriv tirê-qest neqîşandibûn. Şalê lê peritîbû, ser çoka wî têra derdiket. Gav rûdinişt, pêşa arxalixê xwe ji şerma davîte ser çoka xwe, wekî ew cîyê qetîyay kivş neke. Wextê ew gilî dikirin, ewî tamûl nedikir, cara dikir xeber de. Cara axe-ax jê dihat, cara jî serê xwe ber jêr dikir, ker dibû. Min texmîn kir, wekî ew camêr ber dilê xwe nade, dike bêje, lê mecal nakevê.”²¹⁶

Erebê Şemo çawa cî nade derûnî û hestên kesên di *Şivanê Kurmanca* da wisa hestên xwe jî pîrî caran nade der. Wekî berê jî hatibû gotin, lewra dema qala mirina Derwêş tê kirin û yan jî mirina dê û bavê xwe dibihîze tu bertek nîşan nade. Hestên wî tunene û tenê bi kurtasî tê behskirin:

“Dewrêşê birê min her-ro digot:

-Ez nexwaşim, sere min dêşe, dilê min jî dewerime.

Ro bi ro Dewrêş paşda diçû, nikaribû pey dêwêr saskar bibe. Belengazî himangî dêwêrra kaş dibû. Axrîyêda kete nav cîya. Bavê min gelle du-dermana gerîya, nebû tiştêkî. Rojekê bavê min çû, gazî hekîmekî kir, anî. Ewî pezek da kirîne, şerjêkir, Dewrêş avîte postê pezê. Dewrêş dîsa silamet nebû.

Wextê heqê kutta bû, me golik û qorê wan nava gund belakir, heqê xwe ji nava gund top kir, stand. Wê paîzê em ji mereka Teco der ketin, hatne, ketne koxê Şûme-Korê. Zivistanê şewata me kêmbû, Dewrêş ji sermê mal teyax nedida, diçû, dikete tewla Mîrzê Xudoyê Berîn, xwe germ dikir. Cara ez jî pêra diçûm. Min Dewrêş zaf hizdikir.

Kete zivistanê. Dewrêş mir. Bavê min û dîya min gelle şîn û girî kirin, lê tu feyda nekir.

Dewrêş birin, heq kirin, xêra wî dan.”²¹⁷

Wexta di sala 1924an da Erebe Şemo di *Rewanê* ji bona li ser daxwaza partiya xwe di nav Kurmancan da bixebite wiha qala mirina dê û bavê xwe dike û tu hestên wî di vir da jî tune:

“Berî gişka ez li dê û bavê xwe geriyam. Bavê mine kalî belengaz û dîya mine pîr tunne bûn. Ez nava gelle êla geriyam. Min salix hildan, wekî du xûşkê min saxin. Yeke li şêherê Tilbîsêdane. Ez çûm. Min xûşka xwe Gogê li wêderê dît. Goga xûşka min, ji mira gilî kir, wekî bavê min kuştin, diya min jî xelayêda ji birçiyana mir. Em gellekî ser hevda girîyan, lê bê feyda bû...”²¹⁸

Wekî ji jêgirtinên li jorê jî eşkere dibe tenê meseleyê vedibêje. Lê carna dema bi

²¹⁶ Şemo, **h.b.**, r. 194.

²¹⁷ Şemo, **h.b.**, r. 117.

²¹⁸ Şemo, **h.b.**, r. 188.

malbata xwe ra ye hestên xwe dide der:

“Bavê min gura min kir, lê dîya min digrîya, nedixwest, wekî ez herim, jê dûr kevim, u digot:

-Lao, were gura pîre dîya xwe bike, me bê xwey nehêle, neçe.

Gunê min pîre dîya min û bavê min hat, ez jî pêra girîyam. Lê nedibû tiştekî, gerekê ez biçûyama, çimku ez carekê ketibûme kelê û min halê kelê dîbû: birçîbûna wê, kutanê wê, zêrandinê wê û çetinîyê mayîn. Yekê jî, wekî bizanbin ez komûnîstim, wê vandra min esse telef kin.

Kela girîyê me danîn, ez û bavê xwe û dîya min, - em rûniştin, me şêwr kir. Bavê min, hê hêsir ji çava dihatin, diketne ser sûretê wî. Raste ewî dixwest, wekî ez ji destê dîwana vira xilaz bim, lê wehîd û tenê diman. Wexta min gote bavê xwe: Bese bigrî, ewî caba min da, got:

-Lao! Ez çewa negrîm: dewsa sê kura, tu tenê mayî, tu jî qe malda nesekinî. Tu li vî welatî -ez yek sal te nabînim, lê wekî tu herî, derkevî welatê dûr, dibek, ez êdî qe te nebînim.

Girîyê wî diha zêde bûn, dîya min jî pêra digrîya.”²¹⁹

Wekî keseke di çîrokê da dêya wî di malan da dixebite û ji çêreyên çolê fehm dike. Wek mayîn çi difikire û çi hîs dike nayê gotin. Diya Ereba di romanê da dernakeve pêş, heta navê wê jî derbas nabe û tenê fîgurek e. Ereba di romanê da qala zanebûna diya xwe ya derbarê giyayên çolê da dike û ev rewş di romanê da wiha tê qalkirin:

“Roja ewilne em çûne ber pêz. Wê rojê dîya min jî me ra hat, nîşanî me dida pincara çolê; siping, tirşo, mendik û yê mayîn. Bi vê pincarê me, rênçberê çolê gerekê nanê xwe bixara. Dîya me me ra nêzikî heftekê dihat, her carê du sê sehta zêde nedima. Me ku pincar ji pincarê nas kir, idî dîya me me ra nedihate çolê.”²²⁰

Ev rewş him zanebûna dê ya derbarê pincara çolê da nîşan dide û him jî perçeyekî jiyana çolê û şivantiyê ye. Divê şivan bikaribin li çolê birçî nemînin û li çara serê xwe binihêrin.

Bav jî wekî dê bi zanebûna xwe ya derbarê çêrandina pêz û jiyana çolê da derdikeve pêş. Kîjan giya ji pêz ra baş e û kîjan giya ji pêz ra zirar e. Ev rewş di romanê da wiha cî digire:

“Lao, pez cara jariyê dikeve, xûnê gerekê jê bidne berdanê, wekî heywanat telêf nebe. Ewlê biharê pezê qira diçêre, timê şoreketê dikeve, gerekê hûn wî çaxî miqat bin, nehêlin pez şoreketa ewiline biharê zaf bixwe, bavê çêrê gengezê ji hemûşka çêtir e. Lê ya lape mezin e û çetin e bona pêz, ew kepenek e. Wextê paizê gîhayê mêrga tê dirûnê, wî çaxî dora gole-genîya cîyê hezek û cîyê qamûş lê şîn

²¹⁹ Şemo, **h.b.**, r. 155.

²²⁰ Şemo, **h.b.**, r. 57.

dibe heyê. Nehêlin pez lê biçêre. Wekî we lê çêrand, pezê we tevî kepenekî bibe û wê qirbe. Hûn gereke pak miqat bin, ew hêşnayî gellekî zirar e.”²²¹

Di *Şivanê Kurmanca* da ji xeynî şîretan roleke bavê Erebe Şemo tune ye û ew jî figurek e:

“Bavê min her-ro temî dida min, digot:

-Lao, şivan û gavanê paîzê divê çarçav be; gurê paîzê birçîne wê pêz ji te bidizin yan wê xwe bavêne pêz, pêz tevî qirkin. (...)

Ewî ez hîn dikirim, ji min ra digot:

-Gur zaf ji êgir ditirsîn, han tera van darê darçirayê xwera bibe, têke torbê xwe. Wekî gur xwe davêne pêz, agir vêxe, bide bin darçirê -ewê vêkeve, têke qurtîn û haco-haco ke, se berî gura de. Gur ku agir bibînin û hema bîna dû ser ket, wê birevin, se jî wê alî te bike. Lê metirse, hema tu ku bitirsî, gurê pêz tevî qirkin... Gurê vî welatî yekane ye, gurne, zafe betterin.”²²²

“Gelle şixul û gilî-gotinêd kurmanca min nizanbû. Bavê min ez hîn dikirim, ji min ra digot:

-Lao, ev eşîrîn, evana ne meleganîn, berêda halê wan dewar xwey kirine. Gereke tu bizanbî çewa xweyê pezra xeberdî...”²²³

Wekî di destpêka vê mijarê da jî hat behskirin di *Şivanê Kurmanca* da kesên dekoratîf hene û hin ji wan wek figur û “tîp” derdikevin pêşberî me. Me bi hin mînakên kesên dekoratîf û figuratîf yê di romanê da destnîşan kirin. Lê di *Şivanê Kurmanca* da ji xeynî Erebe wek “tîp” tu lehengek yan jî kesek bi tena serê xwe dernakeve pêş. Helbet kesê wek “tîp” tê pênasekirin bi nasnameya xwe ya civakî taybetiyeteke “temsîlî” di xwe da dihevwîne.²²⁴ Loma jî wekî Forster jî destnîşan dike “tîp” ji yek wesf û fikrekê pêkhatî ne.²²⁵ Di *Şivanê Kurmanca* da ji “tîp” qest û mebesta me kesek nîne, mebest ew e gelek kesên wesf û fikrekê temsîl dikin. Lewra du taybetiyên wan yê sereke hene. Di heyatê da taybetiyên wan yê hevbeş hene û ev taybetî şênber in û romannûs wê komê li gor nêrîna xwe şirove dike û pêşkêş dike.²²⁶ Di vê çarçoveyê da meriv dikare tîpên di *Şivanê Kurmanca* da wek gundî, şivan û gavan; axa, beg, şêx û mele; Melegan, Ermenî, Daşnak, kûlak û hwd. û kesên bolşevîk dabeş bike.

Gundî, şivan û gavan wek tîp di *Şivanê Kurmanca* da tim heqaretê dibînin û nêrîna wan ya li axa, beg, şêx û meleyan baş nîne û tim bi awayekî neyînî di metnê da

²²¹ Şemo, **h.b.**, r. 57-58.

²²² Şemo, **h.b.**, r. 69.

²²³ Şemo, **h.b.**, r. 97.

²²⁴ Tekin, **h.b.**, r. 110.

²²⁵ Forster, **h.b.**, r. 108.

²²⁶ Çetin, **h.b.**, r. 150.

qala axa, beg, şêx û meleyan dikin. Bi heman awayî nêrîna wan ya li Melegan, Ermenî, Daşnak, kûlak û hwd. jî neyînî ye. Di romanê da pîrî caran Erebê Şemo berdevkê wan e û wiha dibêje, “Gelle merîyêd kesîb diçûne olama bega, axa, şixulê wan dikirin, çewa rieta bega ew xebat tev pê pere dikir. Xulamêd bega nava êla ketibûn, olam derdixistin; yê ku nedîçûne olama bega, ew merî dihatne kutanê, bi qamçîya û cirm dikirin.”²²⁷ Di dereke din da jî wiha qal dike, “Em diçûne çolê ber pêz, belegazî, birçîbûn didît, dewletîya jî xwera kêf dikirin, hasil digirtin.”²²⁸ Lê carna Erebê Şemo wan jî dide xeberdan. Gundiyek wiha diaxive:

“Ewî mêrikî tilîya xwe dirêj kir, nîşanî pîr-Abasê da, got:

-Tu dibinî ji wîra jî nema. Abasê Gizo xweyê aş bû. 7 sala gilavtîya êla Hesinîya kir. Wexta daşnaka bû qumandarê polka kurmanca, çû li Extê pêşîya bolşêvîka, bolşêvîkra têke şer, nehêle bolşêvîk bê, me aza ke. Lê pak bû, -reva bolşêvîk girtibû-şûrê wî, qema wî, qayîşa wî, teve zîv-zêr kilday, jê standibûn, berdabûn. Dîsa eskerê meyî sor tu dengê xwe jêra nedikir. Lê wekî eskerê sor təketa dest wana, wanayê saxe-sax wê post kirina, ya wana kir, gellekî dikişîne.

Ew mêrkê eva yekana gilî dikirin, pêş wanva hevekî ker bû, serê xwe bir, anî, got:

-Hila ho... çika axrîya wan çawa tê, vana gellekî xûna belengaza, kesîba mêtîye, xwarîye.”²²⁹

Axa, beg, şêx û mele wek tîp di *Şivanê Kurmanca* da tim bi dijmin ra hevkarîyê dikin û heqaretê li gundî, şivan û gavanan dikin. Wexta Ereb tê Tilbîsê gundiyên wî yên ji Sûsîzê li dora wî kom dibin û dest bi gilî û gazinan dikin, “Begêd me, axalarêd me jî çûne pişta daşnaka. Êsib-beg, Cangîr-axa û Qulî-beg esker ji kurmanca dane daşnaka. Xwedê giravî bi ixtîyara xwe. Lê çî ixtîyar çî hal, tev zora qamçû dibirin.”²³⁰ Ereb dîsa berdevkê wan e û wiha dibêje, “Rastî, bega, şêxa, daşnaka û mella kurmancê kesîb zaf pejmûrde kiribûn. Malê wan zorê jê distand. Wekî yek nexweş diket, Cangîr-axa yan Egît-begê diçû, malê wan talan dikir, danî. Wextê ez hatim, eva gilî-gotina gava ku min bihîst, ecêbmay dimam.”²³¹ Di dereke din da gundiyek wiha dibêje, “-Êsib-beg bû uzvê parlamênta daşnaka, Cangîr-axa jî qumandarê ser eskerê kurmanca nav daşnakada. Egît-

²²⁷ Şemo, **h.b.**, r. 102.

²²⁸ Şemo, **h.b.**, r. 106.

²²⁹ Şemo, **h.b.**, r. 191-192.

²³⁰ Şemo, **h.b.**, r. 189.

²³¹ Şemo, **h.b.**, r. 191.

beg bû prîstavê kurmanca. Egît-beg xelq ussa talan kir, idî ‘neynuk tunne bû’, wekî xwe pê bixuranda.”²³²

Melegan, Ermenî, Daşnak, kûlak û hwd. wek tîp di *Şivanê Kurmanca* da -ji xeynî çend mînanak- bi gelemperî nêrîna wan ya li Kurmancan û kesên feqîr û belengaz neyînî ye û niheqiyê dikin. Wek mînak wiha qala Meleganan tê kirin:

“Meleganêd kûlak xwe hesab dikirin çewa ‘sofi’ û ‘xwedê nas’, lê ewn tev derew bû. Wana sibê hetta êvarê em badilhewa didane xebatê-êksplaoasî dikirin him em gavan, him jî kesîb-kûsîbêd gundê xwe melegan. Em, rênçberê xwe, ussa dikutan, danîne halê kuştinê. Pey wan kutanara gavanêd belengaz yek meh nexweş diketin, himangî pey dewêr saskar dibûn, hinek ji wan dimirin.”²³³

Di romanê da wiha qala Daşnakan tê kirin, “-Wextê tu ji cem me çûy, dîwana kete destê daşnaka. Daşnaka dest pê kir kurmanc qir kirin. Rojê danekê wan bi xûmpapêdê xweva ser gundekîda digirtin.”²³⁴ Gundiyên Melegan wiha dibêjin, “Min dît, ku dîsa bû piste-pista wan. -Na! -yekî ji wan kire gazî, got, -tu casûsî, kurmancê we hatne dizîyê vê malê, tujî vira sekinî, casûsîyê dikî, wekî kesek wan negire.”²³⁵ Di dereke din ya romanê da hin jinên Ermenî wiha xeberdidin, “Hin jinkêd heyatê êrmenî hevra digotin: -Kurmanca teve ussa dizin, qaçaxin, hila binêr -eve çûk hatiye vira, dîsa bê dizî nahewe. Hineka jî digot: -Bigrin, bikutin, paşê berdin -bira here.”²³⁶

Wekî li jorê jî hat gotin di *Şivanê Kurmanca* da ji Meleganan hin kes erênî tèn nîşandan. Wek mînak Paraşa, mamosteya gund û keça wê ya bi navê Marûsiya erênî tèn qalkirin. Wekî mînak dema qala Paraşayê dike wiha dibêje, “Nava jinêd meleganada jineke zaf rind hebû. Navê wê Paraşa bû. Ewê gellekî ez hiz dikirim. Kifş bû gunê wê min dihat... Paraşa kulfeteke zafe rind bû. Jinêd melegana dinê nedihîştin -lingê me ser şêmîka wan keve, digotne me, -hûne mirdarin.”²³⁷ Ereb di romanê da wiha qala Marûsiya û dê ya wê dike:

“Min zû hevaltîya xwe da qîza seydayê, Marûsîyê. Raste, -ewe ji min çûktir bû, lê Marûsîya qîzeke aqile rind bû, zaf jî dilovanî bû. Ewê dixwand, dersa dudyada, pak zambû xwandin û nivîsar.

²³² Şemo, **h.b.**, r. 189.

²³³ Şemo, **h.b.**, r. 64.

²³⁴ Şemo, **h.b.**, r. 188.

²³⁵ Şemo, **h.b.**, r. 75.

²³⁶ Şemo, **h.b.**, r. 82.

²³⁷ Şemo, **h.b.**, r. 68.

Ewê dil û eşq komek dida min, ez hînî xwandinê dikirim. Herdu seydayê min jî, dê û Marûsîyê, derheqa zêna minda ecêmay diman û şa dibûn bona zû hînûna min. Min zaf ji Marûsîyê hiz dikir.”²³⁸

Di *Şivanê Kurmanca* da kesên bolşevîk şoreşger in û xwe ji bo xizmeta gelê xwe dikin qurban, nefspiçûk û xurt in.²³⁹ Li cem feqîr û belengazan cî digirin, baş li dewlemendan, axa, şêx, mele û Daşnakan nanihêrin û erênî tên nîşandan. Bolşevîk wiha dipeyivin, “-Gerekê em dîwana miweqetî qir kin. Dîwanê têne destê pale û gundîya. Gerekê em neçine şêr. Gerekê em dewlemenda tevî qir kin bê xeberdan.”²⁴⁰ Di romanê da wiha qala armancên xwe dikin, “-Em bolşevîk daw dikin: 1) Kutta bikin şêr, têne levhatinî. Eva şera bona kara bûrjûazîyêye. Em xûnê dirêjin -ew cêbê xwe tijî zêr dikin. 2) Erd ji gundîyara. 3) Welgerîn dîwana miweqetî. Dîwan gerekê têkeve destê şêwra pale, esker û dêpûtatê gundîya.”²⁴¹

2.3.4. Zeman

Roman wek vegotîneke modern xitabî hişmendîya me ya derbarê zeman da jî dike û meriv nikare di romanê da “zeman” piştguh bike. Wekî Forster jî dibêje wexta roman ji zeman dûr bikeve meriv nikare qala tiştê bike. Roman tenê li ser nirxan bê avakirin û zeman tunebe, nayê fehmkirin.²⁴² Loma jî zemanê di çîrokê da perçeyekî vegotîne ye. Heger çîrok di hezar salî da derbas bibe dema çîrokê hezar sal e. Lê wekî Eco jî dibêje di metnên honandî da dema nivîsandin û xwendinê kurt e.²⁴³

Zeman yek ji hêmanên girîng yê romanê ye. Lewra zeman bûyerên di romanê da diqewimin piştrast dike û bi saya demê silsîleya bûyeran di hişê xwendevanan da wekî rastî xwe didin der. Yanê pergala di metnê da hatiye afirandin di nav demê da tê meydanê. Bi awayekî zeman xwe di romanê da eşkere dike.

Di metnên wek roman û çîrokê da dahûrîna zeman li ser sê xalan tê kirin: Rêzik, mawe û frekans. Rêzik pêkhatina rêza bûyeran e ka ew bi renekî normal û kronolojîk diqewimin yan ji kronolojiyê dûr dikevin. Heger dev ji kronolojiyê bê berdane wê çaxê anakroniyek heye. Du cureyên anakroniyê hene: Ger zeman çûbe demên berê navê vê yekê paşveçûn yan xwe biavêje zemanekî hê neqewimiye navê vê pêşveçûn e. Mawe

²³⁸ Şemo, **h.b.**, r. 88.

²³⁹ Celalî, **h.g.**, r. 76.

²⁴⁰ Şemo, **h.b.**, r. 149.

²⁴¹ Şemo, **h.b.**, r. 163.

²⁴² Forster, **h.b.**, r. 81.

²⁴³ Eco, **h.b.**, r. 64.

tespîtkirina zemanê çîrok (bûyer) û zemanê gotarê (vegotin-qalkirin) ye. Zemanê çîrokê maweya çîroksaziyê ya hemû tevgerên metnê ye. Lê ev mawe tu caran tam nikare were tespîtkirin, lê hin rîtmên nivîskar yan vegêr (vebêjer) ji tespîtkirina wê ra dikarin bibin alîkar. Wek mînak nivîskar di hin ciyan da dilezîne, tevgerê derdixe pêş. Di hin ciyan da vegêranê (vegotin) cangiran dike û ji bona hin balkêşiyên xwe mijûl dike. Yan jî bi awayekî eşkere yan veşartî di ser hin bûyeran ra gav dide. Frekans rasterast bi helwesta nivîskarê zimmî ra eleqedar e û ew di qalkirina çîrokê da carcaran dikeve nav şiroveyan, teswîran, kurte û dubareyan. Ka di nava çîrokê da rûdanek di nivîsandinê da carek yan gelek caran hatiye dubarekirin dîsa bi vê têgehê ra eleqedar e. Yan jî nivîskar behs dike yan nîşan dide li gor vê kategoriyê tê diyarkirin.²⁴⁴

Di *Şivanê Kurmanca* da zeman zemanekî kronolîjîk e. Bûyer li pey hev diqewimin. Yanê vegotineke kronolojîk heye. Loma jî meriv dikare bibêje ji hêla rêzikê va di romanê da zeman derneketiye pêş û honandin. Di *Şivanê Kurmanca* da zemanekî eşkere û sînorkirî yê bi destê nîskar hatiye eşkerekirin tune. Li gor kronolojiya jiyana nivîskar bûyer tên gotin. Roman ji derketina Şemo ya ji Surmeliyê û zarokatiya Erebb dest pê dike û bûyer, serborî û bîranîn hatine nivîsandin.

Di *Şivanê Kurmanca* da zeman di awayê yekem da “zemanê bûyerê” ye û zemanê bûyerê ji zemanê bûyer tê da diqewimin pêk tê.²⁴⁵ Di vir da vebêjer derbarê paşeroja dema bûyerê da agahî dide û di navbera bûyeran da têkiliya sedem û encamê çêdike. Vebêjer her çiqas di dema niha da biaxive jî bûyer berê qewimîne. Lewra tu bûyerek demildest nayê qalkirin û divê dema di navbera “zemanê bûyerê” û “zemanê qalkirinê” da derbas dibe neyê piştguhkirin û ev ji bona hunera romanê pêwîst e. Çimkî dema derbas dibe -ha kin ha dirêj- li ser romannûs û bûyera tê neqilkirin tesîrê dike. Bi kurtasî bûyerek di nav demekê da diqewime (zemanê bûyerê) û ev bûyer piştî demekê ji hêla romannûs va tê hînkirin û ragihandin. Heman bûyer di nav demekê da tê nivîsandin (zemanê vegotinê) û heman bûyer di nav demekê da tê qalkirin û pêşkêşkirin (zemanê qalkirinê).²⁴⁶

Şivanê Kurmanca bi devê Erebb, yanê bi devê kesê yekem tê vegotin. Lewra di piraniya romanê da dema tê vegotin zemanê bûyerê ye. Lewra di navbera bûyer û demê

²⁴⁴ Alan, **h.b.**, r. 126.

²⁴⁵ Çetin, **h.b.**, r. 131.

²⁴⁶ Tekin, **h.b.**, r. 131.

da valahî çênabe. Dema di romanê da tê dîtî kêmzêde ji çêbûna Erebe Şemo dest pê dîke û heta sala 1924an didome. Meriv kêmzêde dikare demên di romanê da diborin di bin van beşan da rêz bike: Beriya çêbûna Şemo, zarokatiya wî ya di gundan da, salên wergêriyê, di nav refên partiyê da û propogandaya di nav Kurmancan da. Lê di romanê da “zemanê vegotinê” jî tê bikaranîn. Dema vegotinê zemanê vebêjer metnê jî xwendevana ra radigihîne nîşan dide. Di zemanê vegotinê da vebêjer bûyerên berê qewimîne wexta neqil dîke di zemanê vegotinê da diaxive.²⁴⁷ Di zemanê vegotinê da vebêjer û xwendevan liqayî hev tên. Di van deman da bûyer yan jî devê Erebe Şemo yan jî jî devê kesek din tê vegotin. Lê dema bûyerê û dema vegotinê heman dem nînin. Di *Şivanê Kurmanca* da dem bi zemanê vegotinê dest pê dîke û di gelek ciyên romanê da zemanê vegotinê hatiye bikaranîn. Wek mînak bavê Erebe Şemo dest bi vegotinê dîke: “Êvar bû. Baraneke hûr dibarî. Bakî sar jî pêra dihat. Ez zarava, em şil bibûn û serma dikir: Em hatne kêleka gundekî. Ew Azat bû. Mereke tek li kêleka gund hebû. Me xwe li wê mereke girt, çûn ketne merekê...”²⁴⁸ Yan jî gundiyeke vedibêje: “Egît-begê ez talan kirim, tişteke ber derê min nema, her ma du bizinê min, guhdirêjeke min û pênc serî kulfet. 3-heb zarê hûr bûn...”²⁴⁹ Di van mînanan da jî dixuye bûyerên tên behskirin di paşî da mane. Lewra jî bûyer bi rêya zemanê vegotinê tên vegotin. Roman bi devê vebêjerê sêyem dest pê dîke û lewra jî bûyer di zemanê vegotinê da hatiye pêşkêşkirin: “Şemo kurmancekî kesîb bû, ji êla Hesena (Hesenîya) bû. Diçû ber dewarê xelqê, li qeza Surmeliyê berê ew qeza tev welatê rewanê bû...”²⁵⁰ Diyar e Erebe Şemo neqla serboriya bavê xwe ya beriya çêbûna xwe dîke. Piştra dibêje bavê wî bi diya wî ra zewiciye û ew tevî du xwişkên xwe ji diya xwe çêbûye. Piştî paragrafa dibêje ez ji diya xwe welidîme, dest bi qalkirina rêberiya malbatê dîke. Ango di çar rûpelên pêşîn yê romanê da dem diçe ser dema beriya Erebe Şemo, zewaca dê û bavê wî, çêbûna wî û rêberiya malbatê. Tê dîtî dem gelekî zû ji ber çavên me dişemite. Di *Şivanê Kurmanca* da dem wekî blok bi blok hatine dayîn. Di rûpelekî da yan jî di çend rûpelan da demên ji hev dûr li pişt hev hatine rêzkirin. Di navbera deman da sedem-encam xurt nîne û têkiliya dem-cî jî sist e. Mînak:

“Bavê min hevekî ker bû, serda zêde kir got:

²⁴⁷ Çetin, **h.b.**, r. 133.

²⁴⁸ Şemo, **h.b.**, r. 54.

²⁴⁹ Şemo, **h.b.**, r. 190.

²⁵⁰ Şemo, **h.b.**, r. 53.

-Ewî roja ew kaxêz dane min, tu eynî rojê zar bûyî...

Bi vî tihêrî mêtîrîka emrê min bû 23-oktyabrê sala 1898. Kurmancî em vê mehêra dibên meha 'çirîya pêşîn'.

Bihar hat, idî belekî ketne erdê. Me jî karê xwe dikir, wekî ber bi gundekî dinê herin.²⁵¹

Ev jêgirtin di beşa "Hukum" da cî digire. Beşa "Hukum" bi biryarekê dest pê dîke derheqê bavê Erebe Şemo da hatiye girtin. Ev biryar ji nişkê va ketiye nav berhemê. Yanê beriya vê beşê derbarê wê da tiştek nehatiye gotin. Piştî meseleya biryarê tê gotin em pê dihesin Erebe Şemo xwestiye roja çêbûna xwe bi xwendevanan bide diyarkirin. Lewra roja biryarê û rojbûna wî heman roj in. Piştî dibêje ew roj roja rojbûna min e vê meseleyê ji nişkê va digire û diçe ser mesela koça malbatê. Herikîna demê hatiye birîn. Yanê du paragrafên li dû hev in ji aliyê dem û cî va ji hev dûr in û pevgirêdana wan qet tune. Du demên cuda da wekî du blokên cuda li pey hev hatine rêzkirin. Ev rêzblokên deman ji sernavên beşan jî diyar in. Her beşeke *Şivanê Kurmanca* wekî blokeke demê ya cuda hatiye sazîkirin û ev blok li pişt hev hatine rêzkirin.²⁵²

Di beşa "Li şêherda. Şerê împêrîalîsta" da em cara ewil rastî zemanê bûyerê tîn: "Paîzê, sala 1914-da, wextê hila ez ser zavodê dixebitîm, polkeke qazax hat wêderê, danî nêzîkî zavodê çadrêd xwe sipî vegirtin. Cara, nîvro şûnda ez diçûme wê polkê, min nan xwarin danî mal."²⁵³ Piştî vê beşê di romanê da êdî carcaran dem tê eşkerekirin û em dizanin bûyer çî çaxê diqewimin. Wek mînak, "Ser vê quluxê ez mam hetta sala 1915, -xwarina min kazonî bû, ji kîsî dewletê bû, aylixa min du paye pere dest min diketin, min dibir, dida bavê Karê, dewsa qelenê Karê."²⁵⁴ "Roj bi roj ez ketme xebata firqê, idî fikra min ser wan gilîya bûn. Zivistana 1916-a idî serbest ez dixebitîm."²⁵⁵ "Idî ketibû meha havînê ortê, em jêr dibên meha temûzê 1917-salê. Ez ji wana idî veqetîyam, orta min wan zaf rind çêbû. Li şêherê Tilbîsê em hindik man, her me xwera nan kirî, em ketne maşînê, dîsa çûn."²⁵⁶ "... cab dane min, wekî yekê gulanê 1918-firqa bolşêvîka tu hilday uzvê xwe. Ezî hila hê nexweşxanêda bûm, bilêta min katibê firqê, hevalê Topûnov xwe-xwe anî da min."²⁵⁷ "Ser şêherê Stalîngradê her-ro şer hebû. Em

²⁵¹ Şemo, **h.b.**, r. 93.

²⁵² Yılmaz, **h.b.**, r. 93-94.

²⁵³ Şemo, **h.b.**, r. 120.

²⁵⁴ Şemo, **h.b.**, r. 128-129.

²⁵⁵ Şemo, **h.b.**, r. 147.

²⁵⁶ Şemo, **h.b.**, r. 160.

²⁵⁷ Şemo, **h.b.**, r. 174.

gelle cara diçûne komekîya wî şêherî. Paîza 1918-salê halê me zaf pejmûrde bû. Eskerê qazêx zor dida me, şêher ji me standin.”²⁵⁸

Di *Şivanê Kurmanca* da zemanê çîrokê ji zarokatiya Ereba dest pê dike û bi vegera wî ya nav Kurmancan bi dawî dibe. Di metnê da bêyî zanîna nivîskar ya ji bo di romanê da emilandina mefhûma 'zeman' ji ber du dîrokên di berhemê da derbas dibin, meriv dikare texmîn bike bûyer û tiştên di berhemê da di navbera kîjan zemanî da diqewimin. Mînak ewil di beşa “Hukum” da derbas dibe. Ereba di vê beşê da dema zarokatiya xwe hîn dibe:

“Hukum dikim hamû gilavîya û hemû ketxudê gunda, komekê bidne Şemoyê Adî, yê ku digere mihîneke unda bûy. Rengê wê mihîne poz ji cîsnê hespê erebane, nîşaneke dexmekirî ser hêta paşine çepêye.

Kê ku vî hukumî neqedîne, ezê bidme cizareke qanûnîyê û cabdarîyê.

Prîstavê nehîya Qizilçeçeqê (qol)

Katibê wî (qol)

Ez gellekî ecêbmay man û min got:

-Bavo, kivşe tu berê merîkî zafî mezin bûyî.

Bavê min kenîya, got:

-Na, lao, ez ne merîkî mezin bûm.

-Lê çewa, -min gote bavê xwe- ne li vira, kaxezda nivîsîne, wekî çiqas gilavî û ketxuda hene li gunda komekê bidne te.

Bavê min kenîya, pêşda hate nêzîkî min, got:

-Çend sala pêşda ezî gavanê Qizilçeçeqê bûm. Li wêderê jî dima prîstavê wê nehîyê. Carekê mihîna min wî unda bû. Ez digerîyam, min mihîna wî nedidît. Ewî gazî min kir, got.

-Hevtek tera molet, wekî tu mihîna min nebînî, neyînî, ezê çermê piştta te jê kim, tijî xwê bikim.

-Ez gellekî tirsîyam, çûm, gelle cîya, welata gerîyam, min mihîna nedît. Ez rokê hatim mala xwe. Em tev ser hevda grîyan, lê nebû tiştêkî. Ez çûme cem prîstêv, min jêra got:

-Axa, kesek gura min nake.

-Ewî ev kaxez nivîsî da min. Ez gerîyam, min bi vê kaxezê ew mihîna dît.

Bavê min hevekî wa ker bû, serda zêde kir got:

-Ewê roja ew kaxez dane min, tu eynî wê rojê zar bûyî...

Bi vî tîherî mêtîrîka emrê min bû 23-oktyabrê sala 1898. Kurmancî em wê mehêra dibên meha çirîya pêşîn.”²⁵⁹

²⁵⁸ Şemo, **h.b.**, r. 184-185.

²⁵⁹ Şemo, **h.b.**, r. 92-93.

Mînaka din jî di beşa “Dîsa nava kurmanca” da derbas dibe. Ereba li ser daxwaza partiyê tê nava Kurmancan: “Min gura firqê kir, biharê, 1924-salê, ez hatme Rewanê, wekî nava kurmanca bixebitim.”²⁶⁰ Ji ber herdu dîrokên di metnê da derbas dibin meriv dikare bibêje zemanê di romanê da 1898²⁶¹ û 1924 e û her tişt di vê navberê da diqewimin.

2.3.5. Mekan

Roman terkîbek e û mekan jî yek ji perçeyên sereke yê vê terkîbê ye. Bûyerên di romanê da miheqeq li cî û warekê derbas dibin. Teswîrkirina cî, war û mekanê tenê ji bo nîşandana rastiye nîne, di heman demê da taybetiyên fizîkî û psîkolojîk yê lehengan jî nîşan dide. Romannûs bi gelemperî ji bo derdorên bûyer lê derbas dibin bidin nasandin, lehengên romanê xêz bikin, civakê eşkere bikin û ji bo romanê atmosferek çêkin ji mekanê îstifade dikin.²⁶² Di roman û çîrokan da dahûrîna mekan bi qasî hêmana zeman tevlihev nîne. Meriv dikare ji mekanên roman û çîrokan ra bibêje mekanên edebî û mekanên civakî. Di her rewşê da wate yek e: Derdora obje, leheng û bûyeran. Li gor mebestê ev mekan dikare hûr hûr jî bê behskirin, dikare wek dekora kêliyê jî bê diyarkirin.²⁶³ Bi kutasî roman ji aliyê naveroka xwe va honandinek e û mekan hêmayeke sereke ya vê honandinê ye. Di romanê da bûyer, çî bi leheng çî bê leheng, li mekanekê, yanê li cî û warekê diqewime.

Di *Şivanê Kurmanca* da wek hêmaneke edebî ya romanê teswîrkirin û pêşkêşkirina mekanê qels e û dernakeve pêş. Di *Şivanê Kurmanca* da mekan zû diguherin û bi gelemperî mekanên vekirî ne. Di romanê da hin mekan tenê wek nav derbas dibin, hin mekan bi kurtasî û hin mekan jî bi berfirehî tî teswîrkirin.

Wekî hat gotin Erebe Şemo pirî caran bi kurtasî, yanê bi çend hevokan qala mekanên di romanê da dike. Weke mînak, “Ew mereka em têda diman me tendûr kiribîyêda, hema dendûra me zivistana gelle cara nedihate dadanê. Eme bê dewar bûn, sergînê me tunne bûn.”²⁶⁴ Erebe Şemo xwendevanan nakşîne nav mekanê û meriv

²⁶⁰ Şemo, **h.b.**, r. 188.

²⁶¹ Bûyîna Erebe Şemo jî sala 1897 e.

²⁶² Tekin, **h.b.**, r. 143.

²⁶³ Alan, **h.b.**, r. 127.

²⁶⁴ Şemo, **h.b.**, r. 56.

nizane tê da çi heye, di navbera mekan û kesan da têkiliyeke çawa heye û çi hestan li ser wan peyda dike. Çend mînakên din jî wiha derbas dibin di romanê da, “Saltira dinê me bar kir, hatne Qereqola Baro. Em hatin, ketne mereka Tecoyê Berîn.”²⁶⁵ Di vir da jî em derheqê mekanên navborî da tiştek nizanin û ji bona romanê atmosferek çênakin. Di vê mînakê da jî tenê nav û hin agahî hene, “Eskerê me danîbû li Entabê, li gundê Dêrikê, ew çend gund berê gundê sîpka bûn. Êla sîpka revîbû, hatibû welatê Qersê. Navê wan gunda Sêvik, Dêrik, Zadik û yê din. Wî gundê Dêrikêda gelle malê kurmancêd me mabûn.”²⁶⁶

Erebê Şemo dema cara ewil bajarekî dibîne bi kurtasî li ser disekine û bi gelemperî agahî dide. Derheqê taybetiyên bajar da di hişê meriv da tiştek peyda nabe û baş nayên teswîrkirin. Wek mînak:

“Qers hatiye avakirinê ber çiyakî mezin, serê çiyê keleke mezin ji zinara hatîye çêkirinê. Qers ketîye bin bandûra Êrisêtê pey şerê 1877-1878 salê. Çawa ku mezin salixa didin, wextê Qers hate standinê, sereskerîyê eskerî şêr, Lorîs Mêlikov, dikir. Çarnîqalî Qersê çiyane, serê wan çiya hatne avakirin gelle tabîyê esker. Ew çend sal bûn, min şêher nedîtibû, ez ecêbmay dimam ji muxluqetê wê, hatin-çûyna wê. Meriv nikarbû hêsa kuçêda biçûya ji dest faîtona, fîrguna, eraba û îsanet.”²⁶⁷

Erebê Şemo wekî mînakên li jorê hatin dayîn di gelek ciyên romanê da dema navê gundan dide zêde li ser wan nasekine. Wekî mînak wiha qala gundê Azatê tê kirin, “Em hatne kêleka gundekî. Ew gund Azat bû. Merekeke tek li kêleka gund hebû. Me xwe li wê merekê girt, çûn, ketne merekê.”²⁶⁸ Ji bilî agahiyên li jorê hatin dayîn derbarê taybetiyên fîzîkî yên Azatê da tiştek nayê gotin. Wek mekanek Azat nayê tewîrkirin û terîfkirin. Di mînakeke din da jî wiha qala Sarî-Bilaxê tê kirin:

“Gundê Sarî-Bilaxê berêda ciyê esker bû, pošta eskerê ‘paganîc’ têda dima. Gelle qijle esker têda hatibû avakirinê. Li wî gundê Sarî-Bilaxêda rûniştibû ‘komêdant.’ Ji Êrisêtê esker dihat, lê rihet dibû, zexîre distand, diçû ber bi şerê Romê. Xên ji wê yekê, wî gundêda çend dikan hatibûne avakirinê. Ewder dibû mîna şeherekî.”²⁶⁹

Di *Şivanê Kurmanca* da kêm be jî hin mekan bi berfirehî tên nasandin û teswîrkirin. Wek mînak wiha qala gundê Alêksandrovskê dike:

“Ew gundê ku em çûnê, navê wî gundî hê berê, wexta Romêda, jêra digotin Komesor, lê teze hatîyêd Êrisa, melegana navê wî gundî danîbûne Alêksandrovsk,

²⁶⁵ Şemo, **h.b.**, r. 111.

²⁶⁶ Şemo, **h.b.**, r. 132.

²⁶⁷ Şemo, **h.b.**, r. 118.

²⁶⁸ Şemo, **h.b.**, r. 54.

²⁶⁹ Şemo, **h.b.**, r. 126-127.

bi navê bavê padşê hatibû avakirinê ew gundê teze. Ew gund ji şêherê Qersê hevt kîlometra dûr bû. Lê çî çîkî zaf kaw hatibû avakirinê, ser çemê Qerseçayê, wî welatîda idî çem ji wî çemî mezintir tunne bûn. Dora çem, hetta çav-çava dibirî, mêrg-çîmanê wan bûn, notla xalîçeke xemilandî, qîz xwera bixemilînîn-ussa tev tijî kulîlk dibûn; ji mêrga wêdatir zevî bûn, çargoşe, notla kvadrata şîn dikirin; çîna jî cewêd avê, nav sînorê wanra derbaz dibû. Rojêd havîna, wextê tavê dida wan cewa, şînayî û ava, cewa tev dibiriqîn, te tirê- zozanêd Eledaxêne xemilîne.”²⁷⁰

Wekî berê jî hat gotin di piraniya romana *Şivanê Kurmanca* da mekanên girtî kêm çî digirin. Bi gelemperî bûyer li ciyên vekirî derbas dibin. Wek mînak dema Erebbê tê girtin wiha qal dike:

“Ez dame nav xwe, birim, qe nehiştin, ez xeberdim yan çîkîda bilipitim. Ez dûz anîme ber kelê. Derê kelê vekirin, ez birme heyeta kelê. Li wê derê ez rût tazî kirim, kincê min nihêrîn-tiştê cem min tunebû, xêncî kêreke rinde serîya, bi wê kêrê cara lawîkê me kurmanca, serî kur dikirin. Min ku kincê xwe xwe kir, ez avîtme nava çamçîya, gellekî kutam, ez birim, avîtme kelê. Wextê ez hatme kelê, girtî pencera min dinêrî, çîmkû kincê min, kincê kurmançiyê bûn: fînokî sorî qotikkirî serê mi da bû, arxaliyekî oymekirî li min bû, cotê sapokê lingê minda bûn.

Ez girtî mam nêzikî du mehan, çend roja carî gazî min dikir, dipirsîn.”²⁷¹

Ji jêgirtina li jorê jî diyar e Erebbê nêzikî du mehan di zindanê da maye. Lê derbarê avahiya zindanê da agahî nade. Tenê qala hewşa zindanê dike. Behsa hundirê zindanê, ciyê li wir maye nake. Lewra em nizanin ka Erebbê di zindaneke çawa da maye.

Di *Şivanê Kurmanca* da meriv dikare bibêje mekanê sereke erdnîgarî ye û ev erdnîgarî ji Qersê heta Rûsyayê mekaneke berfireh e, yanê Qafqasya ye. Di romanê da navê gelek mekan û çî û waran derbas dibin. Wek mînak bûyer li Surmeli, Gundê Azatê, Alêksandrovskê (Komesorê), Qereqela Baro, Qers, Rûsya, Tîblîs, Rewan, Vladîqers, Novo-Mîxaylovsk, Qaqizman, Sarîbilax, Qiznefer, Sîpanê-Xelatê, Entab, Milazgir, Karmûnc, Zozanê Sînekê, Sarîqamîş, Axbaran, Stavropol, Stalîngrad, Lenîngrad, Dîgor, Elegez û hwd. derbas dibin yan jî diqewimin. Di romanê da bûyer bi gelemperî li ciyên vekirî derbas dibin û tenê wek nav hene. Bi gelemperî gundên Erebbê û malbata xwe lê şîvantî û gavantiyê dikin, zozan, çol, bajar û warên lê dimînin, mekanên romanê ne.

2.3.6. Ziman û Şêwaz

Melzemeyê sereke yê edebiyatê ziman e. Ziman amûreke “vegotin” û “têkiliyê” ye. Cureyên wekî destan, çîrvanok, helbest, çîrok û roman bi awayên curbecur ji vê

²⁷⁰ Şemo, h.b., r. 62.

²⁷¹ Şemo, h.b., r. 149-150.

amûrê sûd werdigirin.²⁷² Hêmayên romanê yên wekî çîrok, rêzebûyer, leheng û mekan-dem bêyî ziman nikarin di cîhana afirandî ya romanê da bîn honandin.²⁷³ Roman wek metneke honandî bi alîkariya ziman ava dibe. Lê zimanê di romanê da ji zimanê xeberdanê cuda dibe û li gor hunerê tê guherandin.²⁷⁴ Yanê her roman zimanê xwe diafirîne û taybetiyên zimanê berhemeke edebî jî şêwaza berhemê eşkere dikan.

Zimanê di *Şivanê Kurmanca* da zimanê xeberdanê ye, yanê zimanekî honandî û çêkirî nîne. *Şivanê Kurmanca* bi gelemperî bi zimanekî sade yê li herêma Serhedê tê xeberdan hatiye nivîsandin. Loma jî meriv dikare bibêje şêwaza Erebe Şemo şêwaza xeberdanê ye. Wekî mezinekî malê ji bona malbata xwe behsa jiyana xwe bike şêwaza di *Şivanê Kurmanca* da derdikeve holê. Wek mînak nivîskar dema qala guran û tirsan wan ya li ser xwe dike wekî xeber dide dinivîsîne:

“Paîzê, nêzîkî gundê em têda rênçber bûn, gur hebûn. Wana xwe davîte kerîya, pez ji kerîya didizî û gelle zirar dida riatê. Dê û bavê min gelle ditirsîyan derheqa silametîya pezê min diçêrand; ewana gellekî ditirsîyan seva min, zanbûn, - ezî zarim, nikarim ber gura teyamîş bim. Sawa gura jî saweke zafe çetine. Wexta êvarê min pez danî nava gund, me pez hesab dikir, pez silamet derdiket, dê û bavê min şîkrîna xwe ji xwedê danîn, digotin: Şikir ji xwedê, îro jî silamet derbaz bû.”²⁷⁵

Di romanê da bi gelemperî xeberdana rojane di nav diyalogan da derdikeve holê, lê Erebe Şemo di seranserê romanê da zimanê xeberdanê diemilîne. Hevokên di romanê da dirêj û tevlihev nînin, wekî zimanê rojane kurt in. Ev şêwaza ziman jî vegotina *Şivanê Kurmanca* ji zimanê romannûsiyê dûr dixê û nêzî zimanê çîrokbêjîyê dike. Wek mînak:

“Qavreş ku dît ez vegeîyam, hatim, xwe li stuyê gur xist, lê gur qe netirsîya. Gur Qavreş hevdu birin anîn. Heyfa min kûçkê min hat, min mî devê gurîda hişt, ez hatme hewarîya Qavreş. Hetta min xwe gîhandê ewî idî gur kire bin xwe û gur dixeniqand. Raste, gurî bin Qavreşda bû, lê gur ji binda ussa dev kiribû xeneqa Qavreş, kastîniya heywên bû. Min jî idî xwe nêzîkî wan kiribû, menzîla orta min wan çend gav. Darçira, ku serê şivdara mida, alavê dabîje, dişixulî, min da destê çepê. Ez qûzî erdê bûm. Min kevirekî mezin hilda destê xweyî rastê. Ez nêzîkî wan bûm, min agir dirêjî pozê gur kir û kevirekî mezin min avît, parxana gur xist. Gur destxweda, qirka Qavreş berda. Qavreş ew vegevizand, gur nişkêva ji nav dest-pê Qavreş derket, revî çû gêlî. Qavreş da pey.”²⁷⁶

²⁷² Tekin, **h.b.**, 171.

²⁷³ Yılmaz, **h.b.**, r. 102.

²⁷⁴ Tekin, **h.b.**, r. 172.

²⁷⁵ Şemo, **h.b.**, r. 67.

²⁷⁶ Şemo, **h.b.**, r. 70-71.

Di *Şivanê Kurmanca* da ji diyalogan jî tê îstifadekirin, lê diyalogên di metnê da zêde dernakevin pêş. Kesên di romanê da li gor mekan û zemanê di nav da ne yan jî li gor derûniya di nav da ne napeyivin, li gor tşkiliya civakî ya di navbera wan da heye diaxivin. Wek mînak:

“Carekê ez çûme ber derê yekî, navê wî Îvan bû, gundîya gazî dikirê bi navê zêde-Darço. Îvan derket, hate ber dêrî, ji min pirsî:

-Tu çi dixazî?

Min caba wî da, got:

-Ez dixazim bibme xulamê mala te.

Îvan kenîya, got:

-Tu xwe zarî, xebatê ji te çêbe.

-Na? Min caba wî da, -wekî tu min bigrî, çîqa xebata te zivistanê hebe, ezê bikim.

Wa li min nihêrî. Hevekî duşurmîş bû, got:

-Lazekê vir bisekine, ezê hatim.

Min texmîn kir, mala xwe dişêwire, wê bê. Ussa jî derket. Lazekê şûnda Îvanov derket, hat û dikene:

-Ezê te bigrim, lê tu heqî peretî nadme te. Nanê te, xwarina te stu min.

Serda zêde kir, got:

-Wekî tu rind bixebitî, divek, ez biharê, wextê çûyîne tişteki bidme te.

-Bira be, axa, - min caba wî da, got. Min jî tu dawa pera nedikir. Ezî razî bûm, wekî min nanoziko bigrin, çimku ew heqê bavê min distand, têra me nedikir. Zarê me hûr bûn. Birêd min jî hê yançî dihatne hesabê, wana nivheq distand.

Îvanov gote min:

-Îro here mal, sibê-zû were.”²⁷⁷

Di diyalogên di *Şivanê Kurmanca* da carcaran hevokên naqedin û xitab jî hene. Ev jî vegotinê herikbar dike û vegotinê zêdetir nêzî xeberdana rojane dike. Wek mînak:

“Hinda mala Qubatê Emo, du jina, piste-pista wan bu, hevra digotin:

-Wey la porkurê, lê-lê te bihîstîye, dibên kurê Şemo çûye, patşê bikuje. Hila tu lê binêr, ha...

Ya dinê dengê xwe bilind dikir, digot:

-Xweyê tev derewin, kurê Şemoyê camêr, eva du hevtêne, nexweşe, nav cîyadane, belengazî wê ber mirinêye kuda çû, patşê bikuje?

Ewe dîsa dengê xwe hêdîkava berda, got:

-Pî-î... ne kurê Şemoyê cînarê we, ew mêrikê tezehatî, ew Şemoyê golikvan. Erebe Şemo...

²⁷⁷ Şemo, **h.b.**, r. 74-75.

-Lê min tirê-tu Êsê Şemoranî, ew belengazî zafî nexweşe.

-Ê...ê...de bêje, min qe nebihîstîye.”²⁷⁸

Di gelemperiya *Şivanê Kurmanca* da şêwaza nivîskar serdest e. Kesên di berhemê da bi gelemperî li gor zimanê Erebe Şemo diaxivin, li gor rewşa xwe napeyivin. Ji xeynê çend mînakan ev rewş di seranserê romanê da dewam dike. Wekî mînak mele û şêx di romanê da wiha diaxivin: “Şêxa, mella û pîra her-ro digotin: -Kî gura meznê xwe neke, ewe bê xwedane, tu carî qencîyê nebînîn, ne li vê dinê, ne li wê dinê.”²⁷⁹ Beg û axa bi zimanê xwe yê serdest diaxivin û gefan dixwin, “Wekî tu carekê din jî bêy vandra, ezê çermê piştta te rakim.”²⁸⁰ Di mînakeke din da jî karmendê dewletê wiha dipeyive, “Hevtek tera molet, wekî tu mihîna min nebînî, neyînî, ez ê çermê piştta te jê kim, tijî xwê bikim.”²⁸¹ Mînakên bi vî awayî yê nêzikî zimanê wan yê rojane ye bi piranî ji devê serdestan hatine gotin. Mînakeke ji bona zimanê bindestan jî wiha ye:

“Mistoyê belengaz herro sond duxar, digot:

-Heyran, ga qe neketibûne zevîyê, her serê zevîyê diçêrîyan, min qe tu zirar nedabû wî, xwedê aykê min belengazî ji wîra nehêle...

Digrîya û wiha digot:

-Kê şikîyatê gavanê belengaz pirs bikira!”²⁸²

Bi kurtasî diyalogên romana *Şivanê Kurmanca* ji du biran pêk hatiye: Serdest û bindest. Kesên di romanê da ji ser van herdu biran va ava bûne. Gelek diyalogên romanê jî di navbera van biran da diborin. Loma jî kesên di romanê da li gorî zimanê serdestî û bindestiyê diaxivin.²⁸³

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da gotinên pêşiyar, biwêj û qalibên bi Kurdî zehf emilandiye. Ev jî nîşan dide nivîskar hakimî zimanê gel e. Wek mînak “Qîre-qîr, zare-zareke ussa ketibû, nava şêher dê ewladê xwe davît.” (r. 171) “Hefttek tera molet, wekî tu mihîna min nebînî, neyînî, ezê çermê piştta te jê kim, tijî xwê bikim.” (r. 93) “Min zûda goşt nexwaribû, diranê min hev xwarin.” (r. 116) “Ez ku derketme berderî, mîna pezê gêj dora xwe diçûm, dihatim, min rîya xwe nedidît.” (r. 165) “Ev gilîyana ez lap bêguman kirim. Ez teze ser wan xebera ketim, wekî Sefo eva sal-nêvekê min dixapîne, mîna bizna kal min didoşe, şîrê min dixwe.” (r. 130) “Dîwanê lê nihêrî kesek

²⁷⁸ Şemo, **h.b.**, r. 156-157.

²⁷⁹ Şemo, **h.b.**, r. 190.

²⁸⁰ Şemo, **h.b.**, r. 114.

²⁸¹ Şemo, **h.b.**, r. 93.

²⁸² Şemo, **h.b.**, r. 64.

²⁸³ Yılmaz, **h.b.**, r. 104.

ser xebatê nemaye paşê xwe xwa nava mêşe ket, pale bi lava û dîleka top kir, rojheqê wan jî zêde kir. Ji wê rojê şûnda, pale îdî devgerm bûn.” (r. 145) “Meznê wan kulmek li serê min xist, ez ketim, bû qîrînîya min, dengê min çû erşê ezmana.” (r. 150) “Lao, hûnê hîla zarin. Bîna şîrê dîya we ji devê we tê, lê ez eskerê kevnim, min waqa şer dîtine. Bira bê bîna barûtê, çika emê binêrin -kî berxe, kî berane.” (r. 180) “Em şev ji Stavropol derketin. Şeve ker bû, kuxîn ji yekî nedihat.” (r. 181) “Esker ketibû hazirbûn bona şer. Tevî eşk bû. Sîqînîya diranê wan bû. Dixwastin têne şer.” (r. 181) “Herekê yekê rûşet dida Ûsib begê, xilaz dibû, dihate mala xwe, îcar Egît begê birazîyê Ûsib begê digirt, ewî jî herçê ber derê wî hebû, top dikir, distand. Eva yeka malê kesîba wanra çewa donê ser helîsê kîjanî ji xwe şerm nekira, diçû malê kesîba, jê distand. Egîd beg xelk ussa talan kir, idî neynok tunne bû, wekî xwe bixuranda.” (r. 189) “Me hevra hêlan dayê da. Lawika tê dahatin. Me şûr-qemê Egîd begê studa danîn, qetandin. Lawika ew ussa kutta, mar bin zikê wî ra nekişîya.” (r. 197) “Li destê minî rastê qumandarê meyî mezin bû. Li avtomobîlê suyar bû, mîna gurê dev bi xûn, diçû- dihat, hukum dikir.” (r. 170) “Xulamê bin pîya de sekinîne. Yek şixulê wî ewe -her, cîgara wî dadigre û cîgara jê re dipêçe, yê dinê jî qawê jêra çêdike, yek jî sekinîye, qamçiyê wî hazirî destdane, sîqînîya diranê wîye, çika begê çî hukum bike, kê bikute, yan gazî kê ke, yan jî malê kê jê bistîne. Tu li takara stuyê xulama dinêrî, mîna takara stuyê xinzirê nava qemûşda beyanî -terxan diçêre.” (r. 96) “Kevanî belkî destê te ji eyarê rûn dernekeve. Belkî yeka te bibe hezarî. Belkî hûn silametî derbas kin li zozana, malê we silametî ji zozana dagere, bê.” (r. 97)

Di romanên da bi saya teswîrê bûyer, kes, zeman û mekanê di dinyaya honandî ya romanê da ne eşkere dibin.²⁸⁴ Di *Şivanê Kurmanca* da ji bona rîtmekê bide çîrokê carna ji teswîran jî tê îstifadekirin. Di romanê da bi gelemperî her tişt tîn qalkirin, loma jî teswîrên di romanê da vegotina di romanê da herikbar dike û vegotinê sivik dike. Wek mînak:

“Kale-kala mîya, berxa, kilamêd qîz û xorta tev hev bibûn, ew best û newal tijî kiribûn, meriv wê şabûnê têr nedibû. Gundî tev ji hundirê mala derketibûn, rabûne ser xaniya, sekinîbûn dîna xwe ji dûrva didane kerêd pezê xwe, yê idî ji gund êpêçe dûr ketibûn, hinek jî sekinîbûn ber derîya û axîla, dîna xwe didanê, çewa malê wan ber bi zozana eşq-şayî diçe. Şaya wa du pa dikir dewletîya, çimku kesîb tiştêkî wan tunne bû, pezê wan hindik bû, kincê wane teze jî tunne bûn.”²⁸⁵

²⁸⁴ Tekin, **h.b.**, r. 217.

²⁸⁵ Şemo, **h.b.**, r. 100.

Ereb wexta li dibistanê çavên wî bi sifetê ji bo darsa anatomiyê ye dikeve wiha teswîr dike:

“Lê gerekê ez bêjim, -rex wan sifetêd rind, sifetekî way nerind darda kiribûn. Ew sifet gava ku min didît, ez ditirsîyam. Sifet xwe-xwe mîna şiklê merîya bû: çavne mezine kûr, pozî kort, qafê wî rût, movikê hestûyê canê wî yeko-yeko duxanê bûn, tilîyê lingê wî yan tilîyê destê wî ussa dirêj bûn, -meriv tirê- tilîyê şahba, çewa mera çîrokada, kala digot. Canê wî sifetê dardakirî, qe goşt lê tunne bû. Xwelese, gava ku meriv didît ziravqetîyay dibû. Rastî, min tirê-ew sifetê cinane yan yê “şahba” ne, çimku cara kala wextê zivistanê mera gelle çîrok digotin û wan çîrokada gilîyêd ussa tirs hebûn.”²⁸⁶

Ji bona teswîrên di *Şivanê Kurmanca* da mînakeke din jî wiha ye. Wexta Ereb dest bi mektebê dike û şal jê ra tê sitendin şal wiha teswîr dike:

“Bavê min çû Qersê, ji min ra kirî şalekî kevn, kumek û potekî dirêj. Milêd wî gellekî dirêj bûn. Diya min minra kin kir. Bi van kincava ez idî waqa ji wan zara nedihatime kivşê, çimku ew kincê mine berê pînekirî-cûre cûre pîne lê dirûbûn, hinek jî qelişbûn, jorda darda dibûn, ussa kevn bibûn, idî ber dirûna derzîyê teyamîş nedibûn, diqetîyan, jorda dihatin.”²⁸⁷

Di *Şivanê Kurmanca* da teswîrkirina kesan kêma e. Di romanê da pirî caran kes bi navê xwe derbas dibin yan jî bi karê xwe tên zanîn. Wek mînak di romanê da teswîrkirina kesan ya fizikî wiha tê kirin: “Zabit, kincne teze lê, ser-sûretê wî kur kirî, porê wî şekirî bû, kivş bû-kurê dêye, teze ji şêher hatibû.”²⁸⁸

“Ji nava wê komê yekî-kincne peritî lê, kosolekî rindî girêdayî, cotê çarixê peritî lingada bûn, arxalixê wî peritîbû, cûre-cûre pine lê xistîbûn, sere pîna gîhandîbûne hevdu, meriv tirê-qest neqîşandîbûn. Şalê lê peritîbû, ser çoka wî têra derdiket. Gav rûdinişt, pêşa arxalixê xwe ji şerma davîte ser çoka xwe, wekî ew cîyê qetîyay kivş neke. Wextê ew gilî dikirin, ewî tamûl nedikir, cara dikir xeber de. Cara axe-ax jê dihat, cara jî serê xwe ber jêr dikir, ker dibû. Min texmîn kir, wekî ew camêr ber dilê xwe nade, dike bêje, lê mecal nakevê.”²⁸⁹

Di dereke din ya romanê da wek mînak Egît Beg wiha tê teswîrkirin: “Simêlne qaline terikî, mîna simêlêd boşê sîrfiroşa, ser lêvê wîda hatine.”²⁹⁰

Di romanê da herî zêde teswîrên derdor û tebîetê hene û derdikevin pêş. Hin Mînakên ji bona teswîrên xwezayê wiha tên kirin:

“Berwarê çîyakîda em diçûn hespa serî kuttabû ser hevdu hêdî hêdî dimeşîyan. Tavê dabû hemû cîya. Xulle-xulle kanîya bû, dikişîyan. Şav kanîyada soyê, mendikê, tirşo û pincara mayîn navnêrî dabû. Kulilka devê jev vekiribûn,

²⁸⁶ Şemo, **h.b.**, r. 86-87.

²⁸⁷ Şemo, **h.b.**, r. 87-88.

²⁸⁸ Şemo, **h.b.**, r. 182.

²⁸⁹ Şemo, **h.b.**, r. 194.

²⁹⁰ Şemo, **h.b.**, r. 195.

reng-rengî bû, li me dinêrîn. Bîna wan kulîlka xweş dihat. Hespa cara xwe qûz fikir, devê xwe davîte hêşnaya teze, rind dixwarin.”²⁹¹

“Rojêd bihara dirêj bibûn. Meriv tirê idî ro xilaz nabe. Cara tavîya baranê dihat, alîkî tav bû, alîkî jî baran dibarî, keskesorê jî xwe dabû alîyê mêşe, roke zafe rind bû. (...)

Carna çivte-çivta çivîkê biharê dihat, hivş bû, -wana hila cîyê xwe nekiribû. Esker xwera çû, her qerewil digerîyan. Xirme-xirma hine hespa bûn, kirçomê alifê dixwarin, xilaz dikirin. Hîn cara dikete bin ewr, dibû şeverêş. Carna jî ji bin ewr derdiket.”²⁹²

Di şêwaza *Şivanê Kurmanca* da ji peyvên dubare jî zehf tê îstifadekirin. Heta ev wek taybetiyeke sereke ya şêwaza Erebe Şemo ye di *Şivanê Kurmanca* da derdikeve pêş. Bi saya peyvên dubare hest û fikir baştir tên nîşandan û vegotin û mene zexim dibe. Di romanê da peyvên dubare bi çend awayan derdikevin holê. Wek mînak dubarekirina heman peyvên: “...**bere-bere** aşkela bû...” (r. 148) “...movîkê hestûyê canê wî **yeko-yeko** duxanê bûn...” (r. 86) “...bîna **cûre-cûre** pincar jê tê...” (r. 116) Di romanê da du peyvên yek meneya wê heye û ya din tune ye tî dubarekirin: “...qisîl, feraq û **hûr-mûrê** mayîn...” (r. 62) “...me ji hev **kajî-vajî** kiribûn...” (r. 158) Peyvên meneya wan nêzî hev e tî dubarekirin: “...kulavekî peritokî **qul-qulkî** bû...” (r. 58) “Me **pot-palase** xwe...” (r. 62) “...kulîlka devê jev vekiribûn, **reng-rengî** bûn...” (r. 139) “...her-ro **şilî-şilope** bû...” (r. 142) “...wana **xerc-xerac** pêşkêş ji qebîlê top fikir.” (r. 193) “...**wîyalî-wîyalî** xwe dinêrî...” (r. 124) Hin peyv paşgirê digirin û tî dubarekirin: “Dora çem, hetta **çav-çava** dibirî...” (r. 62) “...min **leze-lez** xebata xwe jî kutta kir...” (r. 89) “...pez **çêre-çêre** diçû...” (r. 100) “...dîsa **tele-tel** çewa bostanada ez çûme hetta serê golê...” (r. 69) “...ez hema **kere-ker** cîyê xweda sekinîm...” (r. 123) Di romanê da wekî din peyvên dubare yê dikevin dewsa dengên di tebîtetê da hatine emilandin: “**Kûre-kûra** zara bû digiryan...” (r. 54) “Ez ditirsim, wekî ew me bibîne û tîke **qalme-qalm**, zar ziravqetî bibin...” (r. 55) “Nişkêva bi zimanê xwe bû **bille-billa** wî, xeberda...” (r. 55) “Ji sermê **lûbe-lûba** min bû...” (r. 68) “...**pirte-pirta** dilê min bû...” (r. 70) “...bû **şeqe-şeqa** dirê wî...” (r. 71) “...bû **piste-pista** wan...” (r. 75) “...**kale-kale** mîya...” (r. 100) “...ber surrê û sermayê **çeqa-çeqa** dev-diranê me bûn...” (r. 104) “...seva wan belengaza **zêre-zêre** wan û **lûbe-lûbe** wan...” (r. 132) “...**xulle-xule** kanîya bû...” (r. 139) “...nava **çeqe-çeqê** û kuştinê...” (r. 140) “...**qîre-qîr, zare-zareke** ussa ketibû nav şêher...” (r. 171) “...carna **çivte-çivta** çivîkê biharê dihat...” (r. 178)

²⁹¹ Şemo, **h.b.**, r. 139.

²⁹² Şemo, **h.b.**, r. 178.

Zimanê *Şivanê Kurmanca* bi tena serê xwe hêjayî lêkolîneke berfireh e. Lewra him peyvên resen yê bi Kurdî tê da hene û him jî gelek peyvên li ber wendabûnê ne û nayên emilandin tê da hene. Zimanê *Şivanê Kurmanca* ji hêla term û peyvên derbarê ajalvanî û heywandariyê da jî gelek dewlemend e. Wek mînak: “**agir vêsîn**: vemirîn, temirîn, tefîn / **agir vêsandin**: vemirandin, temirandin, tefandin / **alûrke**: lapeya ji bo heywanan tê çêkirin / **arxayîn**: piştrast / **avek jê ra zelal kirin**: çareserî / **barbir**: heywanên ji bo bar / **bêfesal**: bêkeys, bêfirsend / **midas**: sol, pêlav / **(di) ber dila da hatin**: li ber dilan çûn û hatin, teselîkirin / **beranberdan**: roja ku beranan berî nav mîhan didin / **hingê**: wê demê, wê çaxê, wê gavê / **berhingê**: berî hingê, berî wê demê, berî wê çaxê, berî wê gavê / **piştî hingê**: piştî wê demê, piştî wê çaxê, piştî wê gavê / **berk**: xurt, zexm, hişk / **berodan**: berda(yi)n, zayîn (roja/eyda berodanê: roja zayîna mîhan) / **berşivka kulêv**: di kulav da ciyê ku şiv dikevê / **berx kîs kirin**: berx koz kirin, pez koz kirin, berx ji mîhan veqetandin / **bi perda fesal gotin**: xeberdana bi baldarî / **bijarkar**: yê hildibijêre, yê dineqîne, yê ji hevdu vediqetîne / **bîn û bux**: bîn û bux, bêhna xweş / **binatar**: binetar, bintar, jêr / **pêpelîng**: pêplûk, pêpelûk, pêlik / **bindarûk**: ger û geşt / **birûsî**: ronahî / **birûsiya êgir**: ronahiya agir / **birûsiya darçirê**: ronahiya darçirayê / **boşe**: poşe, qereçî, cengene, mirtiv / **bû çirpînîya dilê min**: lêdane dil / **qalmeqalm**: qerebalix / **busye**: dafik, kemîn / **reng lê çûn**: sipîçolkî bûn / **çarneçarî**: neçarî / **çencirûk**: xeramûşk, xincirûk, neperûşk, naprûşk, naperûşk, pencerûk / **cew**: cih, cuhok / **çika**: ca ka, bê ka, hela ka / **çilape kirin**: xwe çeng kirin / **çirûsî**: çirûsk / **çîfî**: çênî, perçe / **darçira**: xetîre, meşale / **daw danîn**: gefxwarin, lihemberderketin / **dest jê kişandin**: dev jê berdan, dest jê berdan / **destpirçkî hev bûn**: daqilaçî hev bûn / **(di) dest xwe da** : demildest / **devgerm bûn**: li xeberdanê vebûn / **mêşe**: daristan / **dibek**: belkî, dibe ku / **dan ber dilê xwe**: xistin himbêza xwe / **havîj**: bijîn, bijîyan / **dilê meriv xwe-xwa havîj dibîyêda**: dilê meriv dikşîne, dixwaze / **zêrandin**: êşandin, ezab dan / **zayandin (dizeyînin)**: welidandin / **dolge, dol**: newal / **emr**: jîyan / **emrê wan gehîşte hevdu**: jîyana wan bû yek / **êgin**: jêhatî / **êm**: dem, wext / **fesal çûn**: bi semt çûn, bi dîqet çûn / **fino**: fes, kum / **givrik**: givrok, givrik bûn / **guhê xwe tûj kirin**: guhê xwe bel kirin / **gulle agir kirin**: gule berdan / **gumreh**: pir, zêde, zehf, xurt²⁹³ / **serê çena kuçê**: koşeya kuçeyê / **kiş**: kifş, xuya, diyar, eşkere, ji hev hatin kivişê, ji hev dan kivişê / **hal û medet**: hal û ehwal, hal û mesele / **hedimîn**:

²⁹³ Ev lîste û ferhengok ji Mustafa Aydoğan hatiye hildan û di ravekirina wan da hin guhertin hatine kirin. (Bnr. Mustafa Aydoğan, “Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo - I”, *Kurmançî*, j. 45, (2009), r. 1-2)

sermakirin / **ziravhênîk**: tirsonek / **heq kirin**: defînkirin, veşartin / **hêşka**: gavek berê / **hewarî birin**: hewardaxistin / **hewarî**: hawar, hewar / **hevek**: hebek / **hêwerze**: hêwirze, tevlihevî / **hevk birin**: hetik birin, rezîlkirin / **heyat**: hewş / **heyf vekirin**: heyfsitandin, tolhildan / **barbir**: hemal / **heyfî tişteki/keseki bûn**: pêwistî çêbûn / **hila**: hela, hêj, hê, hê jî / **himangî**: bi zorê / **hukum qedandin**: bicîanîn / **hurum**: rûm, yewnan / **hûr xaş kirin**: perçekirin / **îstintaq kirin**: îfadehildan / **kajî-vajî**: belawela / **ji şabûna lingê min (li) erdê nediket**: kêfxweşbûn / **kaw bûn**: şa bûn / **kaw**: xweşik / **kese**: kurtasî, rêya kurt / **ketxuda**: kedxuda, mixtar / **kêf kok xwey kirin**: kêfkirin / **zêrkildayî**: avzêrkirî / **zîvkildayî**: avzîvkirî / **kûrme**: sotik / **lap**: tam, zêde / **lê girê dan**: lê reşandin / **lê-lê bûn**: çav lê bûn / **lotî**: serberedayî / **mehik**: cezbe, cizbe / **hilqoşandin**: helavêtin / **navnêrî dan**: nêrî-nêrîk dan / **nenere**: tiştên nemayî-nebûyî²⁹⁴ / **ji (min) tirê**: min digot qey / **parxan**: parsû / **payê xwe dan**: pesnê xwe dan / **perekende**: belabelayî, belawela / **pêrênc**: pêrenc, keda pê / **pesarî**: kermeyên çolê / **pîgar**: alîkar / **pirçûkirî**: me'dkirî, mirûzkirî / **nenere**: nebûyî / **pişt jê standin**: ji pişt va dorpêçkirin / **pot û palas**: kinc û minc / **qalim**: qalind / **qax**: koncal, çal / **notla**: wekî / **qedandin**: pêk anîn / **qelaçî**: qelaçe, xendek / **qelînok**: qelînek / **qemitandin**: zeliqandin / **qerefil**: xizemên bişirik / **qestîka**: bi henekî / **qird (pezê qird)**: qert / **qirinte (merîkî qirinteyî)**: qerese / **qisîl**: hesîr / **qor (pezê qor)**: zêf / **quluxçî**: karmend / **qûnî**: (qûrê /noqî)... bûn / **qûz**: (xûz) bûn²⁹⁵ / **reşotankî**: qemer, reş / **rev li ... xistin**: revandin / **revo**: revî, keriyê hespan / **rikevî (rikêbî) yek kirin**: êrîşkirin / **rojbehêrî**: rojderbaskirin / **rojheq**: yewmiye / **rûyê şîr girtin**: girtina tû / **saskar**: sazkar, lihevhatî, lihevkin / **serfinîyaz**: serfînyaz, serfiraz, serbilind / **serkar**: yê kar îdare dike / **sondeke berk**: sondeke giran / **şeyî**: 5 quriş / **şerê grajdanî**: şerê navxweyî / **şewra xwe pê xistin**: pêşewirîn / **şiro kirin**: îzahkirin / **şivdar**: ço / **tarîban**: tarîbarî, tarîbar / **haco haco kirin**: hiço hiço-hiryoy hiryoy kirin (ji bo kûçikan berî tişteki bidin) / **xwe telandin**: xweveşartin / **teletel, teletelî**: dizîkava / **terikî**: qerese / **tîher**: teher, awa / **tûrûtêla kirin**: tarûmar kirin / **tûtûrût kirin**: tazîkirin / **wekilandin**: dubarekirin / **xarandin**: piyasekirin, bezandin / **xepexep girtin**: ji nişkêva / **xerîbdost**: yê zû têkilî datîne / **hilqoşandin**: xwehelavêtin / **piştostan**: serpişt / **xepe-xep**: xafil / **xwe ta kirin**:

²⁹⁴ Mustefa Aydoğan, “Şivanê Kurmanca - II”, **Kurmançî**, j. 46, (2010), r. 3.

²⁹⁵ Mustefa Aydoğan, “Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo - III”, **Kurmançî**, j. 47, (2010), r. 3.

tenê mayîn, xwe veşartin / **zêwezêw**: zêwirîn, zîwezîw, gurmînî / **zimêr**: zimhêr, qût, zexîreya zivistanê.²⁹⁶

Di *Şivanê Kurmanca* da li herêmên bûyer derbas dibin gelek gel hene û peyvên ji zimanê van gelan jî di berhemê da derbas dibin. Di berhemê da peyvên Tirkî, Ermenîkî û Rûsî zehf tîn emilandin. Di berhemê da peyvên bi Tirkî yên bi gelemperî derbas dibin ev in: “**Duşurmîşbûn** (fikirîn), **çiçek** (kulîlk), **yançî** (alîkar), **bol** (zehf, pir û gelek), **temîz** (pak û paqij), **êpêce** (zehf, pir û gelek), **mart** (adar), **ekincî** (cotkar), **ekin** (çandin), **emek** (ked û xebat), **teyamîşbûn** (sebirkirin), **temî** (şîret), **guc** (zehmet), **otax** (ode), **oyîn** (lîstik), **obek** (kom), **obebaşî** (serek), **yêr** (erd, cî û war), **axaler** (axayan), **aylix** (mîaş û mehane), **çomax** (ço û darik), **boş** (vala), **alebalix** (cureyeke masiyan), **tek** (tenê), **tam** (bêkêmasî), **xebatçî** (xebatkar), **beyraq** (ala), **arxalix** (berpal), **dikançî** (dikandar), **arişvêrîşçî** (dikandar), **temûz** (tîrmeh), **ordî** (artêş), **talîmatçî** (şîretkar), **birincî** (yekem), **orte** (nav, navîn), **benz** (wech û rû), **başqe** (wek mayîn), **eynî** (heman), **molet** (wext), **torbe** (telîs), **eîla** (zozan), **casûs** (sîxur), **ixtîyar** (kal, pîr), **sîlha** (çek), **topkirin** (komkirin) û **qayê** (zinar).”

Peyvên bi Rûsî û Ermenîkî yên di berhemê da derbas dibin jî ev in: “**batrak** (bi Rûsî ye): xulam, rênçber / **dêpûtat** (koka vê peyvê Latinî ye û ji peyva “deputatio'nis”ê tê, lê bi Rûsî tê emilandin): parlamenter / **dirûjîn** (bi Rûsî ye): kom, taxim / **dvornîk** (bi Rûsî ye, ji gotina hewşê çêbûye): kesê ku hewşê paqij dike / **eksînglabkar** (“eks” bi Erebî ye û înglab jî ji “înglab”a Erebî ye û “kar” jî bi Kurdî ye): dijşoreşger, yê li dijî şoreşê / **fîrgûn-fûrgon** (bi Rûsî ye): erebeya yrkhespî û duçerxî-dutekerî / **gilavî** (bi Rûsî ye): serok / **glavlît** (bi Rûsî ye): sansurkar / **gvardîya**: yekîne / **kamavor** (bi Ermenîkî ye): bi dilxwazî / **kaxtegan** (bi Ermenîkî ye û eslê wê “gaxtakan” e û di Kurdî da guheriye): mihacir / **kazonî**: yê dewletê / **kûxnî** (bi Rûsî ye): mitbex / **lak** (bi Rûsî ye): xwarina kûçikan / **lozûng**: slogan / **maşênî**: ev gotin bi Rûsî ye û bilêvkirina wê ya bi Rûsî; maşîna ye û meneya wê “makîne” ye, lê Kurdên li Ermenistanê dibêjin maşênî û vê gotinê ji bo “trên”ê diemilînin / **melegan**: navê Rûsên xaçparêz, lê ortodoks nînin, pirtûka wan a dînî Încîl e û hemû birû ne / **mêşok** (bi Rûsî ye): telîs, çewal / **neçelik** (bi Rûsî ye û eslê wê “naçalnîk” e): şef / **padval** (bi Rûsî ye û eslê wê “podval” e): jêrzemîn / **paganîc** (bi Rûsî ye): gundê ser sînor / **papax** (bi Rûsî ye): koloz / **pênz** (bi Rûsî ye):

²⁹⁶ Mustefa Aydoğan, “Şivanê Kurmanca ya Erebê Şemo - IV”, *Kurmançî*, j. 49, (2011), r. 2.

kevirê qulqulkî, kevirê kaxçînê / **prîstav** (bi Rûsî ye): nûnerê dewletê yê di nav gel da / **pûlêmot** (bi Rûsî ye, pûlyê: fişek, myot: reşandin): reşaş / **qerewil** (bi Rûsî ye): nobedar, notirvan / **razvêdka** (bi Rûsî ye): tîma keşfê / **sapok** (bi Rûsî ye): potîn, cîzme / **trûbke** (bi Rûsî ye): destikê têlêfonê, ahîze; qelûn / **vazgal** (bi Rûsî ye, eslê wê “vokzal” e): rawestgeh, îstasyon / **vêş** (bi Rûsî ye): bar / **vîlke** (bi Rûsî ye): çetel / **ximpapêt** (bi Ermenîkî ye, xûmb: grûp, kom; pêt: serok, şef): serokê komê û **zavod** (bi Rûsî ye): fabrîqe.”²⁹⁷

Di *Şivanê Kurmanca* da di hin beşan da materyalên folklorîk cî digirin. Erebe Şemo di honandina *Şivanê Kurmanca* da cî daye stran û destanan. Di romanê da ev stran û destan rasterast hatine girtin û 2 stran û destanek heye. Strana yekem di beşa “Merkeba me. Rêncberîya nava melegana” da cî digire. Ev stran ya Rûsan e û dînî ye. Stran wiha derbas dibe:

“Gundîyê Alêksandrovskê pare vedibûn ser du qebîla yan du taîfa: nivî meleganê ‘postayanî’ bûn, nivî jî meleganê ‘prigûn’ bûn. Eva her qebîleke wan jî hev dihatne kivişê her aliyê dîna; dêra wan û keşîşê wan jî hev başqe bûn. Rojêd bazara yan rojêd wan ezîz qebîla ‘prigûna’ bi kilam û duea xwe huldîqoşandin, dibirin, danîn, mîna hine dewrêşê me kurmanca wextê dikeve ‘mehikê’ yanê ‘tarêqê’.

Hevak ji kilamê wane reqasê –dueayê:

Şeherekî rindî mezin

Li ser çemê Feratê.

Em xapandin wî ‘etlawî’,

Çavê wan jî kor bû.

Merîyêd biçûk²⁹⁸ diçe rast

Lê aliyê çepê²⁹⁹ tev bi kom...³⁰⁰

Erebê Şemo di vê beşê da qala cimaetên gundê Alêksandrovskê dike. Ji bona balê bikşîne ser durûtiya wan cî dide vê kilama wan. Lewra ferdên van herdu cimaetan jî gelek zextê li pale û xulamên xwe dikin. Di berdewamiyê da derbarê wan da wiha tê gotin:

“Ulmê dînê melegana derdiket ji kitêba wan ‘yêvanglîya’ di wê da nivîsîbûn: ‘Hiz bike yê nêzîkî xwe’, ‘Alî hev bikin’ (komekê bidne hev). Melegana teva hevra

²⁹⁷ Ev lîste û ferhengok bi destê Têmûrê Xelîl hatiye amadekirin. (Bnr. Şemo, **h.b.**, r. 200-201)

²⁹⁸ Di vê kilamê da Melegan xwe wisa pênase dikin. (Bnr. Şemo, **h.b.**, r. 63)

²⁹⁹ Melegan qesta neteweyên ji dînê wan nînin dikin. Yanê rêya çepê rêya rast nîne. (Bnr. Şemo, **h.b.**, r. 63)

³⁰⁰ Şemo, **h.b.**, r. 63.

digotin bira û xûşkê. Lê ne angorî wan gilîgotinêd xwe bûn: gelle zulm û zelûlîya wan hebû. Melegana xwe hesab dikir ‘xwedê nas’, lê milletêd mayîn wana hesab dikir çewa ‘xwedê ne nas’, ne temiz û xirab. Meleganêd kûlak xwe hesab dikirin çewa ‘sofi’, lê ew tev derew bû. Wana sibê hetta êvarê em badilhewa didane xebatê-êksplaotasî dikirin him em gavan, him jî kesîb -kûsîbêd gundê xwe melegan. Em, rênçber xwe, ussa dikutan, danîne halê kuştinê.”³⁰¹

Di romanê da strana duyem jî di nav destana Siyabend û Xecê da derbas dibe û stran ji devê Siyabend û Xecê tê gotin. Erebe Şemo di beşa “Li welatê Romêda. Klama Siyabendê Silêvîn û Xecê” da cî daye vê destanê. Erebe Şemo dema wekî wergêr di Artêşa Rûsan da ye û ber bi Çiyayê Sîpanê va diçe ev destan tê bîra wî û di beşa navborî da cî dide vê destanê. Ev destan û kilam di *Şivanê Kurmanca* da wiha derbas dibe:

“Em hatin nêzîkî çiyayê Sîpanî-Xelatê bûn. Mezinaya wî çiyayî ussa mezine, bawerke, -tişteki ji Egrî- Daxê danaxwe. Derheqa wî çiyayê Sîpanî-Xelatê kurmanca kilameke rind dibêjin û şiro dikin:

Xwedê giravî zaf zûda serê wî çiyayî digerîya xortekî zafî bedew û êgin, Siyabendê Silêvîn. Siyabend xwe ji êla zîllîya bû. Dilê Siyabendê Silêvîn ketibû Xecê. Siyabendî xwe kesîb bû, waqa malê wî tunne bû wekî qelenê Xeca bedew bida, ji xwera banîya. Xecê jî qîzeke zaf bedew bû, çîqa eşîreta dora wan hebû, wekî çavê kê li Xecê keta, aqîlê serê wan diçû. Dilê Xecê jî pir ketibû Siyabendê Silêvîn. Bavê Xecê kurmancekî orte bû, zambû, wekî dilê Xecê û Siyabendê Silêvîn hevda heye. Ewî jî Siyabend rind qebûl dikir, lê ji timaya dinê, nedixwast, qîza xwe bide Siyabendê Silêvîn. Ewî dixwast qîza xwe bide, qelenekî pir bistîne. Mêraya Siyabend, jê hatina wî, hurmeta wî û bedewîya wî meriv jê têr nedibû. Siyabend û Xecê ji emrê tebiatê herdu jî dengbêj bûn. Siyabend û Xecê dizîkava rastî hev dihatin, diketne kêf û heneka, lê gava dibû besa qelen, Xecê digrîya, Siyabend ber dilê wê da dihat, nedihîşt Xecê bigrî û sond dixwar, wekî- çewa hebe, hergê kuştin be, bi zor be yan xweşî be- destê wî tu carî ji Xecê nabe û wê Xecê xwera bistîne. Carekê qîz bûkê êla zîllîya top dibû, diçine bindarûkê. Xecê û Siyabendê Silêvîn jî diçûn, ji serê çiyayê Sîpanî-Xelatê waqa qîz-bûk top dibin, ji hesaba tê der. Gava ku Xecê û Siyabendê Silêvîn têne wê derê, devê teva xwar dibin, zûr dibin, li wan herda dinêrin. Gava ku dibû lîstik yan dengbêjî, dîsa kesek mînanî wan tunne bûn. Gelle kurêd bega, axalera û dewletîya dihatine xwezgînîyê Xecê. Xecê ew nedistandin.

Çend sal ketne ortê. Rojekê Siyabend Xecê revand, bire serê Çiyayê Sîpanî-Xelatê. Sê roj û sê şeva Siyabend û Xecê hev şa dibûn û zafe razî bûn, çewa emrê wan gehîşte hevdu. Roja çar, nava rojê, nav kulîlkada herdu rûniştîbûn. Siyabend, xewa wî hat, serê xwe da ser çoka Xecê, xewra çû. Wî çaxî ringe- ring hat. Xecê binîyêda li bestê dinêrî, gakuvîke rinde delal wê direve, du- sê gakuvîya daye pey. Lê gakuvîkî mezinî xalû xalî ew gakuvî tek kirîye, dibe, yê dinê newêrin, serda herin. Wextê eva yeka Xecê dît, Xecê digrîya, hêsir ji çavên wê dilop kir, hate kete ser sûretê Siyabend. Siyabend ji xewê banzda ser xwe, lê nihêrî, Xecê digrî, Siyabend pirs kir:

-Xecê, çima tu digrî? Divek tu poşman bûy?

Xecê gote Siyabend:

³⁰¹ Şemo, **h.b.**, r. 63-64.

-Na, eze ne poşmanim, hetta roja mirinê ez ji te dûr nakevim.

-Lê tu çima digrî? -Sîyabend ji Xecê pirs kir.

-Hêşka gakuvíkî, yeke gakuvíya rind dabû pêşîya xwe dibir, du sê heba ji dûrva pey diçûn, newêr bûn, xwe bidane ser. Ew gakuví mêrxaskî mîna tebû, ji şabûna ez girîyam.

-Ka, Sîyabend pirs kir: kîalî çûn?

Xecê nîşanî Sîyabend da, got:

-A, vî alîyê han çûn, -destê xwe dirêjî gerê kir.

Sîyabend rabû ser xwe, şûr û mertala xwe girêdan, tîr û kevanê xwe hilda, got:

-Serê vî çîyayê Sîpanî-Xelatê kesek ji min mêrxastir tunne, ez jî nêçîrvanim, çewa cem min gilîyê ussa bibe, -u rabû, pey ket, çû.

Sîyabend nêzikî gakuví bû, tîrkevanê xwe dirêj kir, wekî lêxe, gakuví xwe dirêjî Sîyabend kir, sturuyê xwe li Sîyabend xist, Sîyabend avîte gelî.

Lazekê şûnda Xecê pey çû. Wîalî-wîalî Sîyabend Sîyabend tunne. Xecê gellekî gerîya, hate hafa qeyê lênihêrî nale naleke wê ji binê gelî tê. Xecê qûz bû. Lê nihêrî çî binêre. Sîyabendî wê qeyêda binê gelî, nale-nal jê tê.

Xecê vira dest bi kilama kir, got:

Serê çîyayê Sîpanî-Xelatê wa bimije,

Binê çîyayê Sîpanî-Xelatê wa bimije.

Kê dîtîye, kê bînaye,

Wekî nêçîr-nêçîrvan bikuje?

Gakuvíyo, te stru dirêje wekî bejna mino,

Çewa te ji hev kir destê jin û mêro?

Stru dirêje weke dara sûkê.

Çewa te xirab kir bextê xort û bûkê?

Sîyabend got:

Xecê, Xeca mine delal,

Çewa nebû mirazê min te,

Meyê xwera serê Sîpanî-Xelatê,

Çekira konekî rindî delal.

Xecê, meke melûbîne,

Hêsira ser sûretê sorda mebarîne...

Sîyabend û Xecê gelle kilam gotin. Xecê kilamê xweda nifir dikir li çîyayê Sîpanî-Xelatê, kanîyê wê pincara wey kanîyê wê, u meşê wê. Xecê nifir dikir wê şînayê, ya ku lê çêrîya ew gakuví...

Çewa mira li wêderê salix dan, Xecê jî xwe ji zinêrda davêje. Eva kilama zafe mezine û nava kurmancada distrên û dibêjin.”³⁰²

Çîrok û destana Siyabend û Xecê di nava gel da bi sedan salan e tê gotin. Diyar e haya Erebe Şemo ji destan û kilamên Kurdî heye. Erebe Şemo jî li vir cî daye vê çîrokê, lê di nav metnê da beloq maye û tenê behs dike.

2.3.7. Teknîka Vegotinê ya Di Şivanê Kurmanca Da

Di *Şivanê Kurmanca* da bi gelemperî teknîka otobiyografîk û teknîka qalkirinê derdikevin pêş. *Şivanê Kurmanca* berhemeke otobiyografîk e, loma jî herî zêde ev teknîk derdikevin pêş. Lewra di vê rêbazê da vebêjer şexsê yekem e, yanê bi gotineke din kesê “qal dike” û “tiştê tê qalkirin” heman kes in.³⁰³ Di *Şivanê Kurmanca* da ji xeynî destpêka romanê şexsê yekem hatiye bikaranîn û nivîskar qala serborî û bîranînên xwe dike. Loma jî di metnê da vegotina bi vî rengî bi biyografiya nivîskar ra li hev dike û nêzîkî metnên serborî û bîranînê dibe. Erebe Şemo bi vê terza vegotinê dixwaze nîşan bide her tiştî ji rastiye hildaneye û têkiliya metn û jiyana xwe ya rastîn zexim bike. Jixwe di destpêka romanê da bi gotina “Çend zar ketne destê dîya min. Xûşkê min Çîçek, Gogê û ez, Erebe.”³⁰⁴ nivîskar xwe eşkere dike û di gelek ciyan da hebûna xwe venaşere û navê xwe bilêv dike. Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* da dîrokên rasterast dide û di navbera metna xwe û rastiye da têkiliyeke xurt çêdike. Wek mînak: “Paîzê, sala 1914-da, wextê hila ez ser zavodê dixebitîm, polkeke qazax hat wêderê, danî nêzîkî zavodê çadrêd xwe sipî vegirtin. Cara, nivro şûnda ez diçûme wê polkê, min nan xwarin danî mal.”³⁰⁵ “Idî ketibû meha havînê ortê, em jêra dibên meha temûzê 1917-salê. Ez ji wana idî veqetiyam, orta min wan zaf rind çêbû. Li şêherê Tilbîsê em hindik man, her me xwera nan kirî, em kente maşînê, dîsa çûn.”³⁰⁶ “Min gura firqê kir, biharê, 1924-salê, ez hatme Rewanê, wekî nava kurmanca bixebitim.”³⁰⁷

Di *Şivanê Kurmanca* da vebêjer her tiştî rasterast neqil dike, yanê bi teknîka qalkirinê bi awayekî tebiî vedibêje. Di vê rêbazê da vebêjer serdest e û herî zêde di romanên klasîk da hatiye emilandin.³⁰⁸ Di romanê da di navbera vebêjer û berhemê da

³⁰² Şemo, h.b., r. 135-138.

³⁰³ Tekin, h.b., r. 271.

³⁰⁴ Şemo, h.b., r. 55.

³⁰⁵ Şemo, h.b., r. 120.

³⁰⁶ Şemo, h.b., r. 160.

³⁰⁷ Şemo, h.b., r. 188.

³⁰⁸ Çetin, h.b., r. 116.

têkiliyeke xurt heye. Nivîskar bi kurtasî dixwaze dinyaya xwe û agahiyên dizane bi xwendevanan ra parve bike. Loma jî di *Şivanê Kurmanca* da vebêjer bi vegotîneke rasterast her tiştî neqil dike:

“Xulamtîya min zivistanê pak bû. Bihar hat, min îzna xwe ji axê xwe xwast, wekî ez herme mal. Dewar û pez idî care-cara diçûne çêre. Dilê min tamûlneda, min jî dixwast, wekî ez jî dîsa herme rênçberîya xwe, wekî heqekî xwera bistînim. Axê min îzna min da, ser da deh şeyî pêşkêş dane min, seva xebata mine rind.”³⁰⁹

Di *Şivanê Kurmanca* da vegotîna rasterast carcaran bi diyalog, serborî û bîranînan qut bibe jî vegotîna rasterast ya di metnê da dewam dike. Lê meriv dikare bibêje bi saya diyalogên di romanê da tengasiya ji ber teknîka otobiyografîk û teknîka qalkirinê derdikeve holê sivik dibe:

“Wextê warê bega, axalera û kûlaka hate çê kirinê tundirist bû, tamam kirin, paşê kesîbêd belengaz namala xwe bi piştî xwe çar-pênc roja dikişand, danî zozana. Herkê hineka jî ga ji dewletîya distand, ew jî bi wî qewlî, wekî dewsa wî barbirî gerekê çend roja bê heq ji wanra bixebitîyana, ew kesîb xweyê çend peza bûn, çend bizina bûn. Ew jî dihatne zozana; çimku teve Koçer bûn, yêrê wan jî germbû, tu ekin lê nedibû. Her maleke dewletî, sê-çar malê kesîb xwera bê heq dida xebatê; pez diçêrandin, jina hirî dirêst, dişuşt, şedikir, kincê wan dişuştin, dew dikilan, pesarî û qirş bona ardû top dikirin. Çend mêra sibê hetta êvarê xwe hûr dikir bona pêz, ancax pêra digîhand; hinek diçûne karvîn, hinek miqatî hespêd kihêl dibûn. Her yekî xebatek dikir. Hetta zarê hûr jî bê xebat nediman. Ew xebat tev bona nan û tasek dew bû.

A bi vî tîherî beg axalera, şêxa û mella xûna wan belengaza dimêt, dixwar.

Dîya min û herdu xûşkê min jî bê perê mala axê em têda şivan bûn, dixebitîn.

Gava ku min cara ji bavê xwera digot:

-Bavo! Çima evana tev bê pere dixebitin, seva çi naçin, heqê xwe jê nastînin, bira herin şikîyat kin.

Bavê min caba min dida, digot:

-Lao! Kî kare ber beg, axa yan şêxa, mella şikîyat ke? Dîwane dest wandane, erd-erdê wane, war jî yê kal bavê wane... Emê çwa herin şikîyat, li kê şikîyat kin. Wekî hinek herin şikîyat kin, saleke dinê qe nahêle bê, derkeve zozana. Çima tu nabînî-çiqas xulam û xizmetkar bi çek û sîlhava têne ber derê Ûsib-begê, ew tev piştî wîne, merîyê wîne...

Kê dikarbû ber bega, axalera û dewletîya xeberda. Kê diwêribû bigota viq. Her begekî, xulam, xizmekarê wan hebûn; ew xulam, xizmekar bi çek û sîlhe bûn. Wekî yekî pir hindikî xeberda, xulama wê ew bavîtana erdê, bi qamçîya û dara hûr-xaşî bikirana...”³¹⁰

³⁰⁹ Şemo, **h.b.**, r. 78.

³¹⁰ Şemo, **h.b.**, r. 102-103.

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da hin bûyeran bi kurtasî behs dike û hin bûyeran jî bi berfirehî qal dike. Helbet roman bi teknîk û mantiqa xwe li ser bijartin û tîrbûnê ye û nivîskar nikare qala her tiştî bike.³¹¹ Loma jî Erebe Şemo li gor girîngî yan jî terciha xwe tiştên ji bona metna xwe hildide ji hev dibjêre. Dema qala zawaca dê û bavê xwe û rewşa malbatê dike ev rewş derdikeve holê:

“Bavê min eynî wî gundê hurumayî Azatêda, xût mala wî hurumîda, bû rênçber. Navê wî Todor bû. Li wî gundîda yeke kurmanc hebû. Bavê min zewîcî, ewa kurmanc sitand.

Dîya min diçû, malada dixebitî: hirî dişûşt, şe dikir, dirist, tevn çê dikir û şixulne mayîn dikir. Çend zar ketne destê dîya min. Xûşkê min Çîçek, Gogê û ez, Erebe.

Em gelle gundada dibûne rênçber, herekê me gundekîda zar bûye. Bavê min havînê diçû ber dewêr, lê zivistanê dibû xulamê mala, şixulê wan dikir. Çimku zare hûr bûn û gellek bûn, heqê havînê têra me nedikir, -me serê xwe pê xwey kira.”³¹²

Wekî li jorê jî hat gotin hin mijar bi berfirehî di *Şivanê Kurmanca* da cî digirin. Di hin beşan da derbarê gundê lê dimînin yan jî teze diçin da agahiyên berfireh tên dayîn û beşa “Merkeba me. Rênçberîya nava melegana” yek ji wan beşan e. Erebe Şemo li vir bi berfirehî qala gundê Komesorê dike. Kê ava kiriye, lê çî tê çandin û baweriya wan çî ye:

“Ew gundê ku em çûnê, navê wî gundî hê berê, wexta Romêda, jêra digotin Komesor, lê teze hatîyêd ûrisa, melegana navê wî gundî danîbûne Alêksandrovsk, bi navê bavê padşê hatibû avakirinê ew gundê teze. Ew gund ji şêherê Qersê hevt kîlometra dûr bû. Lê çî cîkî zaf kaw hatibû avakirinê, ser çemê Qerseçayê, wî welatîda idî çem ji wî çemî mezintir tunne bûn. Dora çem, hetta çav-çava dibirî, mêrg-çîmanê wan bûn, notla xalîçeke xemilandî, qîz xwera bixemilînin-ussa tev tijî kulîlk dibûn; ji mêrga wêdatir zevî bûn, çargoşe, notla kvadrata şîn dikirin; cîna jî cewêd avê, nav sînorê wanra derbaz dibû. Rojêd havîna, wextê tavê dida wan cewa, şînayî û ava, cewa tev dibiriqîn, te tirê- zozanêd Eledaxêne xemilîne (...)

Melegana pak derbaz dikir. Erdê wanî pirî rind bû. Çiqas gundê melegana li welatê Qersêda hebûn, teve li erdê rind hatibûn avakirinê û serê nefera wan diket ji 5-hetta 8-dêsêd erd. Alîyê kûltûrayêda Alêksandrovsk ji gundê êrmenîya, tirka û huruma gellekî ferqîtir bû. Melegan ekincîne pire rind bûn (...)

Gundîyê Alêksandrovskê pare vedibûn ser du qebîla yan du taîfa: nivî meleganê “postayanî” bûn, nivî jî meleganê “prigûn” bûn. Eva her qebîleke wan ji hev dihatne kivşê her alîyê dînva; dêra wan û keşîşê wan ji hev başqe bûn.”³¹³

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da tenê bi kurtasî behsa hin bûyeran nake, heman rêbazê dema qala kesan dike jî diceribîne û vebêjer carna di navberê da agahiyan dide û referansên wî pirî caran îşaret dikin ka peyra çî qewiye û rasterast vedibêje. Erebe

³¹¹ Tekin, **h.b.**, r. 249.

³¹² Şemo, **h.b.**, r. 55-56.

³¹³ Şemo, **h.b.**, r. 62-63.

dema qala rênçber û gavanên Meleganan dike hê di dema zarokatiya xwe da behsa Pîr Cewoyê hevalê bavê xwe dike. Cewo êdî kal bûye û li gundê Camûşvana Axbaranê dimîne. Cewo û Ereba qala rojên berê dikin û Cewo serfiraz dibe ji nav Kurmancan kesekî wekî Ereba derketiye û dibêje êdî her tişt baştir e li gor bere. Di vir da helbet elqeyeke mezin ya ji bo vegotina rasterast û dayîna peyamên siyasî yên ji bo pergala nû derdikevin pêşberî me:

“Yek ji wan gavana, pak tê bîra min, -Cewoyê pîr-Kalê jêra digotin, hineka jî digot Pîr-Cewo. Her ji gavantîyê, xwe-xwe dixebitî belengazî didît, serê xwe xwey dikir. Ew jî, notla bavê min, dibû nedibû, derê xelqêda û rênçberîyê serê xwe xwey dikir.

Hevalê bavê min bû: orta wî û bavê min zaf xweş bûn. Şevêd zivistanê dirêj dihate mala me, ber tendûrê rûdinişt, ji emrê xwe, dîtina xwe mera gilî dikir. Carna jî mera çîrok digotin. Me teva jê hiz dikir. Merikî rastgo, dilsax û hurmet. Em qe jê nedixeydîn., wekî cara guhê me, zara digirt, dikişand, wekî em, zar hevekî ker bin, bihêlin mezin dengê hev bibhên. Ew xwe hê saxe li gundê Camûşvana mezindane nehîya Axbaranêdane. Wextê ez dîtîm, ecêmayî ma û biken kire bîra min, got:

-Tê bîra te, çewa li çolê ber dêwêr û malda min guhê te dikişand, tu hînî merîfetê dikirî.

Ji we şunda çend glîyê din jî serda zêde kir, got:

-Gelle emekê min li te heye, hûne zar bûn, pênc-şeş heb bûn, stûyê bavê xwe dabûn, heqê bavê we jî têra xwarina we nedikir, min na danî çolê, dida te, wekî tu birçî nemînî. ...lê niha tu mezin bûy, bûyî mezinê me, kurmanca. Ez zaf şame, wekî me gavana jî merî der dikevin...

Min jê pirsî, -qe halê wî çîye, çewa derbaz dike. Caba min da, got: Ereba, wextêke zaf rind hatîye dunîyayê. Eva wexta eynî wexta me kesîbane, wexta gavanane, lê tale bextra, ez idî kalim, tu xebat min nabe. Xelq xêra dê bavê xwe parî nan dide min. Ez îdarê xwe pê dikim.

Hevekî ker bû wa, duşurmuş bû, benzê wî wa xirab bû, hêsir ji çava hatin, grîya. Ez ber dilada hatim, min nehişt bigrî. Lê dîsa şa bû, got:

-Xwezla ewa dîwana wexta eme kesîbbûnêda bû û çetinîyêda bûn, wî çaxî bihata, minê çîqa kûlak hebûna bi destê xwe qir bikirana.”³¹⁴

Di *Şivanê Kurmanca* da mînakên bi vî rengî zehf in. Vebêjer dema qala Gogêya xwîşka xwe dike ev rewş derdikeve pêşberî me. Lewra hê di dema vegotina zarokatiya xwe da derbarê karê xwîşka xwe ya di pêş da agahî dide: “Bihar hat, ez bûme golikvanê gund. Xûşka mine Gogê-ya ku niha saxe, li Tilbîsê ser fabrîqa tutunê dixebite,- alî min dikir: Raste, Gogê nedihat ber golika, lê alî min dikir: dihat, golik ji gund dûr dixist, vedigerîya dihate malê.”³¹⁵ Dema qala Eslan tê kirin jî vebêjer dikeve navberê û agahî dide: “Em paîzê çûne gundekî dinê. Wî gundîra digotin Vladîqers. Li wî gundîda dima

³¹⁴ Şemo, **h.b.**, r. 65-66.

³¹⁵ Şemo, **h.b.**, r. 78.

mala Eslên. Eslan xwe merîkî zafî pak bû. Hebûn sê kurê wî: Emo, Elî û Kekan. Mala wan niha li gundê eşîra-badedane, nehîya Heyşterekê, li Ermenistanê.”³¹⁶ Vebêjer dema qala *Ûsê Têco* dike wiha dibêje: “Wexta em teze hatne Sûsîz, mala me kete koxê *Ûsê Têco*. Merîkî zafî rind û milahîm bû. Niha du kurê wî hene herdu jî zilamne zafe rindin û camêrin. Meriv heyran, hijmekare, wan xorta binêre. Yek Teyoye, yê dinê Miraze: şîrnaya dîya wî jêra digot Mazo. Mala wan li Tilbîsêye.”³¹⁷ Erebb wexta ji bo xebatê tê Sarîqamîşê û bolşevîkan nas dike derbarê Şûrka Kornêv da dikeve navberê û agahî dide: “Li wêderê min nasîya xwe da palêd *Ûrisête Klîmov, Mîxaîlov, Popov* û *Şûtka Kornêv*, yê ku niha dixebite G.P.U-ya Moskovê.”³¹⁸ Erebb dema teze *Kêxam Hakopyanê* Ermenî nas dike, agahî dide paşiyê wî li *Rewanê dîtîye*: “Lazekê şûnda hevalê me jî hatin û me nasîya xwe da hevdu. Ew xort êrmenî bû, navê wî *Kêxam Hakopyan* bû. Min ew xort vê axrîya paşin li *Rewanê dît*, katibê komîta qeza *Rewanê* bû. *Kêxam Hakopyan* qulux dikir nava eskerê Sarîqamîşê, ji firqa bolşevîka ewî xebat dikir nava esker.”³¹⁹ Wexta qala *Xîjnyak* tê kirin jî heman rewş heye: “Berê qumandar ez bûm, paşê hevaleyê hat, gilîyê şêrda ji min rindtir zanibû, me meznatîya partîzanîyê da wî. Ew merî niha saxe, li *Lênîngradêda* meznê eskerê G.U.P.-ye, navê wî hev. *Xîjnyak*.”³²⁰

2.4. JI HÊLA MIJARÊ VA ANALÎZEKE LI SER ŞIVANÊ KURMANCA

Ji mijarê mebest ew e roman bi gelemperî qala çî dike. Helbet her roman qala tiştêkê dikin û mijara romanekê bi pirsgerêkên çandî, civakî û şexsî yê dema xwe ra eleqedar in. Romana *Şivanê Kurmanca* ya bi gelemperî ji honandina serborî û bîranînan pêk tê bi derketina Şemo ya ji qezaya Surmeliyê dest pê dike û bi kurtasî qala jiyana Kurmancan ya dijwar ya di dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an da dike. Nivîskar Erebbê Şemo zarokatiya xwe, rewşa malbata xwe û êl û eşîrên Kurmancan û damezirandina pergala Sovyetê û encamên wê yê di nav Kurmancan da bi hûrgilî ji nêz va terîf û teswîr dike. *Şivanê Kurmanca* di heman demê da şahidê dema xwe ye. Tevî nirx û taybetiyên folklorîk heyama xwe bi her awayî radixe ber çavan. Demên zarokatiyê û rewşa malbatê, jiyana Kurmancan û edetên wan, têkiliya Kurmancan û neteweyên din, xizanî û zilma serdestan û şoreşgerî û xebatên siyasî mijarên sereke ne

³¹⁶ Şemo, **h.b.**, r. 94.

³¹⁷ Şemo, **h.b.**, r. 142.

³¹⁸ Şemo, **h.b.**, r. 144.

³¹⁹ Şemo, **h.b.**, r. 146.

³²⁰ Şemo, **h.b.**, r. 185.

di *Şivanê Kurmanca* da derdikevin pêş. Helbet di bingeha van mijaran da jî wek serlehengê romanê pêvajoya kemilîna Ereba cî digire.

2.4.1. Demên Zarokatiyê, Rewşa Malbatê û Kemilîna Ereba

Wekî tê zanîn Ereba Şemo xwe weke realîst û sosyalîst pênase dike û rêbaza wî ya edebî jî “realîzma sosyalîst” e. Ereba Şemo derheqê vê rêbazê da wiha dibêje, “Di nêrîna min da ev rêbaz dikare hemû aliyên jiyane ronî bike.”³²¹ Li gorî realîzma sosyalîst huner nîşandan e. Lê nîşandana di realîzma sosyalîst da bi çî awayî ji ya teoriyên din cuda dibe? Kesên hunerê wek nîşandan pênase dikin ji rastiya tê nîşandan tiştên cuda fehm dikin. Li gorî hinekan ev rastiya tê dîtin e, li gorî hinekan bingeha tebîeta însan e, li gorî hinekan rastiya îdealîzekirî ye û li gorî hinekan jî jiyana rojane ya civakê ye. Realîzma sosyalîst herî zêde nêzikî ya dawîn, yanê nêzikî rastiye ye. Lê di çend xalan da cihê dibe. Li gorî realîzma sosyalîst rastiya huner nîşan dide rastiya civakê ye, lê ev rastî di nav pêşvaçûna şoreşgerî da tê dîtin û divê li gorî şenberiya dîrokê ya rast û perwerdekirina çîna karkeran bê nîşandan.³²²

Ereba Şemo di *Şivanê Kurmanca* da ji bona “jiyana rojane ya civakê” nîşan bide û wekî dibêje “hemû aliyên jiyane ronî bike” cî dide demên zarokatiyê û rewşa malbata xwe. Helbet rastiya nîşan dide bi şenberiya dîrokê ya rast ra li hev dike û ji bona pêşvaçûna şoreşgerî -jiyana wî bixwe jî ber bi wir va diherike- jî pêşgahî ne û dixwaze nîşan bide. Wek mînak di *Şivanê Kurmanca* da wiha qala demên zarokatiyê û rewşa malbatê tê kirin:

“Dîya min diçû, malada dixebitî: hirî dişûşt, şe dikir, dirist, tevn çê dikirin û şixulne mayîn dikir. Çend zar ketne destê dîya min. Xûşkê min Çîçek, Gogê û ez, Ereba.

Em gelle gundada dibûne rênber, herekê me gundekîda zar bûye. Bavê min havînê diçû ber dêwêr, lê zivistanê dibû xulamê mala, şixulê wan dikir. Çimku zare hûr bûn û gellek bûn, heqê havînê têra me nedikir, -me serê xwe pê xwey kira.

Ew mereka em têda diman, me tendûr kiribîyêda, hema tendûra me zivistanê gelle cara nedihate dadanê. Eme bê dewar bûn, sergînê me tunne bûn, lê sergînê berevkiirî û pesarîyê çolê têra dadana tendûra me nedikir.

Hergav dîya diçû malara rojheq dixebitî, lê hema lavayî wan dikir, wekî îzna me zara bidin -em gomê wanda yan tewlê wanda rûnîn, xwe germ bikin, heta dîya min şixulê xwe kutta dikir. Zivistanê li gomê pêzda û tewlada germ bû. Lê hema kûlaka nedihîşt, wekî hêsîrê hur badilhewa xwe tewlada germ kin. Heta dîya me dixebitî, wan kûlaka dikire ser me, wekî em miqatî afirê dewarê wan bin, nehêlin

³²¹ Nazê, **h.g.**, r. 32.

³²² Moran, **h.b.**, r. 46.

gîya yan kirçom têkeve nav dest-pê wan. Em sibê hetta êvarê ber afirê hespa, gamêşa û dewarê mayîn, notla pepûka, tî, birçî diman, hetta dîya me şixulê xwe kutta dîkir.”³²³

Di *Şivanê Kurmanca* da demên zarokatiyê û rewşa malbatê ji bona kemilîna Erebe Şemo bingeh in. Lewra realîst-sosyalîst dema li civakê dinihêrin û dixwazin rastiyê binivîsînin rewşa heyî û tîpan xêz dîkin.³²⁴ Di romanê da dema rewş tê xêzkerin wek tîpek Erebe jî jîr û jêhatî ye û tim hewl dide pêş bikeve. Erebe di temenê xwe yê biçûk da dest bi xebatê dike. Dibe dûajo, golikvan, xulam, dergevan, wergêr û heta paletiya çêkirina rêya trêne jî dike. Erebe roja dibe dûajo wiha dibêje:

“Ew roj rojêke mine zaf ezîz bû, şabûna lingê min erdê nediket. Dîya min dewsa hevana nê, torbekî biçûk mira dirûbû. Benekî sor jî avitîbû torbe. Gava ku min torbe davîte piyê xwe, benekê sor jî li herdu aliyava ser mînda dihatin. Ez xaf kaw dibûm û min tirê, -ez idî şivanekî tamim.”³²⁵

Di jiyana Erebe da dergevaniya li dibistanê ji bona kemilîna kesayetiya wî girîng e. Erebe di dibistaneke Rûsan ya li gund da wek dergevan dest bi kar dike. Mamosteya dibistanê zîrekiya Erebe ferq dike û wî hildide pola xwe û fêrî xwendin û nivîsandinê dike. Navbera Erebe û keça mamosteyê ya bi navê Marûsîyayê zehf baş e û Marûsîya jî di xwendinê da alîkariya Erebe dike. Erebe wiha qala zîrekiya xwe ya li ser xwendinê dike:

“Rojekê Marûsîyê ji min pirsî:

-Tu vê kitêba tezeda qe çî hîn bûy, -u seyfeke pêşin vekir, da min, wekî ez bixunim.

Min zûzûka xwand. Marûsîya revî, çû cem dîya xwe gotêda:

-Were binêre Erebe Şamîlov van du rojada çî zû dixûne.

Dê hate cem min, careke dinê ew cîyê ku min xwendibûn, da min, min xwand. Destê xwe li piştî min xist got:

-Eferim, tuyê zû hînî xwandinê bî.

Ji wan paya ez soro-moro bûm, ji eşqana hêsir ji çavê min hatin, hindik mabû ez bigrîyama. Eşqa xwandinê ussa dilê mînda hebû, wekî gav sihet fikra min ew bû.”³²⁶

Jiyan ji bona Erebe tim xebat û pêşketin e. Çavkaniya hemû taybetiyên wî ji jîrbûn û zîrekiyê tê û xebata wî dibe sedem kemilîna kesayetiya xwe pêk bîne. Gelek kesên

³²³ Şemo, **h.b.**, r. 56-57.

³²⁴ Moran, **h.b.**, r. 47.

³²⁵ Şemo, **h.b.**, r. 57.

³²⁶ Şemo, **h.b.**, r. 89-90.

xwenda nînin ji ber xizaniyê mecbûr mane bixebitin, lê ev ji bona Erebbê nebûye astengî û heta rê li ber vekiriye xwe pêşva bibe û bikemile. Ev rewş wiha tê behskirin:

“Havîna, wextê xwandina mekteba dihate dadanê, ez dibûme gavan yan şivan, lê idî torbê minda xên ji nê hebûn kitêb. Li çolê min dersê xwe zivistanê serî hetta binî dixwand. Zivistana ez dîsa dibûme xulamê mektebê û dîsa dixwand.”³²⁷

Bi saya xebatê Erebbê di nav gelên curbecur da digere û hînî jiyane dibe. Gelek kesan nas dike û zimanê wan fêr dibe. Erebbê her dem tecrubeyên xwe di jiyana xwe da tetbîq dike. Wek mînak wexta di alaya Qazaxan da dibe wergêr wiha tê qalkirin:

“Rojêd bazara jî ez diçûme cem qazaxa, min hespê wan av dida, alî wan, xebata wan dikir, hesp tîmar dikirin. Gelle qazaxa û apîtsêrê wan ez hizdikirim. Qazax û zabitê wan pê hesîyan, wekî ez pak zanim zimanê tîrka, kurmanca, huruma û ûrisa. Wana gote min: were bibe dîlbendê me. Min qebûl kir.”³²⁸

Di jiyana Erebbê da ji xeynî dergevaniya li dibistanê paletiya çêkirina rêya trêne jî ji bona kemilîna kesayetiya wî zehf girîng e. Lewra ev di jiyana wî da heyameke nû dide destpêkirin û wiha cî digire:

“Min îzna xwe ji dê û bavê xwe stand, ez çûme şêherê Sarîqamîşê, ketme ser xebatê çewa li ‘drûjîna înjînera şeşa’. Mezinê wêderê jî pê hesîyan, wekî ez zimana rind zanim. Sê hevîya şûnda ez kîvş kirim millet: êrmenî, kurmanc, asêtîn, turk. Hebûn uris jî, ji Moskovê û şêherne mayîn. Hinek hatibûn, xwera dixebitîn, pere qazenc dikirin, hinek jî dîwanê zor anîbûne olamê. Li wêderê min nasîya xwe da palêd Êrisêtê Klîmov, Mîxaîlov, Popov û Şûrka Kornêv, yê ku niha dixebite G.P.U-ya Moskovê.

Ew heval tev, xên ji Şûrka Kornêv, uzvê sosîal demokrata firqa bolşevîka bûn. Kîvş bû, wana pak ji min hizkir: wana cara ez dibirme nava xwe. Hetta wî çaxî xebata ‘padpolîye’ min nizanbû çîye, min nizanbû firqa jî çîye. Ew cara teze bû, wekî ez gihîştme xetbatçiyê înglabkar.”³²⁹

Em ji jiyana Erebbê fêr dibin û pê dihesin xebata wî jê ra bûye dibistan û kesayetiya wî kemiliye. Bi xêra dergevaniya di dibistanê da xwendin û nivîsandinê hîn bûye. Di nav gelên curbecur da xebitiye û fêrî zimanê wan gelan bûye. Ji ber xebata çêkirina rêya trêne fikrên Bolşevîkan nas kiriye û ketiya nav refên wan. Ew wekî nostaljiyekê li demên beriya şer nanihêre. Lewra her çiqas hestên xwe eşkere nekiribe jî bûyerên dîtine

³²⁷ Şemo, **h.b.**, r. 90.

³²⁸ Şemo, **h.b.**, r. 120.

³²⁹ Şemo, **h.b.**, r. 144.

bandorê li ser wî kirine û çîroka wî ya zarokekî hejar li pergala nû tê û peyamên sosyalîst dihewîne.³³⁰

2.4.2. Şoreşgerî û Xebatên Siyasî

Di *Şivanê Kurmanca* da salên hatina pergala nû, xebatên propagandayê û tevlibûna Ereba ya şer yek ji mijarên sereke yê romanê ye û bi berfirehî cî digire. Xebatkarên siyasî di wan salan da bi gelemperî di çêkirina rêya trêne da wek pale dixebitin. Ereba jî diçe Sarîqamişê ji bona di çêkirina rêya trêne da bixebite. Li wir xebatkarên ji Moskovê jî hatine hene. Ev xebatkar Bolşevîk in û di nav karkeran da fikrên xwe belav dikin. Dema pê dihesin Ereba bi gelek zimanan dizane û zîrek e wî hildidin nav xwe. Ereba pirtûk û belavokan ji wan distîne û dixwîne. Ev di romanê da wiha tê behskirin:

“Li wêderê min nasîya xwe da palêd Ûrisêtê Klîmov, Mîxaîlov, Popov û Şûrka Kornêv, yê ku niha dixebite G.P.U-ya Moskovê.

Ew heval tev, xên ji Şûrka Kornêv, uzvê sosîal demokrata firqa bolşevîka bûn. Kivş bû, wana pak ji min hizkir: wana cara ez dibirme nava xwe. Hetta wî çaxî xebata 'padpolîye' min nizanbû çîye, min nizanbû firqa jî çîye. Ew cara teze bû, wekî ez gihîştme xetbatçiyê înglabkar. Gava ku wana gazî min dikirin, ez dibirme nava xwe, sed carî temî didane min, wekî ez kesekîra nebêjim, yêkî jî wana digote min, -ez herim palara kurmanca, tirkara û yê mayîna bêjim, wekî pak xebitin, dawa rojheqê zêdekirinê bikin. Min jî giliyê wan diqedand, diçû, tevra dizîkava digot. Lê kurmanca û milletêd mayîna ew gilî zaf qebûl dikirin û daw dîwanê dikirin. Dîwanê berê ew gilî qebûl nekir. Qazax bi çek-sîlhava berî nava pala da, paledane kutanê, du sê heb jê girtin. Lê pale her yekê alîkî revî, çimku erdê Sarîqamişê çîya û mêşe bû.

Dîwanê lê nihêrî kesek ser xebatê nema, paşê xwe xwa nava mêşe ket, pale bi lava û dîleka top kir, rojheqê wan jê zêde kir. Ji wê rojê şûnda, pale idî devgerm bûn.

Palêd înglabkare ji Moskovayê hatibûn, kaxeza înglabkara didane min, kitêbê wan didane min, min dixwand.”³³¹

Ereba dibe alîgirê Bolşevîkan û wekî kesekî çalak ji bona wan dixebite. Ji ber xebatên siyasî tê girtin û di zindanê da dimîne. Ereba tenê propagandaya fikrên Bolşevîkan nake, ew dibe partîzanê Bolşevîkan jî û di romanê da wiha qala vê tê kirin, “Bi vî tiherî çavê min bere-bere jev vebûn, xebata firqê li min xweş hat û ez ketme firqa

³³⁰ Allison, **h.g.**, 149.

³³¹ Şemo, **h.b.**, r. 144-145.

bolşêvîka, jêra digotin. R. S. D. R. P.”³³² Ereb vê ji bona xwe wek hişyariyeke mezin dibîne û wiha terîf dike:

“Roj bi roj ez ketme xebata firqê, idî fikra min ser wan gilîya bûn. Zivistana 1916-a idî serbest ez dixebitîm.

Gelle cara me pale radikirin, ber dewletê xeber didan, xebat davîtin, aylixa xwe zêde dikirin.

Tu carî eşqeke ussa dilê minda tunne bû. Ne zarofiyêda, ne cahiltiyê, wextê destê min dar diqefiland, ez bûme rênçber. Çimku halê gavanê kurmanca ussa pîse fikira wî her ser wêderêye, çika kengê zikekî têr nan bixwe. Lê bihara 1917-da, idî ew pariyê nan nebû fikra mine eseyî, min fikir dikir çewa xebatê rind bibim. Ez ketme firqê, bûme uzvê wêyî eseyî. Ez idî, çewa merîkî ji tarîyê derkeve bê ber ronkayê.”³³³

Ereb dema Şerê Navxweyî dest pê dike tevî Artêşa Sor dibe û ev rewş di romanê da wiha derbas dibe, “Min kaxez hilda, ez lez çûme cem hevalê Şpak. Ewî ez hildam gvardîya sor.”³³⁴ Piştî tevî refên leşkerî yên Bolşevîkan dibe û li hemberî Artêşa Çar şer dike birîndar dibe û bûyer ji devê wî wiha tê vegotin:

“Kornîlov berê xwe dabû Kûbanê, dihat xwe digihîfande qazaxê Kûbanê. Hinda şehere Krasnodarê, -ew şehere merkeza Kûbanê bû, -Kornîlov kuştin. Me eskerê wî ji hev bela kir. Wî şerîda ez hatme birîndarkirinê. Gulle li ranê min ketibû, birîne cîkî bê fesal bû, ez nikarbûm pê rê biçûma.”³³⁵

Ereb piştî têkoşîna xwe ya li eniyên şer dema hê birîndar e û li nexweşxaneyê tê dermankirin jê ra mizgîniya endamtiya partiyê tê û wiha qal dike, “Ezî bolnîtsêda bûm, cab dane min, wekî yekê gulanê 1918-firqa bolşêvîka tu hilday uzvê xwe. Ezî hila hê nexweşxanêda bûm.”³³⁶ Peyra di nav Kurmancan da tê wezîfedarkirin û xebatên di nav Kurmancan da dest pê dikin. Ev mijar wiha derbas dibe, “Min gura firqê kir, biharê, 1924-salê, ez hatme Rewanê, wekî nava kurmanca bixebitim.”³³⁷ “Ez ku hatme Êrmenîstanê, merkezkoma firqê bolşêvîka ez kivş kirim talîmatçiyê nav kurmanca ji teref firqê.”³³⁸ û di encamê da wiha balê dikşîne ser pergala teze, “Rastî, her înglaba Oktyabrê û dîwana şêwrê zulmê patşê Nîkaleyî xûnxur, zulma bega, şêxa, axalera û mella, zulma daşnaka ser gundîyêd xebatçî dane hildanê.”³³⁹

³³² Şemo, **h.b.**, r. 146.

³³³ Şemo, **h.b.**, r. 147-148.

³³⁴ Şemo, **h.b.**, r. 166.

³³⁵ Şemo, **h.b.**, r. 194.

³³⁶ Şemo, **h.b.**, r. 174.

³³⁷ Şemo, **h.b.**, r. 188.

³³⁸ Şemo, **h.b.**, r. 192.

³³⁹ Şemo, **h.b.**, r. 198.

Şivanê Kurmanca di heman demê da panoromaya civakî û siyasî ya heyama xwe nîşan dide. Lewra li gorî realîzma sosyalîst wezîfeya nivîskar ew e hêzên dîrokî yên di civakekê da mohra xwe li pêşvaçûna heyamekê dixin û bingeh û dînamîkên civakê fehm bikin. Bi gotineke din rewşa dîrokî ya ji bona wê heyamê tîpîk e fehm bikin. Nivîskar bi saya kes, bûyer û rewşan van hêzên dîrokî şênber dike. Wê hingê divê kes, bûyer û rewşên di berhemê da ji bona rastiya civakî nîşan bidin tîpîk bin. Tîpîk yan jî lehengê temsîlkar him hêzên dîrokî di şexsê xwe da şênber dike û him jî bi taybetiyên xwe yên xwerû dibe kaseyetekî zindî.³⁴⁰ Wek serlehengê romanê Erebb jî vê rolê di şexsê xwe da pêk tîne û şênber dike. Erebb di heman demê da nimûneyên “lehengê erênî” yê realîzma sosyalîst di xwe da dihewîne. Lewra divê ev tîp wekî temsîlkarê bêqisûr yê xîreta polîtîk li ser xwendevanan bandorê çêke, bibe mînakê wisa her kes xweziya xwe pê bîne û di navbera niha û pêşerojê da têkiliyê deyne û nîşan bide sosyalîzm pêkan e. Di romanê da ev tîp kesekî nefspîçûk û bihêz e û girêdayî wezîfeya xwe ye. Gel tedayiyê dibîne, nikare çareseriyekê peyda bike, pêwistî bi perwerdeyê heye û li benda rêberê ye. Lehengê erênî hemû zor û zehmetiyên derbas dike û rola dîrokî ya dikeve ser milan pêk tîne.³⁴¹ Heger em gotinên Pîr-Cewo yên di destpêka romanê da ji bona Erebb dibêje bîr bînin wê çêtir bê fehmkirin:

“Ji we şûnda çend glîyê din jî serda zêde kir, got:

-Gelle emekê min li te heye, hûne zar bûn, pênc-şeş heb bûn, stûyê bavê xwe dabûn, heqê bavê we jî têra xwarina we nedikir, min na danî çolê, dida te, wekî tu birçî nemînî...lê niha tu mezin bûy, bûyî mezinê me, kurmanca. Ez zaf şame, wekî me gavana jî merî der dikevin...”³⁴²

Erebb wekî temsîlkarê pergala teze di nav Kurmanca da derdikeve pêş û pêşengiyê dike.

2.4.3. Xizanî û Zilma Serdestan

Şivanê Kurmanca ji bona nîşandana civaka wê demê eyneyek e û yek ji mijarên sereke di *Şivanê Kurmanca* da derdikeve pêş bêdaletiya civakî ye. Erebb Şemo di seranserê romanê da qala kesên xizan dike. Ji xeynê xizaniya gel rewşa dewlemend û serdestan jî nîşan dide. Lewra kesên xizan zor û zehmetiyê dikşînin û yên serdest jî keda wan dixwin. Ev rewş di dereke romanê da wiha tê behskirin:

³⁴⁰ Moran, **h.b.**, r. 48.

³⁴¹ Moran, **h.b.**, r. 54-55.

³⁴² Şemo, **h.b.**, r. 65.

“Her maleke dewletî, sê-çar malê kesîb xwera bê heq dida xebatê; pez diçêrandin, jina hirî dirêst, dişûşt, şedikir, kincê wan dişuştin, dew dikilan, pesarî û qirş bona ardû top dikirin. Çend mêra sibê hetta êvarê xwe hûr dikir bona pêz, ancax pêra digîhand; hinek diçûne karvîn, hinek miqatî hespêd kihêl dibûn. Her yekî xebatek dikir. Hetta zarê hûr jî bê xebat nediman. Ew xebat tev bona kerî nan û tasek dew bû. A bi vî tiherî beg û axalera, şêxa û mella xûna wan belengaza dimêt, dixwar.”³⁴³

Di romanê da bi berfirehî qala zilma wê demê li şivan, gavan û gundiyan dibe tê kirin. Erebi rêya vegotina serpêhatiyên xwe dixwaze helwesta xwe ya li dijî îstismar, kedxwarin û çewisandina belengazan eşkere bike. Jixwe Erebi xwe wekî berdevkê karker, gundî û belengazan dibîne. Meyla wî her tim li ser mexdûrên rejima berê ye. Nivîskar bûyeran bi çavekî çînî dinirxîne. Kesên mensûbê çîna proleter yan jî bindestan nebin ji hêla nivîskar va tên rexnekirin. Loma jî nivîskar di romanê da beg û axayên Kurmancan yê mînanî Ûsib Beg, Cangîr Axa, Qulî Beg û Egît Beg wekî merivên zilimkar nîşan dide û wan bi awayekî neyînî teswîr dike.³⁴⁴ Erebi di romanê da Ûsib Beg, Egît Beg û Cangîr Axa wiha nîşan dide, “-Ûsib-beg bû uzvê parlamênta daşnaka, Cangîr-axa jî qumandarê ser eskerê kurmanca nav daşnakada. Egît-beg bû prîstavê kurmanca. Egît-beg xelq ussa talan kir, idî ‘neynuk tunne bû’, wekî xwe pê bixuranda.”³⁴⁵ Di vir da wan bi talankirina mal û milkên Kurmancan û bi xiyane tawanbar dike. Di dereke din ya romanê da ji devê kesên xizan wiha dibêje:

“Wextê me ussa lava ji Egît-begê kir, me kulfetê lape sere ji nava êlê anî, wekî xwe bavê ser dest pîya yan laçika xwe ber veke, bavê ser pîya, çewa qeydê me eşîraye. Lê tu lava dilekî ber Egît-begê ber tiştêkî nedihate hesabê...”

Egît-begê qamçiyê xwe hejand û got:

-Kî neyne ezê çermê piştê wî rakim, tijî xwê bikim.”³⁴⁶

Di *Şivanê Kurmanca* da axa, şex, mele û beg, yanê kesên serdest tim bi dijmin ra hevkarîyê dikin û heqaretê li gundî, şivan û gavanan dikin. Erebi zilma bi destê beg û axayan li kesîban tê kirin di gelek beşên romanê da wiha behs dike, “Begêd me, axalarêd me jî çûne piştê daşnaka. Ûsib-beg, Cangîr-axa û Qulî-beg esker ji kurmanca dane daşnaka. Xwedê giravî bi ixtiyara xwe. Lê çî ixtiyar çî hal, tev zora qamçû dibirin.”³⁴⁷ Wek mînak di dereke din da jî wiha dibêje, “Rastî, bega, şêxa, daşnaka û

³⁴³ Şemo, **h.b.**, r. 102-103.

³⁴⁴ Eyyüp Gürtürk, “Bandora Rêbaza Realizma Civakparêz Di Romana Şivanê Kurmanca De”, **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, Hejmar: 3, (2016), r. 194.

³⁴⁵ Şemo, **h.b.**, r. 189.

³⁴⁶ Şemo, **h.b.**, r. 196.

³⁴⁷ Şemo, **h.b.**, r. 189.

mella kurmancê kesîb zaf pejmûrde kiribûn. Malê wan zorê jê distand. Wekî yek nexweş diket, Cangîr-axa yan Egît-begê diçû, malê wan talan dikir, danî. Wextê ez hatim, eva gilî-gotina gava ku min bihîst, ecêbmay dimam.”³⁴⁸ Wekî tê zanîn têkiliya rêbaza realîzma sosyalîst bi felsefeya Marksîzmê ra heye û ev rêbaz di nav xwe da taybetiyên polîtîk û îdeolojîk jî dihewîne. Marksîzm di warê aborî, civakî û polîtîk da civakê rexne dike û ev rêbaz jî di warê edebî da civakê rexne dike.³⁴⁹

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da tenê qala neheqî û zilma axa û begên Kurmancan nake. Bi heman awayî qala zilma Melegan û kûlakên Rûs û Daşnakan jî dike. Wek mînak di romanê da wiha tê behskirin, “Wana sibê hetta êvarê em badilhewa didane xebatê-êksplaotasî dikirin him em gavan, him jî kesîb-kûsîbêd gundê xwe melegan. Em, rênçberê xwe, ussa dikutan, danîne halê kuştinê. Pey wan kutanara gavanêd belengaz yek meh nexweş diketin, himangî pey dewêr saskar dibûn, hinek ji wan dimirin.”³⁵⁰ Helbet neheqî tenê li şivan û gavanên Kurmanc nabe. Melegan û kûlak neheqiyê li xizanên xwe jî dikin û ev rewş wiha tê qalkirin, “Melegana du paye wanî dewletî bû, kesîbê wane hindik bûn. Lê kesîbê wan jî, notla me ji teref kûlaka dihatne eksploatasîkirinê.”³⁵¹ Di *Şivanê Kurmanca* da dema qala zilma Daşnakên axa û beg piştta wan digirin tê kirin wiha tê behskirin, “-Wextê tu ji cem me çûy, dîwana kete destê daşnaka. Daşnaka dest pê kir kurmanc qir kirin. Rojê danekê wan bi xûmpapêtê xweva ser gundekîda digirtin.”³⁵²

Di *Şivanê Kurmanca* da gelek şopên jiyana civakî xwe didin der. Di seranserê romanê da nêrînek heye xizan di nav lepên serdestan da ne û di bin zilma wan da dipelçiqin. Erebe Şemo xwestiye bi rêya vegotina jiyana xwe nîşan bide ka çawa beriya şoreşê neheqî li ser gel hebûye.³⁵³ Loma jî bi gotineke din *Şivanê Kurmanca* nêzî wê nêrîne ye dibêje divê edebiyat “hizirkirina nivîskar”, “partînost (rihê partiyê)”, “narodnost (nêzî gel)” û “pêşvaçûna hunerî” derxe pêş.³⁵⁴ Yanê *Şivanê Kurmanca* armanc dike perwerdekirina civakê pêk bîne û propagandaya polîtîk û îdeolojîk ya sosyalîzmê bike. Jixwe di beşa dawîn ya romanê da Erebe Şemo dora xebirdanê dide

³⁴⁸ Şemo, **h.b.**, r. 191.

³⁴⁹ Moran, **h.b.**, r. 57.

³⁵⁰ Şemo, **h.b.**, r. 64.

³⁵¹ Şemo, **h.b.**, r. 64.

³⁵² Şemo, **h.b.**, r. 188.

³⁵³ Yılmaz, **h.b.**, r. 74.

³⁵⁴ Ahmedzade, **h.b.**, r. 18.

kesên xizan jî û rasterast propagandaya pergala nû dide kirin û roman bi paragafên propagandayê diqede:

“-Bavo! Lê kê destê me eşîrê kire hevdu, berî hev dan, me xûna birêd xwe dirêt. Em jî xebatçî, ewana jî xebatçî. Bega bona kara cêba û kara daşnaka em muxluqet berî hev didan, me hevdu qir dikir. Lê çima niha kesek nabêje. ‘Eva kurmanca, eva êrmenîye, eva ûrise yan eva eceme.’ Niha em tev, mîna bira, dixebitin, dengê xwe hevra nakin. Her dîwana şêwrê eva azaya anî nav me.

Rastî, her înglaba Oktyabrê û dîwana şêwrê zulma patşê Nîkaleyî xûnxur, zulma bega, şêxa, axalera û mella, zûlma daşnaka ser gundîyêd xebatçî dane hildanê.

Gundîyê xebatçî, kesîb û batrak idî zanin -şêx, melle, beg û axaler dijminê wanin. Wekî roja bê lazim be, ewê hazir ber dîwana şêwrêda xûna xwe birêjin.”³⁵⁵

Wekî ji jêgirtina li jor jî tê fehmkirin bi saya pergala teze kesên xizan û feqîr hişyar dibin û li hember serdestan derdikevin.

2.4.4. Jiyana Kurmancan û Edetên Wan

Şivanê Kurmanca ji teswîrên berfireh yê kevneşopiyên Kurmancan yê civakî û çandî pêk hatiye. Belkî jî serkeftina herî mezin ya Erebe Şemo ew e di nîşandana rewşa gundan û Kurmancan da serkeftî ye. Bi her awayî jiyana li gundan radixe ber çavan û helbet ji bona bingeha romanê li ser jiyana wî ye agahiyên xwe yê derheqê gundan da di romanê da nîşan dide. Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* da dixwaze wekî weqianûsek her tiştî qeyd bike. Loma jî bi berfirehî qala Kurmancan dike. Dema ji bona rênçberiyê diçin nav Kurmancan wiha dibêje, “Nava kurmancada heyat qeyde û qanûne lape başqe bûn. Rênçberîya nava kurmancada jî ji rênçberîya melegana farqîtir bû.”³⁵⁶ Di berdewamiyê da di beşa “Nava kurmancada. Biharê li dolgê” da qala ferqa di navbera Kurmanc û Meleganên Rûs da dike:

“Jîyîna gundê kurmanca tiherekî dinê bû. Merîyê melegan, çewa min serîda got, gişke ekinî bûn. Lê kurmanca gişke koçerin, dêwêr xwey dikin, gundê wan du pa li çiyadanin. Raste, herkê hinek kurmanca ekin diçînin, lê dîsa ekinê wan ji dêwêr hindiktire. Rastî jî nava milletêd wandera kese notlanî kurmanca, -mêl, dêwêr xweyke tunne, îlam xweykirina pêz.

Kurmanc nava çiyadanin, li wan çîya heye çêrê rind. Li wan dera diçêrin û kok dibin kerî-sûrîyê wan. Zivistanê çîyayê wan berfeke kûr lêdikive, lê gava ku bihar tê, berf dihele, şînayî şîn dibe, wan dera cûre-cûre pincar kulîlk, ormex û tiştê mayîn lê şîn dibe. Li zozana hewa hênkaye, weqa ne germe, çewa li deşta. Loma jî şînkaya wêderê zû hişk nabe. Hine şînayî unda dibin, dewsa wan hineke dinê şîndibin. Kulîlk ussa ber hev tene guhastinê. Dewar sibê hetta êvarê diçêre, ji

³⁵⁵ Şemo, **h.b.**, r. 198.

³⁵⁶ Şemo, **h.b.**, r. 95.

hênkayê û çêrê xweş kok dibe. Vira ne germe, mîna deşta, mêş mor heywên qe naêşîne, çimku li wan zozana hene rêşele, -bi hezara nava dêwêr û pêz digerin, ser pişta wan datînin û mêr-mora qir dikin. Alîkî jî hênkaye, mêş-mor vira teyax nadin, sur wan qir dike.”³⁵⁷

Di heyama Erebê Şemo da piraniya Kurmancan gundî û koçer in û loma jî di *Şivanê Kurmanca* da wekî gundî û koçer derdikevin pêşberî me. Di romanê da wek mayîn qala eşîrbûna Kurmancan jî tê kirin. Ev mijar miha tê behskirin, “Gelle şixul û gilî-gotinêd kurmanca min nizanbû. Bavê min ez hîn dikirim, ji minra digot: -Lao, ev eşîrin, evana ne meleganin, berêda halê wan dewar xwey kirine. Gerekê tu bizanbî çewa xweyê pezra xeberdî...”³⁵⁸ Bi taybetî di beşên “Nava kurmancada. Biharê li dolgê”, “Li zozana” û “Li dagerê. Rojêd ezîze paîzê-beranberdan”ê da jiyân û edetên Kurmancan bi berfirehî hatine behskirin.

Ereb bi gelemperî di nav gundên Rûs, Ermenî û Yewnanan (Hurum) da mezin bûye û dema cara ewil qala cejna “berodanê” tê kirin diheyire û wiha dibêje:

“Min dîya xwe pirsî:

-Dayê! Kengê wê bibe bero-dan?

Dîya min mira got:

-Ewê bibe meha hezîranê.

Ro bi ro min dijmart, çika kengê wê bibe bero-dan.

Hewa ku idî germ bû, berx givrik bûn, berx idî karibûn biçêrîyana, berfa çîya jî helîya bû, xwe dabû jorê, serê çîya, pîgar kivş bûn, kesîba jî pezê xwe coltî da dewletîya.”³⁵⁹

Di *Şivanê Kurmanca* da her wiha di van rêzikan da jî tê dîtin ev cejn kevneşopîyeke kevn ya Kurmancan e û salê du caran tê pîrozkirin û wiha derbas dibe, “Rojêd ussa ezîze rind dibûn her salê du cara. Carekê, wextê pêz teze diçe zozana, carekê jî paîzê-derengî, wextê koçer ji zozana vedigerin, têne malê xwe.”³⁶⁰ Di *Şivanê Kurmanca* da pîrozkirina dema berodanê li gorî çûyîn û dagera ji zozanan tê diyarkirin û wiha qala amadehiyên derketina zozanan tê kirin:

“Her obekêda obebaşî kivş bûn ji merîyê dewletî. Çimku xweyê wara, çêrê zozana dewletî bûn. Zozan zozanê wan bûn, war jî ser navê wan dihate navkirinê.

Obebaşîyê me Kelhan bû. Ewî rojekê gazî pîgara û şivana kir, got, -filan rojê wê bibe bero-dan û emê herne zozana.

³⁵⁷ Şemo, **h.b.**, r. 96-97.

³⁵⁸ Şemo, **h.b.**, r. 97.

³⁵⁹ Şemo, **h.b.**, r. 98.

³⁶⁰ Şemo, **h.b.**, r. 100.

Du-sê roja me pez bero-dan kir, berx hînî rêvaçûyna dûr bûn, eme idî hazir bûn ber bi çûyna zozana.

Roja çûyîna zozana, sibê- şebeqê teva karê xwe dikir. Xorta qîz û bûka kincê xwe teze xwe kiribûn.

Reng-rengî xwe xemilandibûn. Ewê ku dewletîbûn, qîz û bûkê wan xizêm-qerefil dikirne pozê xwe, şirikê qerefilê wan dihatin, ser piştê wane xemilandîda diketin. Hineka jî kimberêd zîv zêr kildayî didane piştê xwe.”³⁶¹

Piştî amadekariyan berodan di çavdêriya “obebaşî” û serkêşîya serşivan da dest pê dike û ev rewş wiha tê behskirin:

“Obebaşî ser xanî sekinîbû, dikire gazî, digot:

-Pezê dora gund gerekê bileqe!

Serkarîya bero-danê dabûne şivanê mezinî pispor. Ewî jî kulavê xwe yî teze xwe kiribû, şivdara xwe berşivka kulêvra kiribû; bilûr destada, hey lê dixist. Cara jî, mîna qumandarekî, li cahila dikire gazî, digot:

-Miqatî berxa bin. Çavê we li wan mîya be, yê ku guh nedne berxê xwe.

Pey şivên diçû nêrkî mezinî xemilandî. Stuyê wî nêrîda zengilekî mezin dardakiribûn, xinge-xinga zengilê wî bû, pez jî hînî dengê zengilê wî bibûn, xwe li nêrî digirtin, kêş girtibû, diçû.

Wextê meyê pêz rêxista, kûlakê, xweyê pêz hatne cem me, şivan-berxvana, em xewle kirin. Gelle cimet dora me top bû û wan kûlaka mera got:

-Me pezê xwe teslîmî we kirîye, me hûn jî teslîmî xwedê kirîye, wekî hûn pakî, helalî û rind miqatî malê malê me bin û pak biçêrînin.

Wextê ew temî û teslîmê wan kutta bûn, serşivên li bilûra xwe xist, em idî leqîyan, rêketin.

Kerê pêz dabûne pey hevdu, cahila xwe dabûne dora pêz, pêzra dihatin, dîna xwe didane pêz, wekî yek ji yekî neqete. Herkê hinek jî ji hev bela dibûn, wan lawika çirpî şivdara dixist, dikir reqe-req, ew pezê ji hev belabûy, dikirne nava kêşa pêz, yan jî hîre-hîra wan bû, ne dihîşt yek ji yekê biqete.”³⁶²

Wekî berê jî hat gotin Kurmancên koçer dema derdikevin zozanan cejna berodanê pîroz dikin û di dema dagera ji zozanan da jî cejna “beranberdan”ê pîroz dikin. Ji bona koçer û gundiyan û şivan û gavanan beranberdan xwediyê wateyeke mezin e. Di roja beranberdanê da jiyana wan ya rojane diguhere û heqê xwe distînin. Di romanê da wiha qala vê girîngiyê tê kirin, “Rojê beran-berdanê ji rojê ezîze dinê zaftir tê hesabê, çimku havîn derbas dibe, gişk têr û qewat in, yekê jî tev zanîn, wekî hazir dikin zêdebûna malê xwe û pezê xwe. Şivan, gavan û dûajo wê rojê ji teva zaftir şa dibin, wan roja idî heqê wan didinêda.”³⁶³ Di *Şivanê Kurmanca* da ji bona cejna beranberdanê tê gotin ev cejn

³⁶¹ Şemo, **h.b.**, r. 98-99.

³⁶² Şemo, **h.b.**, r. 99-100.

³⁶³ Şemo, **h.b.**, r. 109.

“deweta pêz e” û Ereb wekî cejna berodanê li vir jî cara ewil haya wî ji cejna beranberdanê çêdibe û ev rewş wiha derbas dibe:

“Gava ku min pirsî, -ev çima ussane, xortekî mezin, kêleka min sekinîbû, wa binçava li min nihêrî, got.

-Çima tuyî korî, tu nabînî wekî îro beran-berdane, xelq tev karê xwe kirîye?

Ez nêzîkî wî bûm jêra salixê xwe da û gotê, -sî û pênc sale, bavê min eşîrat hişîye, çûye bûye rênçberê melegana, huruma û êrmenîya, loma jî em nizanin qeyde-qanûnê eşîratê.

Xort dîsa li min nihêrî, got:

Îro daweta pêze. Wê wanra daweteke rind bikin, gulla agir kin, hemû şaya wê wanra bikin.

Serda zêde kir, got:

-Roja îroyîn dinîya tev şadibe, çiqas eşîr heye li dinîyayê, tev îro şadibin, daweta pêz dikin. Xortêd cahîl radibin, gulaşê digrin, hila gelle oyîna tuyê bibînî.”³⁶⁴

Amadekariyên ji bona pîrozkirina vê cejnê di romanê da wiha tê vegotin, “Wê rojê ku wê berana berî nav mîya din, sibê şebeqê tev dixemilin, kincê teze xwe dikin. Şivan bilûrêd xwe rûn dikin, hazir dikin, wekî lêxin. Hinek def, zurne û tulûmê dibine çolê, nava pez didine lêxistinê.”³⁶⁵ Cejn ji bona xort û keçan jî dibe derfetek hevdu bibînî û ev rewş tevî taybetiyên xwe yên folklorîk wiha tê behskirin:

“Rastî jî wê rojê beran teve biskkirî bûn, cûre-cûre biskêd rind ser beranada dihatin. Biskêd rengkirî, zengilêd rind, darikê ‘tayê’ kawîke rind didane berana. Tu dibêjî, berana jî zanîbûn, wekî ew roj roja daweta wane; wana jî stuyê xwe bilind kiribûn, diçûn-dihatin: Hineka stuyê xwe li hev dixistin, hineka jî sekinîbûn zûr bibûn, li xweyê xwe û cimetê dinêrin. Qîzêd cahil temezî ji serê xwe vedikin, davîtne stuyê berana; xort tèn wan temezîya vedikin, dibin. Lê yê ku temezîyê vedike, xwe kîvş dike, wekî wê qîzkê, wê bistîne. Dê û bavê qîzê dûrva, bin çavara, pak texmîn dikin, çika kîjan xortî temezîya qîza wan vekir, bir, çika xortî hêjaye yan na, çika xortî dewletîye, wekî qelenekî rind bistînin. Temezî-vekirin jî dibe wa: Xort û qîzik hevdu berbangê dibînin, qewil didine hevdu, wê rojê yê temezîyê vedike, dibe.”³⁶⁶

Ji bona beranberdan weke cejneke tê pîrozkirin xort û keç jî cil û bergên xwe yên herî xweşik li xwe dikin û bi taybetî keç xwe dixemilînin:

“Ew ken, ew şabûna cahila, kilam û lîstka wana, kincêd xorta: oyme, arxalix, bîşmêt û çêrkezî bûn, kolosêd serê wan tijî şar-şimaqî bûn, rîşêd şar-şimaqîya dihat, dikete ser çavê xorta. Qîz bûkê wan jî xwe pak xemilandibûn: dêre, xirxal, enterîyê rind û teterîyê ezurmê. Qîz û bûka serê xwe jî xemilandibûn kofi-kitan, fînoyê kotikkirî, serê fîno û kofîyê wan tijî dirav bûn, bercênîk, morî-mircanê stuyê wan

³⁶⁴ Şemo, **h.b.**, r. 109-110.

³⁶⁵ Şemo, **h.b.**, r. 109.

³⁶⁶ Şemo, **h.b.**, r. 110.

da meriv heyran hijmekar bû lê binihêrîya. Xorta simêlê xwe ba dabûn, qîza jî çavê xwe kil dabûn, meriv tirê dawetê teze ji hev berdaye. Qîz û xortê dilketî ber hevra derbaz dibûn, çav dikirine hevdu, kêleka hevda diçûn, xwe ber hevra davîtin diçûn.”³⁶⁷

Ev roj û cejn bi govend û sitranan derbas dibe û wiha tê qalkirin:

“Siheta beran-berdanê nêzîk bû. Şivana dest bi kilama kir, xort ketne koçerîyê, def zûrne û tulumê deng dane hevdu. Ew newel-gellî ussa tijî deng û hêwerze bibû, meriv nizanbû kîderê çi diqewime. Wê siheta wê berana berdin, govenda xort, qîza hat, çarniqalî kerê pêz sekinîn, bû xirmînîya gulla û ringînîya defê beran berî nav mîya dan.”³⁶⁸

Wekî li jorê jî hat destnîşankirin Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* da dixwaze wekî weqianûsek her tiştî qeyd bike. Loma jî bi berfirehî qala jiyana Kurmancan û edetên wan dike û dixwaze bi saya *Şivanê Kurmanca* taybetiyên folklorîk yên Kurmancan bike malê dîrokê ji bona neyên jibîrkirin.

2.4.5. Têkiliya Kurmancan û Neteweyên Din

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da bi devê neteweyên din nêrîna wan ya li Kurmancan eşkere dike. Bi saya van gotinan meriv hîn dibe netewe û cînarên Kurmancan bi çi çavî li Kurmancan mêze kirine.

Di beşa “Çî terane ‘vîlke?’” da Erebe nameyeke mamosteya xwe ji mêrê wê ra dibe Qersê. Dema Erebe li malê li cem mêrê mamosteyê û zarokên malê rûdine beriya vegere gund jê ra xwarin tê. Li ser sifreyê kêr û çetel jî hene. Erebe nizane çetel çi ye û bi kêrê çi tê. Divê qey çetel wek pêlîstok û diyariyek ji wî ra danîne. Erebe çetel dike bêrîka xwe û piştî ev tê dîtin bi diziyê tê sîcdarkirin û peyra der û cînar jî bi meseleyê dihesin. Jinên Ermenî derheqê Erebe da wiha dibêjin:

“Hin jinkêd heyatê êrmenî hevra digotin:

-Kurmance teve ussa dizin, qaçaxin, hila binêr -eve çûk hatîye vira, dîsa bê dizî nahewe.

Hineka jî digot:

-Bigrin, bikutin, paşê berdî -bira here.”³⁶⁹

Erebê dema di mala Îvan da dibe xulam roja ewil ber destê sibehê dixwaze here dest bi kar bike û rastî hin gundiyên Meleganan tê û wiha bi hev ra xeber didin:

“-Tu kîyî?

³⁶⁷ Şemo, **h.b.**, r. 100.

³⁶⁸ Şemo, **h.b.**, r. 110.

³⁶⁹ Şemo, **h.b.**, r. 82.

Min caba wan da, got:

-Ezim, Erebê Şamîlovim.

-Tu vê şevê hatî vira çi?

-Ez duh bûme xulamê vê malê û soz da axê xwe wekî sibê-şebeqê bêm. Ez hatme, lê ew hila razayne.

Min dît, ku dîsa bû piste-pista wan.

-Na! -yekî ji wan kire gazî, got, -tu casûsî, kurmacê we hatne dizîyê vê malê, tujî vira sekinî, casûsîyê dikî, wekî kesek wan negire.

Min lê nihêrî, xeta ji van jî çêdibe. Min lava kir, got:

-Heyran, ez zarim. Îsal çend sale gundê weda rênçberim, kî ji we dizîya min dîtîye, çima hûn gilîyê ussa dibên?"³⁷⁰

Ereb dema ji bona Bolşevîkan tê girtin û qedere du meh û çend rojan girtî dimîne, di jêpirsînê da Ermeniyek jê ra wiha dibêje, "Kurmacê ker çî terane, em şer kin yan şer nekin, tu xwara çobantîyê bike, bigre gopal-here zozanî..."³⁷¹ Ereb li Dîgorê dema dixwaze here dikanê ji xwe ra nan bikire wiha behs dike bi çî çavî li wî mêze dikan, "Gava ku ez hatime dikaneke Dîgorê, min xwara nan bikerîya, teva li kuçê difitande min, li min dikenîyan. Hineka dikire gazî: 'kurd, kurd' u didane çêra..."³⁷² Dema Ereb di maşînê da bi hin kesên Rûs ra rêwîtiyê dike û diçe Rûsyayê bi rê da qala Bolşevîkan û şer tê kirin. Ereb jî tevî sohbetê dibe û diaxive. Rûsên di maşînê da ecêbmayî dimînin û bi laqirdî wiha dibêjin, "Mera gotine-hûn kurmac sal donzde meha merîya dikuji, talana dikan, kuda tu van gilîya zanî?"³⁷³

Wekî ji jêgirtinên li jorê tê fehmkirin bi gelemperî nêrîna neteweyên din ya li Kurmancan neyînî ye. Di çavê wan da Kurmac diz, nezan û qaçax in û tenê şer û talanê dikan. Ji xeynî şivan û gavantiyê ji tu tiştekî fehm nakin.

Di *Şivanê Kurmanca* da tenê bi awayekî neyînî qala Kurmancan nayê kirin. Gava behsa taybetiyên Kurmancan tê kirin qala mêrxasiya wan jî tê kirin. Lê ev bi gelemperî ji devê Bolşevîkan derdikeve. Dema Ereb tevî Artêşa Sor dibe Şpakê fermandarê Artêşa Sor wiha dibêje:

"Min kaxez hilda, ez lez çûme cem hevalê Şpak. Ewî ez hildam gvardîya sor. Çend gilîgotin ji min pirsî, min caba wî da. Wextê ewî ji min pirsî, -tu ji kîderêyî, çi milletî, -u min caba wî da, gotêda, -ez ji welatê Qersême, xwe jî kurmacim.

³⁷⁰ Şemo, **h.b.**, r. 75.

³⁷¹ Şemo, **h.b.**, r. 151.

³⁷² Şemo, **h.b.**, 154.

³⁷³ Şemo, **h.b.**, r. 161.

Hevalê Şpak zaf mira kêfxweş bû, got:

-Ha, ez kurmanca pak zanim, li welatê Îranê min kurmancara kirîye şer. Ez jî wextekê esker bûm. Hûn, kurmanc mêrxasin.”³⁷⁴

Di dereke din da jî Şpak derheqê Kurmancan da balê dikşîne ser taybetiya wan ya mêrxasiyê ku li ser soza xwe disekinin û tu wextê bêbextiyê nakin û wiha dibêje, “Wê rojê, wextê hê êvar ne bibû, qumandarê me, hevalê Şpak gazî min kir, ji mira dizîkava got: Hevalê Şamîlov, ez zanim, -mêrê kurd zafe mêrxasin û wekî soz dan, tu carî xayîntîyê nakin.”³⁷⁵ Erebe Şemo di vir da dixwaze balê bikşîne ser başî û qenciya Bolşevîkan û nîşan bide nêrîna wan ya li Kurmancan neyînî nîne.

³⁷⁴ Şemo, **h.b.**, r. 166.

³⁷⁵ Şemo, **h.b.**, r. 169.

ENCAM

Romana *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo yekem romana Kurdî ye û di sala 1935an da li Erîvanê hatiye çapkirin. Erebe Şemo *Şivanê Kurmanca* bi zaravayê Kurmancî nivîsiye.

Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* da cî daye vebêjerê şexsê yekem û şexsê sêyem. Di destpêka *Şivanê Kurmanca* da vebêjer şexsê sêyem e, lê peyra vebêjer diguhere û di piraniya romanê da şexsê yekem tê emilandin. Loma jî di *Şivanê Kurmanca* da rewşa vegotina şexsê yekem serdest e. Di romanê da vebêjer di heman demê da wek leheng hatiye pêşkêşkirin. Di *Şivanê Kurmanca* da hin caran vegotina şexsê sêyem bê leheng tê bikaranîn, lê ew deng jî dengê nivîskar bi xwe ye. Nivîskar di *Şivanê Kurmanca* da wekî serleheng cî digire û wek vebêjer jî hakimî bûyerên di romanê da ye. Ji bona *Şivanê Kurmanca* ya piştî xwe dide otobiyografiya nivîskar bi gelemperî rewşa vebêjerê şexsê yekem di cî da ye û li metnê tê.

Erebe Şemo romana *Şivanê Kurmanca* ji 21 beşan pêk aniye û ji her beşê ra jî navek daniye. Sernava her beşê dibe naverok û navenda wê beşê. Bîranîn û serboriyên nivîskar beşên sereke yên romanê pêk tînin. Di *Şivanê Kurmanca* da bûyer bi gelemperî bi awayekî kronolojîk diqewimin, yanê bûyerên di romanê da li pey hev hatine rêzkirin. Di navenda hemû bûyeran da Erebe Şemo cî digire û bûyer û leheng hemû li derdora wî diçin û tên. Her çiqas romana *Şivanê Kurmanca* ji serî heta dawiyê ji bîranîn û serboriyên Erebe Şemo hatibin avakirin jî rêzebûyereke xurt di romanê da tune. Di *Şivanê Kurmanca* ya di bin beşan da hatiye sazkirin tiştên di beşa berê da hatibin gotin êdî li paş dimînin. Têkilî û hevgerêdana wan domdarî nîne û bandora wan ya li ser beşa pêşiya xwe çênabe. Di *Şivanê Kurmanca* da bi gelemperî hebûna beşan û destpêk û dawîn bi zanebûnek nehatine danîn. Di qisekirina serpehatiyên da jî lezûbezek heye. Ev jî du xisaran dide: Ji ber lezûbezê lehengên romanê bi awayekî kûr nayên danasîn û lazimî û nelazimî ji hev nayên veqetandin. Ji bona lazimî û nelazimiya bûyer û bîranînan ji hev nayên cihêkirin hin bûyer bi kurtasî tên derbaskirin û hin bûyer jî bêyî li tevî û honandina metnê bîn bi berfirehî tên qalkirin. Dema meriv bi giştî li honandina romanê dinihêre, beşan û destpêk û dawînê dide ber hev, serborî û bîranînen nivîskar bi qismî hatine honandin û meriv dikare bibêje *Şivanê Kurmanca* di pêvajoya nivîsandina xwe da dikemile.

Di *Şivanê Kurmanca* da serlehengê romanê Erebe Şemo, yanê nivîskar bi xwe ye. Di romanê da hejmarê kesan zehf e, lê di metnê da bi hûrgilî nayên nasandin û dernakevin pêş. Tehlîlên psîkolojîk yê kesan di berhemê da tune, heta ya Erebe bi xwe jî tune. Loma jî di *Şivanê Kurmanca* da ji legengan bêtir kesên dekoratîf hene û hin ji wan wek fîgur û “tîp” derdikevin pêşberî me. Kesên di romanê da bi nav û nasnavên xwe yan jî bi karê xwe tînan û bi kurtasî tînan derbaskirin. Tenê bi agahiyên kî ne û çî dikin tînan nasandin. Erebe Şemo ji zarokatiyê heta ciwaniya xwe kesên wî ew nas kirine û dîtine di *Şivanê Kurmanca* da cî daye wan û wek şexs behs kiriye. Loma jî ev kes di romanê da wek kesên dekoratîf yan jî fîguran cî digirin. Di *Şivanê Kurmanca* da ji xeynê Erebe wek “tîp” tu kesek bi tena serê xwe dernakeve pêş. Di romanê da wekî “tîp” kesên ji yek wêş û fikrekê pêkhatî ne hene. Lewra ev kes di *Şivanê Kurmanca* da wêş û fikrekê temsîl dikin û meriv dikare wan kesan weke gundî, şivan û gavan; axa, beg, şêx û mele; Melegan, Ermenî, Daşnak, kûlak û hwd. û kesên bolşevîk dabeş bike. Gundî, şivan û gavan wek tîp di *Şivanê Kurmanca* da tim heqaretê dibînin û nêrîna wan ya li axa, beg, şêx û meleyan baş nîne û tim bi awayekî neyînî di metnê da qala axa, beg, şêx û meleyan dikin. Axa, beg, şêx û mele wek tîp di *Şivanê Kurmanca* da tim bi dijmin ra hevkarîyê dikin û heqaretê li gundî, şivan û gavanan dikin. Melegan, Ermenî, Daşnak, kûlak û hwd. wek tîp di *Şivanê Kurmanca* da bi gelemperî nêrîna wan ya li Kurmancan û kesên feqîr û belengaz neyînî ye û niheqiyê dikin, lê hin kes erênî tînan nîşandan. Di *Şivanê Kurmanca* da wek tîp kesên bolşevîk erênî tînan nîşandan. Bolşevîk li cem feqîr û belengazan cî digirin, baş li dewlemendan, axa, şêx, mele û Daşnakan nanihêrin.

Di *Şivanê Kurmanca* da zeman zemanekî kronolojîk e û bûyer bi gelemperî li pey hev diqewimin. Loma jî meriv dikare bibêje ji hêla rêzîkê va di romanê da zeman derneketiye pêş û honandin. Li gorî kronolojiya jiyana nivîskar bûyer û serborî tînan vegotin. Di *Şivanê Kurmanca* da zeman di awayê yekem da “zemanê bûyerê” ye, yanê dema tê vegotin zemanê bûyerê ye. Lewra di navbera bûyer û demê da valahî çênabe. Lê di romanê da “zemanê vegotinê” jî tê bikaranîn. Di vir da bûyerên tînan behskirin li paş mane û bûyer bi rêya zemanê vegotinê tînan vegotin. Di romanê da carna dîroka bûyerê jî tê dayîn û em dizanin bûyer çî çaxê qewimiye. Bûyerên di *Şivanê Kurmanca* da kêr-zêde di navbera 1898 û 1924an da diqewimin.

Di *Şivanê Kurmanca* da wek hêmaneke edebî ya romanê teswîrkirin û pêşkêşkirina mekanê qels e û dernakeve pêş. Di *Şivanê Kurmanca* da mekan zû diguherin û bi gelemperî mekanên vekirî ne. Di romanê da hin mekan tenê wek nav derbas dibin, hin mekan bi kurtasî û hin mekan jî bi berfirehî tî teswîrkirin. Di piraniya romana *Şivanê Kurmanca* da mekanên girtî kê mî digirin û ew jî nayên honandin. Di romanê da meriv dikare bibêje mekanê sereke erdnîgarî ye û ev erdnîgarî ji Qersê heta Rûsyayê mekaneke berfireh e, yanê Qafqasya ye. Gundên Ereb û malbata xwe lê şivantî û gavantiyê dikin, zozan, çol, bajar û warên lê dimînin, mekanên romanê ne.

Zimanê di *Şivanê Kurmanca* da zimanê xebirdanê ye, yanê zimanekî honandî û çêkirî nîne. *Şivanê Kurmanca* bi gelemperî bi zimanekî sade yê li herêma Serhedê yan jî Qefqasyayê tê xebirdan hatiye nivîsandin. Loma jî şewaza Erebê Şemo şewaza xebirdanê ye. Wekî mezinekî malê ji bona malbata xwe behsa jiyana xwe bike şewaza di *Şivanê Kurmanca* da derdikeve holê. Hevokên di romanê da dirêj û tevlihev nînin, wekî zimanê rojane kurt in. Ev şewaza ziman jî vegotina *Şivanê Kurmanca* ji zimanê romannûsiyê dûr dixê û nêzî zimanê çîrokbêjiyê dike. Di *Şivanê Kurmanca* da kê mî be jî ji diyalogan jî tê îstifadekirin, lê diyalogên di metnê da zêde dernakevin pêş. Di gelemperiyê *Şivanê Kurmanca* da şewaza nivîskar serdest e. Kesên di berhemê da bi gelemperî li gor zimanê Erebê Şemo diaxivin, li gor rewşa xwe napeyivin. Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da gotinên pêşiyên, biwêj û qalibên bi Kurdî zehf emilandiye û ev jî nîşan dide nivîskar hakimî zimanê gel e. Di romanê da ji bona rîtmekê bide çîrokê carna ji teswîran jî tê îstifadekirin. Lewra teswîrên di romanê da vegotina rasterast ya di romanê da herikbar dike û vegotinê sivik dike. Di *Şivanê Kurmanca* da teswîrkirina kesan kê mî e. Di romanê da pirî caran kes bi navê xwe derbas dibin yan jî bi karê xwe tî zanîn. Di romanê da herî zêde teswîrên derdor û tebiyetê hene û derdikevin pêş. Di şewaza *Şivanê Kurmanca* da ji peyvên dubare jî zehf tê îstifadekirin û ev wek taybetiyeke sereke ya şewaza Erebê Şemo ye di *Şivanê Kurmanca* da derdikeve pêş. Zimanê *Şivanê Kurmanca* bi tena serê xwe hêjayî lêkolîneke berfireh e. Lewra him peyvên resen yê bi Kurdî tê da hene û him jî gelek peyvên li ber wendabûnê ne û nayên emilandin tê da hene. Zimanê *Şivanê Kurmanca* ji hêla term û peyvên derbarê ajalvanî û heywandariyê da jî gelek dewlemend e. Di *Şivanê Kurmanca* da li herêmên bûyer derbas dibin gelek gel hene û peyvên ji zimanê van gelan jî di berhemê da derbas dibin. Di berhemê da peyvên Tirkî, Ermenîkî û Rûsî zehf tî emilandin. Di *Şivanê*

Kurmanca da materyalên folklorîk jî cî digirin. Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* da cî daye du stran û destanek. Ji xeynê stranekê destana Siyabend û Xecê û strana di nav wê da bê peywend mane û tenê tên behskirin.

Di *Şivanê Kurmanca* da bi gelemperî teknîka otobiyografîk û teknîka qalkirinê derdikevin pêş, yanê bi gotineke din kesê “qal dike” û “tiştê tê qalkirin” heman kes in. Di metnê da vegotina bi vî rengî bi biyografiya nivîskar ra li hev dike û nêzikî metnên serborî û bîranînê dibe. Di *Şivanê Kurmanca* da vebêjer her tiştî rasterast neqil dike, yanê bi teknîka qalkirinê bi awayekî tebiî vedibêje. Di romanê da di navbera vebêjer û berhemê da têkiliyeke xurt heye. Nivîskar bi kurtasî dixwaze dinyaya xwe û agahiyên dizane bi xwendevanan ra parve bike. Loma jî di *Şivanê Kurmanca* da vebêjer bi vegotineke rasterast her tiştî neqil dike. Di romanê da vegotina rasterast carcaran bi diyalog, serborî û bîranînan qut bibe jî vegotina rasterast ya di metnê da dewam dike. Lê meriv dikare bibêje bi saya diyalogên di romanê da tengasiya ji ber teknîka otobiyografîk û teknîka qalkirinê derdikeve holê sivik dibe. Erebe Şemo di *Şivanê Kurmanca* da carna di navberê da agahiyan dide û referansên wî pirî caran îşaret dikin ka peyra çi bûye.

Romana *Şivanê Kurmanca* ya bi gelemperî ji honandina serborî û bîranînan pêk tê qala jiyana Kurmancan ya dijwar ya di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an da dike. Nivîskar Erebe Şemo zarokatiya xwe, rewşa malbata xwe û êl û eşîrên Kurmancan û damezirandina pergala Sovyetê û encamên wê yên di nav Kurmancan da bi hûrgilî ji nêz va terîf û teswîr dike. Di *Şivanê Kurmanca* da demên zarokatiyê û rewşa malbatê, jiyana Kurmancan û edetên wan, têkiliya Kurmancan û neteweyên din, xizanî û zilma serdestan û şoreşgerî û xebatên siyasî mijarên sereke ne derdikevin pêş.

Di *Şivanê Kurmanca* da demên zarokatiyê û rewşa malbatê ji bona kemilîna Erebe Şemo bingeh in. Him demên zarokatiyê û rewşa malbatê tên nişandan û him jî dema rewş tên xêzkirin wek tîpek Erebe jî derdikeve pêş û kesayetiya wî pê ra dikemile.

Di *Şivanê Kurmanca* da salên hatina pergala nû, xebatên propagandayê û tevlîbûna Erebe ya şer yek ji mijarên sereke yê romanê ye û bi berfirehî cî digirin. Erebe dibe alîgirê Bolşevîkan û wekî kesekî çalak ji bona wan dixebite û tevlî Artêşa Sor dibe. Loma jî *Şivanê Kurmanca* di heman demê da panoromaya civakî û siyasî ya heyama

xwe nîşan dide. Wek serlehengê romanê Ereb di şexsê xwe da nimûneyên “lehengê erênî” yê realîzma sosyalîst di xwe da dihewîne û wisa tê xêzkirin.

Di *Şivanê Kurmanca* da mijareke din jî bêdaletiya civakî ye. Erebê Şemo di seranserê romanê da qala kesên xizan dike. Ji xeynî xizaniya gel rewşa dewlemend û serdestan jî nîşan dide. Lewra kesên xizan zor û zehmetiyê dikşînin û yên serdest jî keda wan dixwin. Erebê Şemo bi rêya vegotina serpêhatiyên xwe dixwaze helwesta xwe ya li dijî îstismar, kedxwarin û çewisandina belengazan eşkere bike. Jixwe Ereb xwe wekî berdevkê karker, gundî û belengazan dibîne. Meyla wî her tim li ser mexdûrên rejima berê ye. Nivîskar bûyeran bi çavekî çînî dinirxîne. Di *Şivanê Kurmanca* da gelek şopên jiyana civakî xwe didin der. Di seranserê romanê da nêrînek heye xizan di nav lepên serdestan da ne û di bin zilma wan da dipelçiqin. Erebê Şemo xwestiye bi rêya vegotina jiyana xwe nîşan bide ka çawa beriya şoreşê neheqî li ser gel hebûye û propagandaya pergala nû dike.

Şivanê Kurmanca ji teswîrên berfireh yên kevneşopiyên Kurmancan yên civakî û çandî pêk hatiye. Bi her awayî jiyana li gundan radixe ber çavan û agahiyên xwe yên derheqê gundan da di romanê da nîşan dide. Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da wekî weqianûsek dixwaze her tiştî qeyd bike. Loma jî bi berfirehî qala jiyana Kurmancan û edetên wan dike û dixwaze bi saya *Şivanê Kurmanca* taybetiyên folklorîk yên Kurmancan bike malê dîrokê ji bona neyên jibîrkirin.

Erebê Şemo di *Şivanê Kurmanca* da dixwaze nêrîn û helwesta neteweyên din ya li Kurmancan jî eşkere bike. Di romanê da bi gelemperî nêrîna neteweyên din ya li Kurmancan neyînî ye. Di çavê wan da Kurmanc diz, nezan û qaçax in û tenê şer û talanê dikin. Ji xeynî şivan û gavantiyê ji tu tiştêkî fehm nakin. Lê di *Şivanê Kurmanca* da tevî çend mînakên biçûk tenê Bolşevîk bi awayekî erênî li Kurmancan mêze dikin. Helbet Erebê Şemo di vir da dixwaze balê bikşîne ser başî û qenciya Bolşevîkan û nîşan bide nêrîna wan ya li Kurmancan neyînî nîne.

ÇAVKANÎ

- Ahmedzade, Haşim, **Romana Kurdî û Nasname**, Fahriye Adsay (wer.), Stenbol: Weşanên Avesta, 2011.
- Ahmedzade, Haşim, **Ulus ve Roman Fars ve Kürt Anlatsal Söylemi Üzerine Bir Çalışma**, Azad Zana Gündoğan (wer.), İstanbul: Pêrî Yayınları, 2004.
- Alan, Remezan, **Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern**, Stenbol: Weşanên Peywend, 2015.
- Alan, Remezan, **Bendaname**, İstanbul: Weşanên Peywend, 2013.
- Alan, Remezan, **Folklor û Roman Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn**, Stenbol: Weşanên Peywend, 2013.
- Alan, Remezan, “Bextewariya Îdeolojîk”, **Pelîn**, Hejmar: 2, 1999.
- Allison, Christine, “Otobîyografî, Serborî û Romana Kurdî: Erebe Şemo û Peyrewên Wî”, **Wêje û Rexne**, Hejmar: 2, 2014.
- Antakyalıoğlu, Zekiye, **Roman Kuramına Giriş**, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2013.
- Aydoğan, İbrahim Seydo, **Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî**, Stenbol: Weşanên Rûpel, 2014.
- Aydoğan, Mustafa (amd.), **Şivanê Kurmanca**, Diyarbakır: Weşanên Lîs, 2009.
- Aydoğan, Mustafa, “Destpêka Romana Kurdî Şivanê Kurmanca”, **Şivanê Kurmanca**, Diyarbakır: Weşanên Lîs, 2009.
- Aydoğan, Mustafa, “Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo - I”, **Kurmancî**, Hejmar: 45, 2009.
- Aydoğan, Mustafa, “Şivanê Kurmanca - II”, **Kurmancî**, Hejmar: 46, 2010.
- Aydoğan, Mustafa, “Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo - III”, **Kurmancî**, Hejmar: 47, 2010.
- Aydoğan, Mustafa, “Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo - IV”, **Kurmancî**, Hejmar: 49, 2011.
- Aytür, Ünal, “Çevirenin Önsözü”, **Roman Sanatı**, İstanbul: Adam Yayıncılık, 1982.

- Bahtin, Mihail, **Karnavaldan Romana Edebiyat Teorisinden Dil Felsefesine Seçme Yazılar**, Cem Soydemir (wer.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2014.
- Baqir, Abdurahman, “Ji Şivantiyê Ber Bi Zanyariyê Ve”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Booth, Wayne C., **Kurmacanın Retoriği**, Bülent O. Doğan (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 2012.
- Boyîk, Eskerê, **Çanda Kurdên Sovêtê**, İstanbul: Weşanên Deng, 2012.
- Boyîk, Eskerê, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî Yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Boyîk, Eskerê, “Rojnameya Riya Teze”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.
- Boyîk, Dr. Eskerê, **Nûra Elegezê Çend dîdem ji edebyeta Kurdên Ermenistanê**, Oldenburg: Weşanxaneya Dengê Êzîdiyan, 2004.
- Candan, Goran, “Heciyê Cindî: Jiyana û Kar”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.
- Celalî, Murad, “Di Romanên Erebê Şemo Jiyana Bextewar û Hopo De: Tîpên Şoreşger Ên Romantîk”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.
- Çaçan, Xelîlê, “Miletêk Di Heyra Wî De Bû”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Çetin, Nurullah, **Roman Çözümleme Yöntemi**, Ankara: Öncü Kitap Yayınları, 2007.
- Çıkla, Selçuk, “Romanda Kurmaca ve Gerçeklik”, **Hece**, Hejmar: 65-66-67, 2002.
- Denîz, Serwet, “Her Ew Hesret û Ew Xwezî”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Eco, Umberto, **Anlatı Ormanlarında Altı Gezinti**, Kemal Atakay (wer.), İstanbul: Can Yayınları, 2012.
- Ekîcî, Mûsa û Sara Anter, “Romana Kurdî ya Sovyetîk û Saqoyê Gogol”, **Wêje û Rexne**, Hejmar: 3, 2014.
- Eşo, Wezîrê, “Ronesansa Çanda Kurdî Li Sovyeta Berê”, **Nûdem**, Hejmar: 32, 1999.
- Eşo, Wezîrê, “Çend Rûpel Ji Jiyana Ereb Şamîlov”, **Çira**, Hejmar: 6, 1996, r. 14-22.
- Eşo, Wezîrê, “Konferansa Kurdzaniyê ya Yekemîn Li Yêrîvanê”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.
- Forster, E.M., **Roman Sanatı**, Ünal Aytür (wer.), İstanbul: Adam Yayıncılık, 1982.

- Gören, Ebubekir, “Di Romanên Erebê Şemo De Folklorê Kurdî”, (**Teza Mastirê ya Neçapbûyî**), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, 2013.
- Gultekîn, Nîhat, “Qonaxa Rewşenbîriya Zimanê Kurdî: Radyoya Yêrîvanê”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.
- Gultekîn, Mehmet, “Kurdên Qafqasya Başûr -Dîrok û Zargotin”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.
- Gümüş, Doç. Dr. Hüseyin, **Roman Dünyası ve İncelemesi**, Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları, 1989.
- Gürtürk, Eyyüp, “Bandora Rêbaza Realîzma Civakparêz Di Romana Şivanê Kurmanca De”, **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, Hejmar: 3, 2016.
- Jusdanis, Gregory, **Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcat Edilişi**, Tuncay Birkan (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 1998.
- Kundera, Milan, **Saptırılmış Vasiyetler**, Özdemir İnce (wer.), İstanbul: Can Yayınları, 1995.
- Kundera, Milan, **Roman Sanatı**, İsmail Yerguz (wer.), İstanbul: Afa Yayınları, 1989.
- Kutlay, Nacî, “Romana Kurdî”, **Nûdem**, Hejmar: 18, 1996.
- Lezgîn, Rojan, “Modern Kırmanca (Zazaca) Edebiyatı”, **Zazakî.Net**, 9ê Gulana 2011an, <http://www.zazaki.net/yazi/modern-kirmanca-zazaca-edebiyati-168.htm>, (Dîroka Nihêrînê: 27ê Sibata 2017an).
- Lukacs, Georg, **Roman Kuramı**, Cem Soydemir (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 2011.
- Meretowar, Ayhan, “Kesayetiya Edebî ya Erebê Şemo”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Moran, Berna, **Edebiyat Kuramları ve Eleştiri**, İstanbul: Cem Yayınevi, 1988.
- Moretti, Franco, **Modern Epik Goethe’den Garcia Marquez’e Dünya Sistemi**, Nurçin İleri-Mehmet Murat Şahin (wer.), İstanbul: Agora Kitaplığı, 2005.
- Nabokov, Vladimir, **Edebiyat Dersleri**, Ayşe Lucie Batur-Fatih Özgüven (wer.), İstanbul: İletişim Yayınları, 2014.
- Nazê, Bavê, “Hevpeyvîna Bi Erebê Şemo Re Ya Berî 25 Salan”, **W**, Hejmar: 15, 2007.

- Nemir, Kawa, “Qanatê Kurdo: Yek Ji Baskên Çanda Me”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.
- Parlıtî, Abidin û Özlem Galip, **Kürt Romanı Okuma Kılavuzu**, İstanbul: Sel Yayınları, 2010.
- Parla, Jale, **Don Kişot’tan Bugüne Roman**, İstanbul: İletişim Yayınları, 2013.
- Polat, Edîp, “Ji Hêla Teknîka Romanê Ve ‘Dimdim’ û Erebê Şemo”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Rohat, “Hîmdarê Nivîsandina Romanên Kurdî Ereb Şamîlov”, **Roja Nû**, Hejmar: 49, 1984.
- Roj, Cîhan, “Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Sagniç, Feqî Huseyîn, **Dîroka Wêjeya Kurdî**, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002.
- Seyhan, Azade, **Dünya Edebiyatı Bağlamında Modern Türk Romanı Kesişen Yazgıların Hikâyesi**, Erkan Irmak (wer.), İstanbul: İletişim Yayınları, 2014.
- Şemo, Erebê, **Şivanê Kurmanca**, Diyarbakır: Weşanên Lîs, 2009.
- Şemo, Ereb, **Şivanê Kurd/Le Berger Kurde**, Paris: Institut Kurde de Paris, 1989.
- Şemo, Ereb, **Şivanê Kurd**, Bêrût: Çapxane Nassar, 1947.
- Şîrîn, Enîse; Azad Zal, “Dosye: Erebê Şemo”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Tekin, Mehmet, **Roman Sanatı 1 Romanın Unsurları**, İstanbul: Ötüken Yayınları, 2016.
- Uzun, Mehmed, **Destpêka Edebiyata Kurdî**, İstanbul: İthaki Yayınları, 2011.
- Xelîl, Têmûrê, **Antologiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê**, İzmir: Weşanên Na, 2014.
- Xelîl, Têmûrê, “Erebê Şemo Rûspîtiya Gelê Kurd”, **W**, Hejmar: 15, 2007.
- Watt, Ian, **Romanın Yükselişi Defoe, Richardson ve Fielding Üzerine Denemeler**, Ferit Burak Aydar (wer.), İstanbul: Metis Yayınları, 2007.
- Wood, James, **Kurmaca Nasıl İşler?**, Ekin Bodur (wer.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2010.

Yılmaz, Ferhat, “Berawirdkirinek Li Ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî”,
(**Teza Mastirê ya Neçapbûyî**), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya
Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê, 2015.

Yûsiv, Helîm, **Romana Kurdî**, Amed: Weşanên Ronahî, 2011.

Zinar, Zeynelabidîn, “Kurdistana Sor”, **Nûbihar**, Hejmar: 126, 2014.

Zinar, Zeynel Abidîn, “Nivîskarê Kurd, Kedkar û Suxrevanê Wêjeya Kurdî Erebe
Şemo”, **W**, Hejmar: 15, 2007.

KURTEJIYAN

Nihat KAVŞUT di sala 1985an da li Karakuyuya (Sisnût) gundê Mûşê hatiye dinyayê. Li Zanîngeha Stenbolê beşa Dîroka Hunerê xwend. Nivîs û helbestên wî di kovarên curbecur da hatine weşandin. Li Ajansa Anadoluyê (AA) di beşa Nûçeyên Kurdî (Kurmancî) da wek nûçegihan dixebite.

ÖZGEÇMİŞ

Nihat KAVŞUT 1985 yılında Muş'un Karakuyu (Sisnût) köyünde doğdu. İstanbul Üniversitesi'nde Sanat Tarihi okudu. Şiir ve yazıları muhtelif dergilerde yayımlandı. Halen Anadolu Ajansı'nda Kürtçe Harberler (Kurmancî) servisinde muhabir olarak çalışmaktadır.